



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Hejmar - 27
Tirmeh - Gelawêj 2009

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtor
Azad ZAL - Elixan LORAN

Sererastkirin
Semra OZBEY - Serwet DENİZ

Mizanpaj û Berg
Enstîtuya Kurdî ya Amêdê

Wêneyê Berga Pêşîn
Ahmet Karabulak

Şewirmendê Hîqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane
Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri
Kayapınar/DIYARBAKIR

Tlf/Faks
(0412) 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB
www.kovaraw.com

Şertên Abonetiye
Nava Welat, salek: 25 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesab
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır
YTL: 8300 211 48 89
EURO: 8300 073 70 70
USD: 8300 073 70 84

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

■ *Nivîsên ku ji bo weşanê
ji kovarê re tên şandin,
li xwediyên wan nayên
vegerandin.*

■ *Her nivîskar ji nivîsa
xwe berpirsiyar e.*

- Ji edîtor / 2
- Gulan - Fewzi BÎLGE / 3
- Şitik - Jaro DIHOKÎ / 5
- Bistrîne rêwitiya dengê min -Îlhan Samî ÇOMAK / 6
- Kanê - Mehmet DEVÎREN/7
- Guldesteyek helbest - Zekî KAYAR / 8
- Quling û şimşal - Cihan ROJ / 9
- Demokrasi - Dilşer BÊWAR / 10
- Hinar - Ehmed TARÎ / 11
- Tasek ava serêkaniyan - Selahattin ÇAM / 16
- Çavekî min girtî û deriyekî vekirî - Şivan AR / 18
- Min çima celad daf da - Edip POLAT / 19
- Bêrî rondikên ji agir dibarînin - Dilan AYDIN / 22
- Ax lawo! - Behlûl ZELAL / 23
- Hejîr - Feratê DENGİZÎ / 25
- Du kurteçîrok (Damla, Kêlik) - Mêmê ŞIVAN / 26
- Dendikên zebeşên tehl - Îrfan AMÎDA / 27
- Mişextiya çiçekên dil - Mehmed BADILÎ / 28
- Dûr Mihemed RONAHÎ / 31
- Dosye - Di helbesta kurdî ya nûjen de êşa bindestiyê / 32
- Haveynê helbestê eş e - Dilber HÊMA / 57
- Helbesta kurdî, eş û bindestî - Guftûgo: Arjen ARÎ, Berken BEREH, Kawa NEMIR, Îrfan AMÎDA, Welat DILKEN / 36
- Ez û helbest - Hejar MUKRIYANÎ / 51
- Xemzexan - Elixan LORAN / 53
- Ziwan û şar - Xoser WELAT / 54
- Şiyayîş - Nesrîn NAVDAR / 55
- Romanên Herlequînê - Mizgîn RONAĞ / 56
- Şivanê Kurmanca û di warê biwara modernîteyê de nêrînek... - Dilawer ZERAQ / 61
- Ew - Li Hekariyê demsalek - Ferid EDGU / 65
- Carina mirov xwe jî di kuje II - Hevpeyvîn: Şener OZMEN / 71
- Xêz / 80

Yek ji fikirdarên psîkanalîzê Jacques Lacan dibêje ku “*dema tişteki ku tê xwestin winda bibe mirov xwe diavêje bextê peyvan û heke cîhana dora me bi tiştên ‘pêwîst’ hatibûya avakirin dê pêdiviya me bi peyvê nemabûya. Cihê ku windabûn tune be dê ziman jî tune be.*” Em jî li ser fikra wî dikarin bibêjin ku, îro roj pêdiviya me kurdan bêtir bi ziman û peyvê heye. Ji ber ku ziman/peyv element û elameteke sereke ye. Dema ku ev element kêm be êdî di giyan û enerjîya netewe yan jî mirovan de qelsî û bêtaqetiyên irsî dest pê dikin, ku ev jî elametên nebixêr in. Berovajî vê yekê dema ku elementa ku navê wê peyv e di giyan û enerjîya netewe yan jî mirovan de têra xwe hebe êdî elametên pirberiyê û xêrê xwe didin der.

Em kurd; di warê kabavêtina bi cîhanê re hê jî mirarokî ne, di warê serbestî û azadiyê de hê jî hefsarên revoyên me bi destên me neketine – hefsarên ku ketin destên me tîbûna me ya azadiyê şikênand lê piştî vê tînşikêndandinê ji me re seansên xwêyxwarinê li dar dixin. Va ye li ber çavan e li başûr kurmancî êdî ji dêmariyê ye. Kurd bo hejarbûnê dibêjin; “filankes ketiye ber destê ap û amojinan”. Lê êdî kurd ketine ber destê birayan û kakayan -, erê di warên hunerî de kurd êdî cilika xwe ji avê derdixin, lê *dîwana cîhanê* bi berhemên me qanih nabe. Sedema mirarokîbûn, bidestnexistina hefsaran, berhemên nanozikoyîbûna me ev e ku, vîtamîna me ya peyvê kêm e. Ger vîtamîna me ya peyvê xurt bûya dê bîra me deforme nebûya, em ê li winda û berzebûnên xwe negeriyana. Ji ber ku windabûnên me hene divê zimanê me bêtir ji heq bê der, ji ber ku windabûnên me gelek in û em dizanin ku ziman saziyeke mezin e û mirov di bin siya zimên de disitre û mirov nikare xwedîtîyê li zimên bike jî, divê em kurd li zimanê xwe yê ku xwedîyê me ye xwedî derkevin. Di vir de mebesta me ew e ku em ji nasîna tu gelî, newal, zozan, kendalên zimanê xwe nemînin.

Di vê hejmara me ya havînê de me xwest em li helbest û bindestbûna xwe bipirsin. Di çarçoveya helbest û bindestiyê de me dosyeyeke bi navê “*di helbesta kurdî ya nûjen de êşa bindestiyê*” amade kir û me xwest êdî bila serê keçel di binê kuman de neyên veşartin. Em karibin heftokên di dawa xwe de ro bikin da ku em û helbest û bindestiya xwe li hev mikur werin. Di şêwaza dosyeyê de jî em vê bibêjin; me ji helbestkarên xwe Arjen Arî, Berken Bereh, Kawa Nemir, Îrfan Amîda û Welat Dilken deh pirs pirsîn û bersivên pirsan di binê pirsan de nivîsî da ku nîqaş karibe bêtir gur bibe û bersivên pirsan bi hev re ahengekê jî saz bikin. Ji xeynî vê jî helbestkar Dîlber Hêmayê jî di çarçoveya pirsên me de nivîseke serbest li dosyeyê nivîsî.

Di hejmara me ya 25’an de me ji bîr kiriye ku em navê wergêrê çîroka bi navê “Dilê çîrok-bêj” ya Edgar Allen Poe binivîsin, wergêrê çîrokê Ergîn Opegin e. Dîsa di hejmara me ya 26’an de li ser bergê navê Yaqob Tilermenî wekî Yapop Tilermenî hatiye nivîsîn. Em lêborîna xwe ji nivîskar û xwendevanên xwe dixwazin.

Dîsa di vê kelekela germa havînê de em hêvîdar in ku aştîyeke mayinde pêk were, bila roj berî rojekê xwîna ku diherike bisekine, bila êdî kurd jî karibin bi aramî pariyek nan bixwin, xema wan a girtin, kuştin û îşkenceyê tune be. Bila aştî were, em jî karibin ji van giriyan aş bibin

Wekî xwendevanên me jî dizanin Kovara W di her hejmarê de dosyeyekê amade dike û em niha didin xuyakirin ku mijara dosyeya me ya Rezber û Kewçêrê jî “*Cegerxwîn*” e.

Di vê kelekela germa havînê de bimînin di xweşiyê de...

Gulan

Fewzî BÎLGE

Li çavên me, li çavên ku çavên wan dibîne dinihêre diçe. Çavên min bi çavên wî re diçin, çavên min bar dikin diçin Colemergê

Gulan gul vekiribûn, gulan di yekê gulanê de gul vekiribûn. An bêrî vê min ew nedîtibûn. Belkî jî min li wan nihêribû lê ew nedîtibûn. Belkî çavên min nexwestibûn wan bibînin û de qey nedîtibûn. Mirov nexwaze tiştekî bibîne nabîne, dîtî jî de qey dîtbar e, de qey dîtî jî li gor pêdiviyên mirovan e.

Xwezî min jî carinan be jî tiştin nedîta. Xwezî hêzeke min a nepen hebûya û gava min nexwesta bibihîzim, nebihîsta. Nexwesta bibînim nedîta.

A wa ye çend roj in dîmena sîxurekî weke ecêbekî di ekrana televizyonê de dibînim, gava jî xamî li zarokekî colemergî dixê, bi derbeyê qûndaxa keleşkofê, bi derbeyên kuştinê lê dixê. Çavên wî yên reşbelek berî ku ji dil here, cara dawîn dizivire li çavên min dinihêre. Li çavên me, li çavên ku çavên wan dibîne dinihêre diçe. Çavên min bi çavên wî re diçin, çavên min bar dikin diçin Colemergê.

Çavên min debar nakin lê temaşê bikin, çavên min dîl tînin girtin. Dikevin nava xewlexaneyê xwe, bê deng xwe bera nava xwe didim. Guhên min çend roj in ji strana “hey lê dîne çiya bilind in, ez te nabînim...” pêve tu tiştî nabihîzin.

Gulan gul vekiribûn, di yekê gulanê de gulan bêhn dabû. Bi destê sibehê re min xwe li bêhna gulan girtibû û meşiyabûm. Nigên min ez bi ber parqeke bajêr ve biribûm. Min bi ya nigên xwe kiribû û çûbûm. Min dabû dû şopa xwe û çûbûm. Min dabû dû şopa bêhna gulan û çûbûm nava gulan. Min bêhna wan bêhn kiribû, bi bêhna wan min bêhna xwe fireh kiribû.

Lê ne rengên wan, ne jî bêhna wan

bêhna her demê bû. Vê carê bêhna zarokên çavbelek ji wan dihat. Bêhna çardeh saliyan ji wan dihat. Min kîjan ji wan bêhn bikira; bêhna zarokên me ji wan dihat. Bêhna wan bêhna min fireh kiribû, yan çend roj bûn ew dîmena dilê min dîl girtibû nizamim... Lê destên min, destên min bişkên tu tişt nenivîsandibûn, belkî jî xwestibûn li hêviya vekirina gulan bimînin. Belkî jî li hêviya yekê gulanê mabû. Ji 23'yê nîsanê û vir ve çend roj bihuribûn. Çend çavên din ên reşbelek çûbûn ser hev û êdî venebûbûn, nizamim lê gulan vekiribûn.

Heta niha min çend 23'yên nîsanê dîtibûn. Çend rê û resmên bêhna şer, xwîn û mirinê jê dihat dîtibûn. Heta niha çend caran libasên moxolan ên jonturkan li me kiribûn û di platformên bêhna sêdaran jê dihatin de em meşandibûn, reqisandibûn, bezandibûn nehat bîra min. Bila bîra min wan neyê bîra min. Bila bîra min; wan di bîra xwe de ji bîr bike.

Lê tê bîra min... Roj, roj li berîka Mêrdînê bû, her roj, roj bi roj, roj mezin dibû. Bayekî hênîk û tenîk mişt bi bêhna gulên gulanê ez dîl girtibûm. Ez bi raterqa xwe xistibûm li çiyayên bilind, li beriyên sêwî, li gundên bê xwedî gerandibûm.

Carna ez avêtibûm zarokatiya min, gava 23'yê nîsanê dihat bê min çawa ta digirt û min nedixwest biçim dibistanê û gava me firar dikir, em bi çol û çepelan diketin da ku kes me nebîne. Lê em didîtî, rojê em didîtî. Roja ku min bîr biriye û heta îro, roj li berîka Mêrdînê ye her roj. Roj ne weke a niha gir bû. Em biçûk, belkî jî bi gir li benda mezinbûna me bû.

Va ye roj hiltê, roj bi tîntir e îroj. A... ha!

Wa ye bû qebqeba cîrana me kewa gozel. Kewa gozel jineke ecêb e. Bi destê sibehê re radibe, malxirabê dertê şaneşînê, li dora xwe dinihêre. Nas nenas, hema kî/ê, kîjan cîranên me bibîne; jiyana xwe ji serî heta binî bi dengê qib ji wan re vedibêje. Bê rawestan wê rojê mêrê wê çî kiriye, zarokên wê çî xwarine û nexwarine. Do bişev çî şîv çekiriye, mêrê wê çî ecibandiye, çî neecibandiye. Xweş an serxweş hatiye, lê daye nedaye... Malxirabê her roja Xwedê - bi Xwedê!- tu yê bêtî qey raporên rojane dide ji serî heta dawiyê, bi hûrbînî bê ku tiştekî ji bîr bike vedigot. Bi dengê hêla vedigot. Ji bîlî wê deng ji tu cîranên me yên din nedihat, kî çî dike, êvarê çî xwarine, zarok û zêçikên wan çî kirine, tu kesî nizanibû. Kesî jê tiştek nedipirsi lê wê her roj heta roj diçû ava bê rawestan vedigot. Ji loma min navê wê danîbû kewa gozel û di demeke kin de rûniştvanên taxê ew nav pejirandibûn. Êdî navê wê kewa gozel mabû. Navê wê yê rastîn tu kesî nizanibû. Tenê wê her rojên 23'yê nisanê pace û şaneşîna xwe bi alên xwe dixemiland û xwe pê qure dikir.

Gulan gul vekiribûn, gulan di yekê gulanê de gul vekiribûn. Gulên min ên li şaneşînê jî gul vekiribûn. Sor û spî, li gel hev ew pir xweşik bûn. Vê roja biharê dilê min teng, derketibûm şaneşînê bi gulên xwe şa dibûm ku bi dengê qup li xwe ziviribûm. "Gulên te pir xweşik in. Gelek kêfa min ji wan re tê, sor û spî di gel hev eynî weke alê ne."

Min bê deng li gulên xwe yên ku min qet bi wî çavî li wan nenihêribû nihêrî. Çavên min ew werê neditibûn. Çavên min bi çavekî din li wan nihêribû.

Gulên min bêhna Seyfî, bêhna Cuneýt ji wan dihat. Bêhna zarokên çavreş ji wan dihat. Çavên min ew werê dîtibûn, ji loma min gelekî ji wan hez kiribû, bêhn kiribû, miz dabû, av dabû.

Ez qet nezivirîm û min li cîrana xwe ya kewa gozel nenihêribû. Min zend û bendên xwe hildabû ew ji nava hevdu neqandibûn.

Yên sor li şaneşîna rojhilat, yên spî jî danîbûn şaneşîna rojava û dîsa ji wan hez kiribû. Ew li ber çavên min dîsa şêrîn, dîsa bêhna wan bêhna zarokên çavbelek bûn, gulan bû, gulan li her derê gul vekiribûn. Çend ji wan qurmiçandibûn, lê ne mirîbûn, min ew dabûn hevdu, qelem kiribûn û di dilên wê de çandibûn. Ew di dilê min de vejyabûn. Gulan bû, gulan êdî di dilê min de gul vekiribûn.

Kewa gozel careke din derneketibû, tu kesî dengê wê nebîhistibû û li qebqeba wê guhdarî nekiribû.

Gulan bihurî, gul bihurîn, birînen di dilê me de hîn necebiribûn. Kewa gozel hîn bê deng, -dengê wê biliyabû- bi tumerî ne xuya bû. Ne li şaneşînê ne di paceyan de xuya bû.

Qehpika li ber paceyan, li ber paceya min roj bi roj mezin bûbû, pace giş zeft kiribû. Qehpika li ber paceyan; çiçekeke min bû. Ji ber paceyan pir hez dikir, ji bîlî ber paceyan li tu derên din mezin nedibû wê jî weke min pir ji çayê hez dikir. Her roj min çay didayê, ji wê re digot: "çiçeka çayê." Kî çî jê re dibêje bila bibêje, ev qehpika li ber paceyan e. A ha wa ye! Kewa gozel jî derketiye ber paceyê, li min dinihêre, awirên wê tûj in, dibe ku çêran li min dike. Belkî jî li çiçeka min -qehpika li ber paceyan dinihêre. Gelo wêya dişibîne kî/çi. Erê teqez ew çêran dike.

Dibêjin: "çêr ba ne". Li gor min çêr mirovan rihet dîkin. Herî pir mirov bi zîmanê xwe dikare çêran bike û xwe rihet bike.

Ez jî çêran dikim. Belkî nekim, lê ji bo hêrsa min danîşile dikim. Her kes dike, her kes hêrs dibe. De hûn mêr in nekin. Gava zarokekî çavbelek bi çavên xwe yên reşbelek berî ku bimire ji lédana sîxurekî weke ecêbekî bi doxa keleşkofa xwe gava li ber çavên we bi derbeyên kuştinê wî dîkuje, me dîkuje. De hûn mêr in nekin, gava zarokekî çavbelek bi çavên xwe yên reşbelek li nava çavên we dinihêre. De bi xwe bikaribin û nebêjin: "lawê qehpa ji dola gurên har!".

Şîtik

Jaro DIHOKÎ

Eva te divêt di mal de nemînît ji zêrî bihatir e, bi dehan hevalên ji avên bi
pirî pê li derbas kirin, birînên qurs û giran yêt pê hatine şidandin

Xwêdê bêhn vedaye û biyavê karên nav
xwe peyda dibît, piştî mal bijîn kirî û gêske
kehrebî vemirandî, çil şîwa dakarî û karê
balavê kir.

- Ev e çi kincir û mincir in di qumsurê de
û hindî min bîre ev e ya lêvre, eve zelamekî
gelekê seyr e... Çendê girêdaye bi tiştê kevn
ve (şîtika kun kun bir û havête di teneka
gilêşî de).

- Kiçê ew tu çi dikey? Ew çi bû di destê te
de û te biriye ji derve?

- Çi bû... Ma dê çi bît... Kincir û patên te
ne. Ew şîtika gewr a kun kun mîna seradê
min havêt!!

- Nekey... Here bîne û dane cihê wê, ew
şîtikeka pîroz e û nabît bikevête nav gilêşî de.

-Pirwaz çi ye? Mala te Xwêdê ava kirî.

-Kiçê... Ew yar e, dost e, heval e,
hevsenger e, parêzer e, pêştevan e, xem e, jan
e.

-Hema mar ke û bila şîtik jina te bît.

-Kiçê, nezanê, demekê geşê jiyê min yê
digel wê şîtikê borî û di nav kun û rengê wê
de birhatinên min dene saxkirin... Her bîne û
careka dî xelet nebî.

- Naînê. Ma dê heta kengê gundî bî...!!

Jineka bajêrî û xwendevan e, berdewam
hez diket guherîn di malê de peyda bibin,
hind bihayî nade te cil û berg û keresteyên
kevn. Nizanît kevlepîr û keşgerûn û şilemaş
û şalû û liş û suryaz çi ne, ne cerg birîn e ser
kaniyan û ne bîrî kirîne û ne biştên dara
înayîne û ne kuçik û tenûr helkirîne. Xwînê
dibînit rengê wê pusîde dibît, sîvandukeka
mirî bikevête ber çavên wê 'êlizcî dênê. Ne
reşik û kermûs û spî ye û nûja dinya sît.

- Te eniya? Zelaî got.

- Nexêr!

Neviya bikete arîşe, neçar bû ji nav gilêşî
ina der, daquta û pêça û got.

- Eger te zaniya bihayê vê çend e te çi
caran nedihavêt.

- Çi ye, hat û çû şîtikeka kevn û pirtikî ye
ma xwe ne zêr pêve ne?

- Eva te divêt di mal de nemînît ji zêrî
bihatir e, bi dehan hevalên ji avên bi pirî pê
li derbas kirin, birînên qurs û giran yêt pê
hatine şidandin. Qadên birîna yên dagirtin û
xwîn ya rawestandî û birindar ji mirina
misoger qurtal kirine. Eger ev şîtike neba da
teniştên me ji ber rext û sacûra rizîn, dibû
kule û di şevên sar û germ de û di nav gelî û
dehl û daran de em ji pêşî û dûpik û maran
diparastin. Gelek cara dibû weris û birindar
û nexweş le ser piştî diwara pê dihatine
peytkirin. Piştî me diparast, zikê me
dişidand, pirtir hêz û xweragirî dida me li be
pîrsê. Çek û teqemenî û bergên arpêçî ya pê
dihatine girêdan, dest û pê û çavên êxsîran
pê dihatine girêdan, dibû darbest û şehîd pê
dihatine veguhastin, dibû hêzûk û cûlank,
dibû pêstirk, piştên helza pê dihatine kêşan,
ava şêlê zelal dikirin, kanên pîrîzêrî pak
dikirin. Ji bo Xuda hêlane cihên kûr û ferke
dihate bikarînan. Ava bîran pê dihatê
helkêşan û li ser rûbar û gerên mend da masî
pê dihatine girtin. Ta ku lipekê tutunê şîşeka
lempê, gopalê kinêrê, çaydankê reşê çayê pê
dihate helgirtin. Ser û çavên cutyaran pê
dihatine paqijkirin û xuha eniya wan pê
dihate vemalîstin. vêca çawa dê vê xatîne
havête ser gîvanka, birhatinên min û
miletêkê û soreşekê dike ye helm û derîne ji
qazankên helmê û semawer û çaydankan...!!

Şîtik li dor enîşka xwe aland û kire xilf,
bêhn kir û maçî kir û dana cihê berê wek
tiştêkî biha pîroz.

(*Tîpguhêzî: Enstîtuya Kurdî ya Amedê*)

Bistrîne rêwîtiya dengê min

Îlhan Samî ÇOMAK

1.
Îro min çiya qusandin li ser zimanê xwe
Çemê çavên min pekiya eniya rojê
Roj jî qusiya
Me di meydanên şevê de zilma tariyê fetisand
Ewrên ku di rûyê min de daliqandî bû hatin xesandin
Orîniya Xwedê ket guhê balindeyan
Min singa çiyayan da ber bihuştan
Sê roj û sê şevan diranên min êşiyar
Hûn dizarin ez dîm im îro
Jixwe heyv jî hiltê wa ye
Wa ye çingîniya ku di guhê min de ye
Dibe nexşeyên ker û lalan
Çar roj û sê gund e ez birçî me
Dikim xwîna xwe vexwim
Dibêmin bila êvar newestî
Bila xwêdana yara min bibe haveynê deryayan

Tayên bedena min spî ne
Êdî em mîxên Xwedê didin ber jenga xwîne
Destê min cîrnexweş e destê min bêbihuşt e êdî
Wa ye ji we re dibêjim
Di nav nexşên rûyê min de hûtên heftserî
Mizgeft û dêr hene
Min ji hemû baranan re vegot;
Ba li gûzika min dikeve û firtone radike
Werin em xwe bispêrin çavên min
Dema destê xwe radikim daristan vediciniqin
Difînen payîzan diricifin
Westandina min kerxaneyên gurêxan e
Ya dî jî dengê min pir xweş e
Şiverêyên berbûkên min bihara min xwîn dîkin
Ji bîr nekin navê min xeyalên keçên xama disincirîne
Ji bîr nekin ez bi çargavî dibezim
Newalên ferîşteyan, oxweş!

Min di kerika guhê xwe de agirê dinyayê dada
Rikên deryayan hogirên min in
Hey şengebî, siya te zilma maran vedikişîne xwe
Hey hostatiya tiliyên min
Min bi evînekê bîranînên saryazan honandiye
Di deşta destê hûrgeniman de
Stêrkên xuricî kon vedane
Îcar ez çawa qendîlan bitefînim
Bi banga keleşêran
Min zingilê masiyan dikiland

Deryaçê ji ber toza lingê min hemil dibûn
-ya rastî min ev lêker baş bi cih kir-
Jixwe neynûka min dirêj bûye
Çend roj e min serê xwe jî neşûştiye
Werin avê çawa di devê xwe de wer didim
Şanî we bidim
Erê, neynûka min xwîn jî girtiye
Erê, li ezmên dirêjbûnên nû diceribînim

2.
Qetrena destê min bi biskên bayê ve bû
Nikila tenêtiyê li bendemayînen jinebiyan dixê
Werin ji we re çîroka pertavê
Ku bi hêrsa min ji ber diranên vepekiyayî vebêjîm
Werin em deştên ku bê av mane
Bi tovên mêraniya xwe av bidin
Kî ku bibêje balinde rûken in rast dibêje
Kî ku bibêje hespên mêrgên nêzik ez im
Ez ê singa xwe şanî wê bidim
Ji we re rastiyeke din
Çiya qertafên likumîna min e

Bi serê derziyekê êvaran dax dikim
Dixwazim navê şemiyar jî biguherînim
Delala min a çavbikil û bîst û pênc lerza xweşikîyê
Zendên xwe vedimalim û li ezmanan
Rêya koçeran dikolim (di hûçikên min de
Qeytanên keskesoran
Carna dibêmin mêjûya bav û kalan
Bidim ber kevîran
Çawa ku porê xwe şê dikim
Dijûnên devê min dibin gul ji jinan re)
Wey loo ew çî bû ku min kir
Êdî hez dikim bibim qulingên ji qulingan

Min duh bêriya ezmanên nû welidand
Heçko bayê sayî li pişika min ket
Û kuxiyam kuxiyam kuxiyam
Oqyanûsên hinavên min qelişin
Ji şaneşînên hetavên derengmayî
Ji kula heft şûran
Ji dev û pozê yaran ku ez ji paniya wan
Ramûsan berhev dikim
Ji golên ku pênc caran tê de xeniqîme
Ji spîndarên ku min hefsed sal berê

Navê xwe kola bû
Ji hemû niviştan, dibêmin ji we re
Werin gurmîniya rahêja min guhdar bikin
Dahlên hilma min li ber lingê yara min
Bêhna kulîlkan vedide

Ez li pey sonda xewnên xwe me
Di rêyên fetlanok de
Guzîniya bablîsokan berz dibe
Ez ê hemû rastiyan serobin bikim
Dirêjbûn û kinbûn bila tenê bibe xesletên rojan
Bila werz bipengizîn rûyên zarokên nehs;
Her wekî din
Lê îro bê xew im û serê min diêşê
Çar roj e dengê xwe dixwim, hwd.
Heçko dikulim ku nizamim ba ye an bayî ye
Belkî xiştika çavê yarê li min ketiye
Di bin kevirên qurçan de
Di çongdayîna gayên bin nîr de
Li ser erdê ku di bin lingê min de
Kûrahiyê dide xwe
Li wir, min tenbûrek jenand

Deng û hostatiya bapîrê min daket meydanê
Nizanim çima ye, dêya min ev sî sal e
Şîva miriyan dide qurnefîlan
Belkî ji vê ye solên min qet naqetin
Ez çolaq im û dûmana devê yara min
Li ber çavê min ê çepê xumaman radixe
Perdeyên rûyê min tenik û sor in
Lehiyên hêrsa min pêxwas in li ber şewla we
Jixwe ez hinek kêmin hinek li dûr im
Li ber ewrên payîzan

Min cureyek nû kifş kir, çarşem
Dengê çeman winda bûye
Di xeyîdina keçxamayan de
Xwîna bêjeyên nûzayî ziwa bûye
Li ser lêva min
Pençe û qîlên valahiyê razên min perçe dikin
Qîrîna min olana çîyan li hevalan dixê
Ez ê dengê bilûra xwe bidim devê bilbilan
Û di pelşên latên eniya xwe de
Sosinan avdim

Kanê

Mehmet DEVÎREN

Ez kul û derd
Ez zerya,
Tu jî bûye çiya,
Silav!....
Di çavên te de
Her çar demên
Bihara rengîn,
Bêhna axê
Ji kevirên te tê.
Û çavekî betilî,
Û bi dilekî xembar,
Serê xwe dihejîne
Silav xweş,
Gelek dem derbas bûn,
Li ser evîna min.
Qîrîn, ji kevrên min.
Hawar,
Kefenê li ser min.
Û wextê hubir dirijîya
Dilop bi dilop diniqutî
Nava dilê min.

Şev û roj diheliya
Kevirên min.
Ax!..ax!..
Wextê ez qîz bûm.
Nava gur û hirçan de,
Min xwedî kir gelek şêr,
Xaçerêkên xwe
Min
Berda biniya xetê,
Wextê dibûn werd,
Dibûm mawerd di reha
wan de.
Wextê dibûn sazband,
Dibûm qîrîna dengê wan.
Îro jî,
Çiyên bav û kalên min,
Bûme dîroka wan.
Dilê min.
Çiqas bixwazî ji tim,
Xewnên evînê.
Bi duldulên xwe yên,

Gewr û boz.
Dikim qîrîn û hawar!
Kanê ew çiya?...
Kanê ew asûman?...
Kanî ew av?...
Kanî ew zerdûştiya min?...
Dilbirîna min!
Yek dibe,
Çar tîlên evînê.
Şîn dibe,
Tunebûn!
Bêkesî!
Bindestî!
Û mirin!
Li hev digere cemidandin,
Li dora siya min.
Kanê!..
Kanê!..
Ew ên min ava kir!
Min xwedîtî lê kir!
Ew xwediyê min!

Guldesteyek helbest

Zekî Kayar

Veşartok

Pêşiyê çaryeka ruhê min dişewibe
Ji têhna etên revok
Piştî çaryeka giyana min dişewite
Ji pêta xermîşkên nermok
Herî dawî jî em bi veşartokê dilizîn
-mexsûs?- destê min dikeve
ser qoratê memikên te
ne hîle ye ha
“pîvanên GERDENÎ” (yên gerdûnî)
yên vê listikê wiha ne...

Parastin

Parastin pakirina pehnava
Pêjna nîvê pişa me ye...
Ger paldankek hişmendî jî li ber be
Wê pirtir perweste be
Pevgihana pîr-roj û paleyan
Gundî û karker
Jin û zarok
Û gişî fêris û pêlewanan jî li pey
Ta azadiyê
Ta navsera Nirvanaya pîroz

Valahî

Beriya herî fireh a cîhanê
Berahiya bêrîkirina te ye
Ji bilî dîtina çavê te
Tu tişt nikare wê tijî bike
Û dagire...
Şev û roj bi benê valahiya
Sarincên “jitedûriyê” ve
Hilawistî me...

Quling û şimşal

Cîhan ROJ

We ne Bokan dîtiye ne jî we tu car guhdariya şimşala Qale Mere kiriye, hûn nûçeyekê dixwînin, di nûçeyê de mirina şimşaljenekî hatiye diyarkirin

Cara pêşîn hûn navekî dibihîzin. Navekî, ne ji wan navan e ku we bihîstibe. Piştî hûn li wêneyê xwedî navî dinihêrin tu wateya nav ji bo we namîne; wêne bangî ruhê we dike, di xeyalên we de dibe reng, dibe dengêkî kûr ê fesîh. Qermiçokên li eniya kesî, ew qermiçek li ber we dibin rê, dibin dirb, dibin name, dibin hêma we ber bi asîmanekî edebî ve dibin.

We ne Bokan dîtiye ne jî we tu car guhdariya şimşala Qale Mere kiriye! Nûçeyek. Hûn nûçeyekê dixwînin, di nûçeyê de mirina şimşaljenekî hatiye diyarkirin.

Çi kir peyva “kor” kir; peyva kor, bi nav hiş û dilê min ket! Ez jî wekî we gelek kesan xwîngerm im, hest li min jî tenik e. Bi derbirîna serhedîyan carna dilê min jî, ji pelê cixareyê ziravtir e. Bi kelecaniya xwe re risteyan xwe da der. Ji bo navekî ku hew di nûçeya mirinê de dibihîzim risteyên helbestî xwe dan der. Ne min got, çi kir peyva “kor” kir!

Çawa aniha Evdal bi bîra we hat, bi peyva kor re Evdal bi bîra min jî hat. Min guhdariya şimşala Qale Mere nekiribû lê min serpehatiyên Evdalî xwendibûn. Evdal î bi qulingan re axivîbû. Evdalê Kor. A, peyva kor bû sedem ku ez kurteçiroka bi navê Quling û Şimşal lê bikim. Min Bokan nedîtiye. Nizanim dengê şimşalê li wir çiqas sivik û kûr olan dide. Nizanim şimşala Qale Mere bû sebebê çend evînan. Nizanim çi trajedîyan dida der. Nizanim çend keç û xort piştî dengê şimşalê bihîstin bi nav baxçe û rezan ketin. Beden çawa bi wan sivik bûn. Bi çi çavî li rojê li kulîlk û asîmanê berêvaran

nihêrîn. Peyva “kor” çi bû, Evdal û Qale Mere kor bûn? Ma hewceyê pirsan e, na. Em çiroka xwe lê bikin. Çiroka kurt, çiroka ku hew ji bo silavekê, silava li kesekî, kesekî aniha mirî, kesekî gelek ji min dûr û ew qas jî nêzî dil û ruhê min. Silava li şimşalê, silava li qulingê...

Ev çîrok ji bo bilûrekê ye di heman demê de; ger rojekê ez bilûra Qale Mere li muzeyekê bibînim belkî wê çaxê çirokek din dest pê bike, belkî jî romanek û belkî jî ev çîrok ji bo çîrok an jî romana wê kêliyê ye!

Dinya sar bûya germ bûya ne xema wî bû. Ew li pêş xênî rûdinişt. Dibû guhdarê dangan. Dîsa li pêş xênî rûniştibû. Sêvek di berîka wî de bû. Çend roj bû ew sêv nedixwar; carna dikir destê xwe, pê dileyîst, carna bi rengê sêvê şa dibû. Carna jî bi saetan li ciyê kurmxwarî dinihêrî û difikirî.

Wê rojê biryar dabû, wê sêv bida zarokekê. Wî, sêv mîna hevalekî hîs dikir. Lewre di nav dudiliyekê de bû. Hê ew dudilî çareser nekiribû dengê çivîkekê bi ser wî ket. Gelek wext guhdarî kir. Ew deng êdî bi wî ecêb dihat; çivîk mîna bixwaze tiştêkî jê re vebêje. Deng gelek ji nêz ve dihat. Li derdora xwe nihêrî çivîk nedit.

Şimşal girt. Lê da. Ecêb bû, wî çiqas bilûr lê dida dengê çivîkê ew qas tevlî dengê şimşalê dibû. Mijxule bû her dever li ber çavên wî. Piştî çend deqîqeyan êdî bi şimşalê bi çivîkê re diaxivî. Şimşal ji dest danî. Çivîkê hê jî dixwend. Ji nişka ve got; “Heywax, qey ez jî bûm Evdal!”.

Ji misîn hinek av bi ser çav û rûyê xwe wer kir. Êdî şev û roj ji bo wî yek bû. Av di nav riha spî de dadipalî. Hew her sê dilopên di nav her sê qermiçokên li eniya wî de mîna civayê diçûn û dihatin. Qermiçokên kûr her carî dilop vedihewandin. Wî jî dest nedidayê.

Bi dengekî bilind got; “Çavên min nabînin!”. Kesan gotin; kalo kor bû, kalo ji ber nexweşiya xwe kor bû, kalo ji her du çavan ve kor bû!

Hê jî çîveçîva çivîkê bû. Qale Mere her Evdal bi bîr anî. Got; “Ez û Evdal, quling û çivîk. Ez û Evdal, gotin û şimşal.” keliyekê hîs kir ku bilûra wî bi wî bûye

çivîk. Serî bilind kir, di xeyala xwe de didît bilûr bûbû çivîk û li asîmanê Bokeranê difiriya, ji bo xwe li ciyekî digeriya.

Bila çirok aniha ev qas be. Ez dîsa bi dilê xwe re mijûl bim çêtir e.

Ez nizamî rengê bilûra Qale Mere tîr e an vekirî ye, lê, aniha, dengek bi ber guhê min dikeve, hîs dikim ku kûr û dûr e, dizanim dengê şimşalê ye, dizanim navê bilûrvanî çî ye lê nizamî ez ê bilûrê çî wext li kîjan muzeyê bibînim. Mereq dikim, mereq dikim bê çirok an jî romana wê keliyê dê çawa be!

Demokrasî

Dilşêr BÊWAR

Li bakurê dilê min
balefir li ser çiya diwelidin
ro di nava ewrên sor de dixeniqî
rûspiyeke şilftazi laşê xwe yê qurmiçî
bi hawara xwînê avdida

Li Marmarayê pêlên deryayê rûyê
perav û çîpên, çîprûtên demokrat dialast
roj di nava aramiyeke bédeng de diqulibî
du evîndar bihevşabûna lêvan re
sermest û serxweş dinaliyan

Di bin tîna rojê de xwîna penaberên
aboriyê dinuqutî ser axa rojava
tevşoyê karker bê rawestan
li ser bizmar radibû û dadiket
sofiyê didanpij peyv li peyvê siwar dikir
bi zanîneke ji xwe bawer diaxivî
wele di nava Tirkan de DEMOKRASÎ heye

19 05 2009
Beylukduzu/STENBOL

Hinar

Ehmed TARÎ

Demekê ode bêdeng ma, paşê lihêfa gede lebitî û ji nav qatên wê dengekî biçûk hat, dilê dê û bav fireh bû, bi şadî li hev nihêrîn

Ronahiya bihurbar a roja li ber avabûnê diavêt odayê. Tê de, bedena wê bi tirs dagirtî, Xezalê wiha bê hêvî li kurê xwe yê nexweş dinihêrî. Porê zarok, ji xwêdanê şil û birqokî, bi rûyê wî yê sor î tayê ve zeliqî bû. Dê hem li zarok dinihêrî hem jî car caran dilopên xwêdanê bi dilovanî ji eniya wî dimalişt. Cîrana wan, Rêhana pîr, li hember wê, li aliyê dinê nivînê gede, rûniştibû û li dê û zarok dinihêrî. Car caran bêdeng dua dikir. Carinan jî bi dê re dipeyivî da ku tirsê wê daxîne.

Xezalê got; “Ev du roj in, xaltiya Rêhan, berxê min wiha bi xwe ve çûye û nayê ser hişê xwe. Di vê maweyê de, hişk an nerm, tu xwarin di gewriya wî de neçûye xwarê û taya wî jî naşikê.” bi dengekî nizm, û lûband. Paşê lûbandina xwe birî û bi îskînan dest bi girînê kir.

Gava cara pêşîn nexweşiya gede diyar bûbû mêrê wê jê re gotibû:

“Ji xaltiya Rêhanê bipirse, meryemxort e, pûng e, nane ye, çi giyayê şifadar pêwîst e bikelîne, piçek şekir têxe ava wê û bide zarok. Heke ber bi silametiye ve neçû wê gavê em ê wî bibin ser tixtor.”

Lê nebiribûn. Gundî hemû têkildar bûbûn û carinan gotibûn ku ji bo gedeyekî ev qas nexweş rê dûr e, carinan gotibûn ku hewa pir sar e yan firtone ye û nizanîm çi. Tu kesî qala mesrefa tixtor, nexweşxaneyên bê ser û bin, nekiribû.

“Me biryar da ku em ê piçekî din bipên. Me hêvî dikir ku ew ê –bi saya Xwedê, bi saya Rebil Alemîn- xwe bi xwe ji vê afatê bifilte û êdî wê pêwîst nebe em wî bibin bajêr. Tenê min zanibûya berxê min ê ev qas giran nexweş biketa.”

Dengê Xezalê pêda pêda ket û wê carin dest bi girînê kir. Hêsrên wê di nîvtariya êvarê de li ser hinarikên wê dibiriqîn û diherikîn xwarê. Rêhanê bi dilovanî lê nihêrî, destê we mizda û got:

“Ez dizanim keça min, ez dizanim tu çiqas ezab dikişînî. Lê ji bir meke ku zarokên biçûk zû nexweş dikevin, lê wiha zû jî tî ser xwe. De ka ji xaltiya xwe re taweyek an jî beroşekê bîne, ez ê eniya gede bi teniyê îşaret bikim; dibêjin fêda wî heye.”

Xezalê taweyek anî. Rêhanê tiliya xwe ya îşaretê ya destê rastê di teniyê da, got *bismillah* û bi destekî lertzok li ser eniya gede îşaretek çekir. Îşaret di şiklê xaçê de bû.

Ewrên tarî di ser malê re herikîn û nivronahiya odê hêj bêtir tarî kirin. Dilopên baranê nermika li paceyan xistin û herikîn, şopên paqij li pey xwe hiştin. Xezal veciniqî, serê xwe hilda û bi çavên vala di paş Rêhanê re li derve nihêrî. Bayekî xurt deriyê hewşê di çarçoveya wê ya sist de hejand, ecacek di ser malê re herikî. Xezal bi tatêl di pacê re li ezmên nihêrî.

Rêhan li guherîna wechê wê varqilî:

“Xem meke keça min, Şerîf di tu xetereyê de nîn e. Heke piçek dereng maye miheqeq sebebek wî heye. Mêze, tu niha gede li ba min bihêle, here şorbeya birincê çêke û hinek ava simaqê têxê. Heke simaqa we nîn e ez herim bînim; li mala me heye. Gava gede hat ser xwe dilê wî yê tişteki miz bixwaze.”

Ronahiya rojê xwe vemirand û ode bû tarî. Tenê agirê sergînan ji kuçik ronahiyeke sist li nav odê belav dikir. Xezalê

destê xwe ji rûyê gede vekişand. Ji ser re-fikê çira girt, vêxist û ji odayê derket. Pêta lerzok a çirayê li ser dîwarên xuloxwarî şiklên tîrsdar afirandin. Rêhan li ciyê xwe ma, weha li şiklê zarokê bi lihêfê pêçandî nihêrî û duaya xwe dom kir. Bistek paşê rabû, secadeyek li ber pacê raxist û dest bi limêjê kir. Wek ku ji taritiya odayê nerihet be nêta xwe bi deng anî: *“Nêta min, qesta min, berê min li qiblê, qibla min li Kabê, ez ê sê rîket nimêja mixurbê bikim, ya Rebî tu qebûl bikî”* û dest bi nimêjê kir. Dûre dût û dirêj dua kir. Paşê rabû secade qat kir, hilanî û dîsa li ber serê gede rûnişt. Hew dît ku zarok lebitî. Dilê wê fireh bû. Bi ser gede de xwar bû û bi baldarî li rûyê wî nihêrî. Di wê kêliyê de dê jî ket hundir:

“Xezal, çavên te ronî, kurê te silamet e; carekê xwe tevda. Tiştêk jî got lê çi, min baş nebihîst. Edî ez pîr bûme keça min, guhên min giran bûne.”

Xezalê got; “Bira xaltiya Rêhan!” û zû bi zû teyfika di destê xwe de danî ber kuçik û ber bi cihê gede ve lezand. Li ber serê zarok rûnişt, lambe bilind kir û bi hêvî li rûyê kurê xwe nihêrî. Gede cardin xwe tevda. Dê bi dilovanî destê xwe da ser eniya wî û zivirî ser cîrana xwe:

“Ev îşareteke bi xêr e ne wilo xaltiya Rêhan? Di êşê de nebe gelo?”

“Helbet ya xêrê ye keça min, ma çima jî nû ve divê rewşa wî xirabtir be. Êdî miraq meke delala xaltiya xwe, bi saya Xwedê kurê te filitiye.”

Dê nedikarî bitebitiya, misêwa dimizicî û di odayê de diçû û dihat. Paşê derket çû ber derê hewşê, li wir sekinî û dût û dirêj ber bi rojhilat ve nihêrî. Dûre zivirî, kulmek qût avêt ber mirîşkan û vejeriya, hat odayê.

Ewrên nizm î giran ku di ser heremê re bi gef diherikîn dawiya wê roja cotmehê zû anîn. Bayekî sar î xurt dihat û baranek jî pê re dibariya. Birûskên nabînker, çep û rast li der û dora Şerîf xistin û peqîyan, di bin lingên wî de erd hejiya.

Şerîf çefiya xwe li stûyê xwe pêça, kişand ser dev û pozê xwe, darê xwe ji xwe re kir destek û gayên xwe ber bi gund ve lezandin. Dinya ji nişka ve tarî bûbû. Gelek caran ketin nav ava lehiyan.

Gava ketin nava gund tenê dengê baranê û herka avê dihatin. Ava baranê li ser benderan bûbû lehî, pûş û palax dabûn ber xwe û di nav kuçeyên teng î badanok de kef dida û ber bi jêra gund ve diherikî diçû. Sivêrnegên ji qarûş li ber bayê wek ketenên şil dihatin daweşandin. Ax û ava ser xaniyan tevlihev bûbûn, bûbûn herî û şîr şîr di çironekan re dirijyan. Dengên her roj ên gund: bang û qîrînên zarokan, ewtina kûçikan, dengên gundiyan nedihatin bihîstin.

Şerîf gayên xwe bi lez xistin axurê û ber bi odayê ve lezand. Li ber derî çend caran lingên xwe hişk li erdê xistin, bi kefên destên xwe du, sê caran li xwe dan, da ku ava baranê daweşîne û derî vekir. Bi tehndana derî re xirçînî ji menteşeyan çû, pêleke bayê sar pê re ket hundir. Şerîf di şemûgê de sekinî û bi dor li pîrekan nihêrî.

Rêhanê got:

“Li wir nesequine lawê min, were jor. Çavên te ronî, kurê te bi silamet e.” Şerîf careke din li jîna xwe nihêrî. Rûyê wî yê biken xebera xêrê beliyand. Şerîf, kulavê xwe ji xwe kir û li paş derî daleqand, çarox û goreyên xwe derxistin û çû ber kuçik. Li wir, li ber êgir çend caran destên xwe mizda. Paşê rabû çû li ber nivînên gede çok da û eniya wî nermika ramûsa.

“Germayiya wî daketiye,” got.

Demekê ode bédeng ma, paşê lihêfa gede lebitî û ji nav qatên wê dengêkî biçûk hat. Dilê dê û bav fireh bû, bi şadî li hev nihêrîn.

Xezal hin qirş û çend rehên tûmikan xistin kuçik, pif kir wan û agir gur kir. Paşê zivirî ser mêrê xwe:

“Here xwe germ bike, yan na tê jî nexweş bikevî.”

Şerîf çû li ber kuçikê rûnişt. Rûyê wî li ber êgir di taritiya odayê de dibiriqî.

Pîştî demekê Rêhanê hêz da xwe rabû û got:

“Zarno de ka ez herim malê, Hecî aniha li benda min e. Ji bo gede jî firîqet bin, însela ew êdî bi silamet e”.

Xezalê gotê:

“Xaltiya Rêhanê, tu bisekîniyayî me bi hev re şîv bixwara paşê tu biçûyayî.”

“Xwedê bereketê têxe mala we keça min. Hûn şîva xwe bi efîyet bixwin. Bawer bikin, mehdê min jî qet tune ye.”

“Wele wiha nebû, qet nebe beriya çûna xwe te tiştêk bixwara.”

“Weke ku min xwaribe, keça min. Xwedê bereketê têxe şîva we û mala we. De ka ez herim.” û derket çû.

Xezalê binraxek li nêzî kuçik raxist û got:

“Tu pir westiyayî û bêxew î jî. De heta ku ez şîve çêkim tu jî here xwe dirêj bike, piçek xewa xwe bigire.”

Şerîf rabû, çû xwe li ser binraxê dirêj kir û piştî xwe da êgir. Pir neajot di xewê re çû. Xezal demekê li ber serê gede ma.

Hê nû ponijîbû ku ji nişka ve dengê ji gede hat, got:

“Hinar!”

Xezalê çavên xwe piçek bi derengî vekirin û li rûyê kurê xwe nihêrî; lê zarok ji nû ve di xewê re çûbû.

Xezal ji westê ji hal de ketibû. Pir neajot cardin di xew re çû. Bîstek paşê çavên xwe vekirin. Nizanibû bê çima hişyar bûbû, heta ku ji nişka ve ronahiyeke din-yayê dagirt û li pê şîrqîn ji ezmên çû. Xezal veciniqî. Şerîf jî hişyar bû, li ser binraxê rûnişt, li der û dora xwe nihêrî; fêhm nekiribû gelo çi qewimî bû. Zarok ji wê gavê xwe tevda û cardin peyivî, got:

“Hinar!”

Şerîf, hişê wî ji xewê tevlihev, ji jina xwe pirsî:

“Çi got, keçê gede çi got?”

“Ne tu tiştêkî girîng e. Zarok nexweş e, ji pestan dipeyive, razê.”

“Keçê ma min bihîst, got ‘hinar’! Bi Xwedê gede hinaran dixwaze.”

“De em bêjin wilo ye; ma vira gund e, em ê ji ku derê jê re hinar peyda bikin?”

“Pir mineminê meke! Rabe, here ji gundiyan bipirse. Dibe ku îroj kesek an du kes çûbin bajêr û yek ji wan hinarek an du hinar anîbin.”

“Tu dîn î, çi yî kuro! Yanê aniha bi rastî tu ji min dixwazî ku ez herim nava gund, mal bi mal bigerim û bipirsim ka kî çûye bajêr û hinar aniye? Kî yê aqil li serî di ro-jeke wiha erjeng de dihere heta bajêr?”

Lê Şerîf nig da erdê û ji yek û nîva xwe de neket. Dengê wî yê tûj û bi qerar gen-geşiya Xezalê birî. Jinik bi niçenîç ji malê derket çû. Demek paşê vegeriya, got:

“Niç! Îro tu kes neçûye bajêr.”

“Wê gave ez ê herim ji gede re çend heban bikirim, bînim.”

“Di vê qiyametê de? Ma qey te mêjiyê xwe xwariye kuro! Dev ji çûna bajêr berde, li derve mirov nikare ber pozê xwe bibîne. Di vî halê xwe de tu yê çawa karibî wê rêya hanê giş bikudinî. Ku te xwe gi-hand bajêr jî tê li kê derê dikanêke vekirî bibînî? Êvar e, xelk giş aniha çûye mala xwe.”

“Ma tu ji kengî ve bûyî pispora dikanan. Qey dikan giş bi hev re girtin keçê? Hin kes dikanên xwe zû nagirin. Heke yên vekirî tune bin jî ez ê herim xana Hemîd. Ew tim li xanê ye. Heke xan girtî be jî ew ê di qehweya tenişta xana xwe de be. Cî-ranekî wî beqal e û dikana wî girtî be jî Hemîd miheqeq mala wî dizane. Ew ê ge-deyekî bişîne û wî bîne.”

Xezalê bi hêrs got; “Xwedêyo tu aqil bidî! Ê baş e, here. Heta niha ji bo gede

ez ketibûm tatêla mirinê, ew bes nebû îcar ji bo te... Te hîna şîv nexwariye. Tu westiyayî yî û bêxew î kuro. Bi Xwedê an temafîlekê dê li te biqelibe an jî li ser deşta Xwedê brûskêk dê li texe û te bişewitîne. Heke tu li mirina xwe digerî, dixwazî min û gedê bêkes bihêlî here!”

Di navbera ku mêrê wê haziriya xwe fikir de, erna Xezal daket, dilê wê bi mêrik şewitî, got:

“Qe nebe ji gundiyekî hespekî bixwaze, tê wê gavê hêsatir û zûtir herî û vegeirî. Li halê xwe binihêre, ma qey tu yê wê rêya Xwedê giş bi peyatî bikudîni herî?”

Şerîf hîna jî bi hêrs bû, got:

“Erê! Heke pêwîst be ez ê bi pêyan herim.”

Kêliyeke paşê, Şerîf ji gund derket. Bîskêk paşê Xezal çû ber derî li pey merê xwe bi endîşe mêze kir. Li ser hespê, bedena wî li ber bayê xurt qilûzbûyî, wek siyeke reş di diyarê gund re qelibî çû.

Wexta giha ser papûrê Şerîf bi çavên westî asoyên li dora xwe malîşt. Li ser milê rastê, kopê Çiyayê Reş di bin betaniyeke tarî de, car caran sor dibû, kûr kûr dipeqiya. Li pêşiya wê di nav tarîtiyê de bajar wek sorayiyekê xuya dikir.

Bi qasî saetekê paşê gihabû ser Girê Seyranê. Li Şerîf sar bû û ji hal de ketibû.

Ji xwe re got; “pir nema, carekê ku ez giham bajêr û min piçek xwarin xwar û qedehek çay vexwar ez ê bêm ser xwe.”

Piştî ku ji gir daketin, ketin nav Qişleyê, Şerîf di ber rêzek xanî re derbas bû. Xanî malên serbazan bûn, yekqat bûn. Her yek ji wan bi heywanekê bûn û baxçeyên wan dihatin heta ber cadê. Dengêkî sîsele ji malan dihat. Rojekê muxtarê gund ji wan re gotibû; “Hûn dizanin, ev deng ji qutiyekê tê ha, jê re dibêjin *rad-yon*.”

Di malekê de jinikeke ciwan li ber neynikekê pore xwe şeh fikir. Gava Şerîf giha texma malê jinik sekinî, hat ber paceyê û

li siwarê bi tenê mêze kir. Şerîf fikirî: ‘gelo jiyana wan çawa bû.’ Li şûna pîrekê xeyal kir ku jina wî pore xwe yê reş î hevrişimî şeh dike û di dilê xwe de bi evindarî got: “ew ê çiqas xweş bûya!”

Kuçe û kolanên bajêr bi ava baranê hatibûn şuştin û di bin lambeyên elektrîkê de dibiriqîn. Simên hespê wî li ser kevirên parkeyê wek saetek, dengê ahengdar û bilind dida. Di qehwexaneyan de birên merivan rûniştibûn çay û qehwe vedixwarin û hinekan jî bi kaxizên îskambîlê dilîstin.

Wexta di ber xwaringehêkê re derbas dibû bêhnên xweş dihatin pozê wî, madê wî vedikirin. Xwaringehên ronî û geş tijî muşterî bûn û di nav maseyan de garsonan ji muşterîyan sparîş digirtin û ber bi metbexê ve diqîriyan.

Li ser peyarêyên nêzî xaçerêya Deriyê Çiyê hin mirov hêj li ber malên xwe, di bin ronahiya kêmhêz a lambeyên şêst watî de li hêviya muşterîyan bûn. Li ser dezgehên xwe neynik, şeh, kiras û derpêyên erzan û tiştinên din rêz kiribûn. Li dikana di quncik de meşrûbatfiroş, li paş rêzên qedehan ku di bin lambeyan de dibiriqîn, sekinibû û muşterî dipan. Lîmonata, vîşne, ava hinaran û hin meşrûbatên rengîn di sarnîçan de diçerixîn. Li hoka li aliyê dinê xaçerêyê, dikana helawfiroş hîna vekirî bû.

Şerîf di dilê xwe de got “Gava min karê xwe qedand heke hê jî vekirî be ez ê ji Xezalê re piçek helaw bistînim.” Çendekî çûn. Êdî gihabûn texma Çarşiya Şewitî. Hespê xwe ji cadeyê dagerand milê rastê û ket nava kuçeyên teng û tarî.

Xan hîna vekirî bû. Gava Şerîf ket hewşa xanê bêhneke diwar li pozê wî xist, bêhna wî biskekê çikiya. Piştî ku hefsarê hespê bi xelekeke hesinî ve gireda çû ba Hemîd. Wexta çavên xwediyê xanê bi Şerîf ketin camêr şaş ma. Gelo di vê saetê de çima ev zîlam hatibû?

“Xêr e xwarzê! Tu û van deran di vê wextê û vê bahozê de! Hêvî dikim ku ti-

şteki xirab neqewimiye.”

Şerîf got; “Xulamê te be, kurikê min nexweş e,” û demekê sekinî. Paşê bi terdud lê zêde kir: “û hinarê dixwaze”.

“Hinar?” dubare kir xandar. “Ê ma niha dereng e, hemû dikan girtî ne.”

Şerîf fedî kir. Demekê bê deng ma. Paşê bi teredut got:

“Min hêvî dikir ku, xalê Hemîd, tu yê alî min bikî.”

“Ez? Lê çawa xwarzê?”

“Min got qey heke tu mala wî dizanî, tê ji xêra xwe, yekî bişînî cem cîranê xwe yê beqal wî binî vira.”

Xandar ji dil got; “Qasim! Helbet ez dizanim mala wî li ku derê ye. Binihêr ha! Çima ev fikir nehat bîra min!” û bi ber xwe ket. Paşê bangî xortekî kir û got:

“Remezan, kurê min here mala Qasim, jê re bibêje ‘Xalê Hemîd banî te dike. Heke ji te pirsî got çima, tenê bibêje ez nizanim. Tu dizanî mala wî li ku ye na?’”

“Erê xalê Hemîd, li nêzî qehweya Mêrgehmedê nîn e?”

“Erê li wir e. De bilezîne. Tu bêtî wî ve negerî ha! Li ser riya xwe jî ji qehweya cîranê me re jî bibêje bila ji me re du çayan bişînin.”

Paşê zivirî ser Şerîf:

“Gede niha çawa ye, xwarzê?”

Şerîf got; “Dema ez ji malê derketim, baş bû.” û rewşa gede ji xwediyê xanê re bi kurtî got.

Çendek paşê beqalê matmayî xuya bû. Gava nêzikî li wan kir pirsî:

“Çi ye, çi qewimiye cîran? Diz ketine dikana min?”

Hemîd got; “Tişteki wisa nîn e cîran, firîqet be.”. Paşê serê xwe ber bi Şerîf ve bada û got:

“Lawê vî xwarziyî nexweş e û hinarê dixwaze. Bav di vê hewayê dijwar de ji

gundê xwe derketiye hatiye heta vira. Dikan giş girtî ne...”

Beqal got; “Min fêhm kir.”. Paşê zivirî ser Şerîf û jê rewşa gede pirsî. Dûre got:

“Ez ê niha bêm.” û ji xanê derket, çû.

Demek paşê vegeriya xanê, hinar dan Şerîf û got:

“Ev ji bo xwarziyê me yê biçûk diyariyên me ne.” û Şerîf çiqas îsrar kir jî perê jê negirt.

Cih nediket Şerîf. Miraqa lawê xwe dikir û dixwest di demeke nêz de xwe bigihîne malê. Hinaran kir heqîbê, ji her du zilaman destûr xwest û li hespê xwe siwar bû.

Li diyarê Girê Seyranê Şerîf careke din sekinî û li bajêr nihêrî. Papûra şil û ronî, wek şerîtekê di nav qîşleyê re ber bi Deriyê Çiyê ve diçû, projektora balafirgeha eskerî rojavayê ezmên bi şewqên xwe yên kesk û sor dimalişt.

Şerîf ji xwe re got; “Ez ê rojekê mala xwe binim bajêr.” bi qerar, û berê hespê xwe ber bi gund ve zivirand.

Bayekî sar dihat. Baran jî dixunivî. Şerîf çefiya xwe tund li dora stûyê xwe pêça û kişand ser poz û guhên xwe û hespê xwe lezand.

Pir neçû dengêkî ji aliyê balafirgehê ve hat guhên wî. Rûyê xwe bada. Du niqteyên ronahiyê dibirisîn û ber bi wî ve dilezandin. Du balafirên şerî bûn û nizm difiriyan. Di demeke kurt de gihan texma wî û di ser wî re herikîn. Hespê Şerîf tirsîya, rabû pêdarê. Şerîf li ser piştê ket erdê. Bi ketina wî re çavên wî bi du lûleyên ku agir vedireşandin ket; her du balafir di kêliyê de di ser Dicleyê re semitîn, di nav ewrên tarî de wenda bûn.

Bi şev heta sibê xew neketibû çavên wî. Her ku serê xwe dida ser balgîfê pirsgrêkên aborî û malbatî mîna cewrikên

Tasek ava serêkaniyan

Selahattîn ÇAM

Mîran rojeke kanûnê ya pir sar û seqem, ji gundê xwe koç kiribû û hatibû vir, berf li erdê bû, mal û hal hiştibûn û ji gund derketibûn

seyan pencûrikan lê bikin, nedihîştin xew bikeve çavên wî. Xew lê herimibû. Radibû; pencere vedikir ku hewayeke paqij bigire û hinekî bîna xwe berde. Lê ba û hewaye paqij jî asûde nedidayê. Heta berbanga sibê, wer bêxew şev bi dawî anî.

Êdî şefeq bû. Dengê melê bi ser taxê ve berz dibû. Fikirî û di ber xwe de got: "Li welat: Berî azana sibê dengê dîkan bi ser gund de belav dibû; lê li vir dîk nîn in; orîna ga û çêlekan, behîna mih û bizinan, ewtîna seyan jî nîn e. "Di pencereyê re serê xwe derxist û li rojhilat mêzand: Li jorê asoyê rengê xweliyê di bin de jî aso bi rengê xwe yê sor derya hembêz kiribû. Hat hişê wî ku li gundê wî rojeke pir xweş dest pê kiriye. Û xerqî xeyalan bû. Di ser Çiyayê Hezan re roj nola tepsîyeke zêrîn derket û bi hewa ket. Tîrojên rojê pelên darên maziye şîn bi rengê zer û sor dixemiland. Keriyên pezê Malên Jorîn ber bi Baniya Pehnik ve diherikîn. Her du dûmen têkilî hev bûn û di ber çavên wî re diçûn û dihatin.

Mîran rojeke kanûnê ya pir sar û seqem, ji gundê xwe koç kiribû û hatibû vir. Bêf li erdê bû. Mal û hal hiştibûn û ji gund derketibûn. Nikaribûn heywanên malê bi xwe re binin; ew li vir hiştin; xwestin se û pisîka malê bi xwe re binin. Her çendî ku se û pisîk anîbûn ber qamyonê jî, miawên qebûl nekiribû ku se bikeve kamyonê. Ew û bar di ماشینê de bi cih bûbûn; lê se mabû li jêr. Dema ku ew bi rê ketin; seyî li pey wan zûriya. Zûrîna wî erd û ezman tije kiribû. Zûrîna seyî têkilî dengê ambûlansê dibû û di guhê wî de olan dida. Van bibîriyan: Xizanî, bêkesî û xerîbiya wî jî kiribû bîra wî. Van derd û kulan wek marekî heft serî ku xwe li qirika

wî bialîne, ew tengav dikirin. Giriya û rondikên wî di ser dêmên wî yên bi qermonç re hatin xwarê, xwe bi xwe got: "Baş e ku van hêstiran, ji çavên min diherikin; nexwe wê ev jar bi ser dilê min de biniquitiya û wê ez perîşan bikirima."

Di nav van aşopan de li roja ku hê nû derketibû mêze kir. Rojê di nav zeryayê de serê xwe derxist. Rojê ewil nola nîvhîveke devdasok xwiya dikir. Paşê jî bû mîna sêleke ji agir sor û gilover bi ser behrê ve bilind bû. Li roja xweşik û bedew nihêrî û diayên xwe yên sibê kir; ji Yezdan xwest ku kar û debara wî ber bi başiyê ve bimeşe. Ji pencereyê li kolana ku tîrojên rojê bi rengê xwe yê zer xemilandibû temaşe kir. Sofî Zeydo di kolanê de xwe xûz kiribû û ber bi kulûbeyaya nanê erzan ve dimeşîya. Wî jî rabû xwe hazir kir û berê xwe da kulûbeyaya nanê erzan. Ji dûr ve li mirovên ku ketibûn rêzê temaşe kir. Mirov mîna tîzbiyên ku Dîno ji diranên rovî çekiribû bûn. Wisa bi rêk û pêk bûn. Ew jî bi lez ket rêzê. Di nav wî û Sofî de şeş kes hebûn. Ji dûrî ve silav da Sofî û siba wî bi xêr kir. Gote Sofî: "Xweziya em nêzî hev bûna; me yê ji xwe re sohbet bikira heta ku dor bihata me." Ên ku di navbera wan de bûn, dil kirin ku Mîran bê rex Sofî Zeydo bikeve dorê. Spasiya xwe ji wan re pêşkêş kir û hat cem Sofîyê cîranê xwe yê welat. Bi dilxweşî hev hembêz kirin û dest bi laqirdiyan kirin. Sohbeta wan wergeriya ser demên borî yê gundê wan: Tenûrên gund, mêrg û kaniyên gund, rez û baxên gund mîna sîdeyekê di ber çavên wan re diçûn û dihatin.

Mîran:

- Kekê Sofî xwezî em niha li gund, li ber tenûra gund bûna. Û tenê nanek; nanê ku

hêj nû ji tenûrê derketibû; nanê germ û me li hev par bikira.

Sofi:

- Belê! Belê! Çiqas xweş bû, ew nan. Tama wî nanî û bîna wî li vir qet nîn e.

Miran:

- Nanek ji nanê tenûrê û kevçiyek rûnê malê, ji rûnê pez me hevrişk çêkira û bixwara.

Sofi Zeydo:

- Belê, belê! Hevrişka gund û bila tasek avdew jî li ber bûya.

Piştî vê diyalogê dor hat wan; nanê xwe girtin û dan dû hev û berê xwe dan malê. Mîran bi ketina hundir ve deng li bûka xwe kir:

- Keça min a delal! Min bêriya mehîrê kiriye. Te karibûya ji me re mehîreke bi kundir çêkira. Bûka wî Dilnêrmê:

- Mamo ez ê ji te re mehîreke xweşik a wek gund çêkim; ez ê bi kundiran bixemilînim. Lê mixabin li vir kereng nîn in.

- De bila hema bê kereng be keça min; tama kundiran jî wek kerengan e. Got û bi lez û bez ji derî derket. Gere îro biçûya heqê avê bida. Lewra îro roja taliyê bû. Ket dawiya dorê û ma li benda dora xwe. Ji pêşiyê heta nîvê rêzê sî ketibû ser. Ew li ber tavê bû; tava havînê ew disincirand. Xwezî û bijiya xwe bi yên di siyê de anî. Ji xwe re got: "Hindik ma ku ez jî bigihêm siyê." Kelekela navrojê ew di nav xwêdanê de hiştibû. Ji tîna dev û lêvên wî ziwa bûbûn. Serêkaniyan bi bîr anî: Vê navarojê, di vê kekelê de, kanîsarka ku ji nav kevir diherikî di mêjiyê wî de çû û hat. Bi pilepil di ber xwe de got: "Xwezî tasek ji wê ava zelal û cemidî li vir bûya." Bi zimanê xwe lêvên xwe şil kir û xerqî xeyalên ava Serêkaniyan bû. Çavên xwe girt û daqûrê kanîsarkê bû. Wer mitrî aşopan bûbû ku hay ji xwe nemabû. Bi dengê keçika weznadar veciniqî û bi ser hişê xwe ve hat.

- Apo, apo! Tu di xew de yî? Bide

fatûreyaya xwe bide.

- Keçika min a delal! Belê belê te ez derxistim ji nav xeyalan. Te nehişt ku ez tîr û tijî ava Serêkaniyan vexwim.

Miran heqê avê da û ber bi rawestgeha otobêza belediyeyê ve meşiya. Germa havînê asfalt diheland. Ji germê mêjiyê wî li hev diket û çavên wî bi reş ve dihat. Havîna çend sal berê hat bîra wî: Dîsa mîna niha di kekelê navarojê de li bajarê xwe digeriya; hat li ber Mizgefta Qerşûnî sekinî û li minara mizgeftê mêzand; qerşûnê minarê diheliya û bi erdê ve diniquitî. Hizirî ku germa bajarê wî ji vê germê zêdetir bû. Lê ew germ ne mîna ya vir bi hêm bû; mirov ev qas nedifetisand û bi pilepil got: "Germ û nêma vir nola dimisê rezê Sîpanan bi laşê mirov ve dizeliqe. "Bi van hest û ramanan, di ber mizgefta Minareya Qut re derbas dibû; dît ku otobozek nola Çiyayê Nemrûdê bi ser de tê. Veciniqî û li xwe varqilî ku ne li bajarê xwe ye û çiya bi ser de tê. Xwest ku xwe ji pêşiya otobosê bide alî. Lê êdî rîya revê nemabû.

Sibetira rojê dema ku çavên xwe vekir; xwe di nexweşxaneyê bajêr de û li ser nivînan dirêj kirî dît. Serom di milê wî de bû û hemşîreyeke ciwan jê re digot:

- Mamo! Xwe neleqîne, wê serom ji milê te derkeve. Wî gotê:

- Keça min, çi bi min bûye? Çima ez li vir im? Perestarê:

- Ma qey tu nizanî ku tu birîndar î?

Miran têgihîşt ku birîndar e. Û birînen wî jan dan. Êş û azarên birînan dîl û mêjiyê wî dîl digirtin. Êşêke pir xedar tevahiya laşê wî dabû ber xwe. Di nav vê êş û elemê de hew dît ku derî vebû û bûka wî Dilnêrmê ket hundir. Bi çavên xwe yên bi rondik giriya û qîriya:

- Çi bi serê te de hat? Çi li te qewimî? Agir bi mala min ket! Mala min wêran bû!

Miran:

- Keça min megirî, megirî! Dilê xwe fireh bike. Tiştê ku li pêşiya me be em ê bibînin.

Û ew jî teng bû; hêsrên wê wek barana nîsanê bi lez dihatin xwarê. Dilnêrmê:

- Bavo min ji te re mehîr jî anî. Mîran:

- Keça min, te qenc kiriye. Min pir bêriya mehîrê kiriye; lê nîzanim ku ez ê karibim bixwim. Nexweşnêr di derî re ket hundir; çavên wê bi mehîrê ket; got: "Apo tu dikarî tenê dewê wê bixwî, dan na." Li ser gotin û fermandayîna perestarê bûka wî sê kevçî dewê mehîrê da devê wî. Xalê Mîran tika ji hemşîreyê kir ku cihê wî bibin aliyê pencereyê. Ew xwesteka wî hat pejirandin û ciyê wî anîn ber paceyê.

Bûka wî xatir jê xwestibû û çûbû. Ew bi tena serê xwe mabû. Ew çar dîwarên spî û sar. Dîwar jê re bûbûn cawên kefenê wî. Di nav vê kovan û xemgîniyê de gundê xwe bi bîr anî.

Li gundê wî dema ku yek nexweş bûya, gundî tev diçûn serdana wî; dema yek di nexweşxaneyê de bûya dîsa gundî giş diçûn ziyaretiya wî. Lê li vir ! Li vî bajarê biyan ew tenê bû. Bêkes û bêhêvî bû.

Ji pencereyê ve li derve temaşe kir. Di nav zeryayê de keştiyeke reş xuya dikir; keştiyê xwe sipartibû ewrê reş; qaqlîbaz ber bi gemiyê ve diçûn. Ji ser tableya firoşkarê gerok dengê teyîbê bilind dibû. Awaza Mihemed Şêxo û *Ay lê gulê* ew bir gundê wî.

"Ay lê gulê gula min ê!

Şêrina ber dilê min ê

Ez li ser gulê tîm kuştinê

Şêrina ber dilê min ê şêrina

Şêrina ber dilê min şêrina ber dil, ber dil. Stran di guh û mejiyê wî de olan dide û di xumam de li keştiyê û li qaqlîbazan zîq mêze kir. Û bi dilekî kovan û bi mêjiyekî tevlihev ji xwe ve çû...

13 sibat 2000

Ji bo bîranîna nemir Seyîd Riza

Destên wî lawaz, tiliyên wî ew çend qi-

Çavekî min girtî û deriyekî vekirî

Şivan AR

Dibînim

Pêşîra Stenbolê qelaştî ye

Keştiyên şûjin

û qeyikên derzî wê didirûn

Terzî ye Yezdanê bijîşkan

Qaqlîbaz ji dêvla bajêr diqîre

Wek dayîkekê

ji bo gedeyê xwe

bi pey keştiyê dikeve

Li pey keştiyê

Tayek spî

Dixuyê

Didirûn û dikin girêk

Dîsa didirûn

Stenbol diricife

Sawa mirinê pê girtiye

Pêl dide qemûşka bedenê

car car xwîn dipijiqe

hundirê wê/wî

dipengize car car

Birînên me xedar in Stenboloo!

Ez hestên xwe girêdidim

li dû bafirokan

Tu jî heviyên xwe girêdidî

li dû qaqlîbazan

15 pûşper 2007

Min çima celad daf da

Edîb POLAT

Biryar ji Enqereyê derketibû, dê berpîrs çi bikira? Li telê mirov diket ku celadekî çavkuskusî, reşê pîs û heram çawa bi çavên zexel, bi lîçika pozê xwe, bi wî halê xwe yê reben û belengaz dê hewl bida ku benikê xelekî yê îdamê li qirika min bişidîne

lêrî, reş û zirav bûn ku, min nedixwest ji-yana min bi destê mitribekî wiha bi dawî bibe. Bîzê mirov ji wî destê lerzok, wan damarên şîn û repisî diçû. Gava ez meşiyam ber dara sêpê, wî bi nêrîneke wilo tirsonek û zexel li min nihêrî ku ew mabû ji ber min bireve, lê cih nedît xwe tê de veşêre. Weke ku ew ne celad be û dê kêlikekê bi şûn de benê min nekişîne, ez dê ruhê wî bistînim.

Çawa ku dibêjin cêrê avê wê li riya kaniyê bişikê; helbet ger mirov fermandarê hêzên raperînekê be, hewldan têk here, yan kuştin li pêşiya mirov e, yan jî girtin. Berpîrsê taybet ê dewletê dema ji Enqereyê hat, rewşa Xarpêtê tevlihev bû. Wê rojê Serok-komar bo vekirina Pira Sîngeçê dê bihata Xarpêtê. Li herêmê qewmê me yê şalspî bi nav û deng bû, hemû jî alîkârên min bûn, ew dê biçûna pêşiya Serok-komar û ji wî tika bikirana bo min efû bike.

Ferman derketibû, roja yekşemê êvarê dê şeva min a dawîn bûya. Hikmê înfazê li nav qawîşê zû belav bûbû, min jî ev yek ji Findik Hafîz bihistibû.

Min bang kir, got ho Findiko!

Wî got keremke lo egîto!

Min got dawî mirin e, lê Rebî mirinek bi star!

Ew qîriya, got hawar! Hawar!

Min got celadê me kî ye?

Wî got mitribekî pir birçî ye?

Ez li ber mirina xwe nediketim, dibêjin kuştin riya mêran e, mirin emrê Xwedan e. Lê celadek rûkirêt, pîsekî mîrdar, dest-neşûştî û ziravkevroşk dê bibûya ruhsitênê min. Mirov ji Xwedayê xwe dixwaze jiyaneke paqij û mirineke ne bi destê qatlekî mendebûr.

Pîştî biryara îdama min, berpîrsê taybet ê dewletê ewil diçe cem dozgerê bajêr. Jê re dibêje beriya ku Serok-komar were Xarpêtê û şalspî lê bicivin, efûya Pîr bixwazîn, ango beriya duşemê divê îdam pêk were. Dozger dibêje roja şemiyê yan yekşemê ji ber ku rojên betlaneyê ne nikarin karê fermî pêk bînin. Êdî ferman ji Enqereyê derketibû, kesî nikaribû pêşî lê bigirta. Berpîrsê taybet dixwaze rayedarêkî bibîne da karibe ji bin vî barî derkeve. Nasekî wî cîgirê dozger bûye, hevalê hev yê zankoyê bûne, leqayî wî tê. Hevalê wî dibêje: Ji bo ez erkê bigirim, here ji dozger tika bike, bila ji bijîşk raporekê bistîne. Piştî ew biçe mala xwe, tu çi bixwazî bila wekî te be. Ez niha vê çirokê ji we re dibêjim, hûn çewt fêrî nekin, ez ne cîgirê dozger ne ji berpîrsê taybet sêrdar dikim, wan erka xwe bi cih dianî. Tiştê ku bi min zor dihat, mitribek li ber dara sêpê dê bi regekî xayîn, bi çavên zer li min binihêrta û dê bixwesta bi tiliyên xwe yên hişk û biringî werîsê îdamê têke qirika min. Û piştî weke pisîkeke şîrrijandî çav berda revê?

Dozger raporê distîne, cîgir dikeve dewsa wî. Berpîrsê taybet diçe mala dadger. Navmalî derî vedike, gava dikeve

hundir dibîne ku wa ye dadger bi deqti-loyê biryara îdamê dinivîse. Ew ji ber mêvan radibe, dibêje va ye biryarê dinivîsim, lê nikarim roja şemiyê heyeta dadgehê bicivînim, bila bîmîne roja duşemê. Berpirs dibêje: Ez dê pirsekê ji te bikim: Ev çend sal in tu dadger î, tu heta niha piştî saet pêncên êvarê jî qet nexebitiyî? Dadger dibêje lê çawa? Gelek caran em heta dereng, heta dehê şevê jî li daîreyê dimînin. Berpirs dibêje, mafir ku tu dikarî di dawîya rojê de pênc saetan zêde bixebitî, çima nikarî jî wî serî de, piştî paşîvan dadgehê bicivîni? Ango tu çima nikarî roja yekşemê piştî saet dozdehê şevê jî dadgehê biryarê derxî? Dadger dibêje, tu nizanî di wê saetê de elektrîk tete birîn.

Mizawiriyên berpirsê taybet xelas nabin, wiha lê vedigerîne:

Bi lampeyên tirimbêlan em dikarin hepisxaneyê ronî bikin!

Biryar ji Enqereyê derketibû, dê berpirs çi bikira? Li telê mirov diket ku celadek çavkuskusî, reşê pîs û heram çawa bi çavên zexel, bi liçika pozê xwe, bi wî halê xwe yê reben û belengaz dê hewl bida ku benikê xelekî yê îdamê li qirika min bişidîne... Saet di dozdehê şevê de hatin hepisxaneyê û çavên tirimbêlan dan pencereyên qawîşê. Em hemû bi vê ronahiyê werqilîn, girtiyên di xewa kûr de jî şiyar bûn. Heftê û du kes di rêzê de, li piya sekinîn. Findik Hafîz, di rêza serî de bû.

Min got ho Findiko!

Wî got bêje mêrxasê çavbeleko!

Min got ev roj çi roj e?

Wî got, dil ji kerba disoje!

Em hemû birin salonekê û li wir biryar li rûyê me xwendin: Ez û Findik jî di nav de, heft kesan cezayê îdamê xwar, ên mayîn an beraet kirin an jî cezayên zîndanê girtin. Biryara dadgehê gava bi tirkî hat xwendin, girtî jî nişka ve qêriyan, gotin: Îdam tune ye, îdam tune ye! Ev deng li hemû eywan û qawîşên zîndanê

belav bû. Lê piştî navên kesê ku îdam girtin hat xwendin. Gava girtiyan rastî hîn kirin, serê xwe danîn ser milên hev. Berpirsê taybet û midûrê polîsan bi milên min girtin û birin tirimbêlê, wê gavê min fam kir ku dikevim riya çûnehatê û menzîla min a dawîn meydana îdamê, cihê Bazirganiya Genim e. Şev bû, tarî bû, ba û bahozê rahiştibû qamçiyên xwe, guvegub ji ber guhên me dianî. Birûdeke sar poz û guhên me diarand. Ez li zarotiya xwe, li rojên xortaniyê, li qewimînên dawîn difikirim. Çiyayê Tûjik şahid bû, Çemê Mûnzûr çavdêriya me kiribû; jî bilî raperînê tu rê û rêçik ji me re nehiştibûn. Wijdanê min li hafa giyanê Duzgun Baba pak û aram bû. Li ser riya Meydana Bazirganiya Genim, li riya çûnehatê dar dihejiyan, pel diweşîyan, berpirsê taybet li min dinihêrî û min jî tenê li dil û nefesa xwe dihesand.

Gava em gihîştin Meydana Bazirganiya Genim, min ewil serê Findik ê xeliyayî û bejna wî ya hilawistî dît. Min got ho Findiko, zêr zane û zor zane... Berpirsê taybet bala xwe dayê ku ez di cama tirimbêlê de dinihêrim û dimirmirim, xwe ji min re kir talde. Min jê pirsî:

-Tu ji Enqereyê ji bona vê yekê hatî vir, ne wisa?

Zimanê wî negeriya, ne got herê, ne jî na, çavên me li hev eliqîn. Ji zerayîya madê wî û çavên wî yên revoke min fam kir ku çi li pêşîya min e. Belkî jî ew cara yekem bû ku bi yekî mîna min, bi meh-kûmekî îdamê re ew çend rû bi rû dima. Lewma ji heyecanê rûyê wî sor bû, bala wî qurifî, çavên wî şikestin û rûyê xwe li ba xist.

Ez bi halê wî keniyam.

Gava em ji tirimbêlê daketin, berpirsê taybet li xwesteka min a dawîn pirsî. Min ji berîka xwe çil lire dirav û saeta milê xwe derxist û got, ev ji kurê min re diyarî ne. Ew rêwîtiya min îbadetek bû bo gelê min. Bextê min û şeweyê wê mirinê karê herî pîroz bû.

Çiziyek sar, ba û bahoz her diçû bêtir diranên dirinde nîşan didan. Li meydana çivîkê nedigot qîq, pelên daran jî nedilibitîn, her tişt di bédengiyeke tengijî de bû. Ez êdî extiyar bûm, sermayê zor dida min, lê ji bo nericifim min diran dişidandin, bila berpirsan negota ji tîrsa dilerize. Heta nefesa dawîn, ez divê serbilind bûma.

Bi baweriyeke kûr...

Bi gavên hûr...

Bi awirên zûr...

Ez ber bi dara sêpê ve meşiyam. Ew mitribê çil salî ku bejna wî kin û lawaz bû, li ber dara sêpê li aliyê rastê sekinîbû û ji tîrsa dev û diranên wî li hev diketin. Beriya ew ben têxe qirika min, min ew daf da. Hûn dê bêjin çima?

Dema min li Meydana Bazirganiya Genim nihêrî, elaletê di xeyala min de vejiya û meydan tijî kir. Her kesî li min nihêrî, li benda peyvên min bûn. Ji nava rî û simbêlên xwe yên dirêj min got:

- Em ewladê Kərbela ne...

Celad kenîya.

Min dengê xwe bêtir bilind kir got:

- Em bê guneh in...

Celad madê xwe tirş kir, eniya xwe qermiçand, weke bêje kî bawer dike.

Min got:

- Eyb e...

Celadê çavxêl dest kir bin çengan û li

dora xwe nihêrî. Weke ku nedixwest kesek wî bibîne.

Min got:

- Zilm e!

Wî li berpirsan û rayedaran nihêrî...


Peyva min a dawîn bêtir ew ricifand, min got:

- Cinayet e!

Bi wê lerizînê, pêçiya xwe kir guhê xwe, piştê bi pozê xwe leyist. Weke ku bêje ne te got, ne min bihîst, xema min e? Li guhekî min dikeve, di yê din re dertê!

Ji wê elaletê re hêdî hêdî peyivîm û min di bin çavan de li celadê xwe nihêrî. Wê gavê bi tinazî wî pozê xwe li ba xist, eniya xwe ya tijî xêziken cahiliyê qermiçand û bi xof fêrî min bû. Weke ku bibêje, tu çi dikî û çi dibêji bêje, êdî bêfeyde ye. Tu çima qirika xwe di kêrê didî? Ne kesek li meydana heye, ne jî ez li te guhdarî dikim! Bi rastî jî, dema peyvên min xelas bûn, ew girseya gel ji ber çav winda bû. Ji bilî celadê min yê tinazkar kesek nema. Min lê nihêrî, wî jî li min. Xulqê min teng bû, ji bejna wî ya ku dilerizî, ji rehekên şîn ên li ser piştê destên wî, ji nêrîna wî ya diziyok û fediyok bîzê min çû. Dilê min li hev ket. Lewma min ew daf da, ji xwe dûr xist, werisê bi xelek xist sitûyê xwe, riyê xwe ya dirêj bi ser ve berda û piyê xwe li kursî da.

Bêrî rondikên ji




Hemû Demsal Payîz in

Behlûl ZELAL

Çîrok

Weşanên BELKÎ



agir dibarînin

Dîlan AYDIN

Dizanim ez, niha tu li Serhedê yî!
Li wê erdnîgariya kesk û sar...
Li wê bedewiya ku mirov dibe evîndar...

Niha li warê te bihar e!
Kulîlk vebûne...
Çivîk dixwînin...
Av diherike
Ji gelî û çiyayan...
 Kanî û mesîlan...

Ku tu biharê hatibûyayî jiyanê...
Tu yê ew qas zû neçûyayî...
Û ew ê bihar xemgîn nebûya
Bi çûyîna te ya bênav û nîşan...

Ku jiyan weka biharê bûya
Û her tişt wek kulîlkên wê xweş û paqij bûna
Tu yê wiha 'winda'nebûyayî...

Ku em şiyar bûna û em li pey şopa te bûna...
Me yê bikaribûya
Xwe bigihanda te!

Ev bi salan e tu dûr î!
Winda yî,
 Nediyar î!...
Di windabûna te de...
Her tişt winda dibe!
Kêfxweşî cihê xwe
Ji xemgîniyê re dihêle...
Şev û roj
Ji ber tunebûna te bêdeng in!
Navê te yê şêrîn nayê gotin
Navê Dicle qedexe ye!
Bi xemgînî tê gotin...

Bizanibe!
Her berbang bêhna te tîne...
Her rêwîti ber bi te ve tê
Û niha bêrî rondikên ji agir dibarînin ji bo te...

Ax lawo!

Behlûl ZELAL

Cotek sihor, li ser şaxên dara çamê didan pey hev, qîjeqîja wan,
bala kesên li bin daran dikişand ser xwe, çi xweşik bi hev şad dibûn

Esra teng bû. Germa nivroyê şikestibû. Bayekî sivik ji aliyê behrê, ber bi bejahiyê ve dilivîya. Lotkeyên masîvanan ji qiraxa behrê, hêdî hêdî ber bi nava behrê ve diçûn. Diviyabû berî ku bibe tarî, torên xwe bi cî bikin û vegezin malên xwe. Hin ji wan bi şevê li nav behrê diman, geh bi tora ku di nav avê de vedikirin û geh bi lîtan, masiyên ku di tariya şevê de derdiketin nêçîrê ji xwe re nêçîr dikirin û hinan ji wan jî torên xwe mîna xefikan di nivê behrê de vedidan û vedigeriyan malên xwe.

Xort û xama, di nav behrê de, peşkên avê bi ser hev de dibarandin. Jinên navsere, li qiraxên behrê, li ber tîrêjên rojê yên dawiyê xwe pan kiribûn. Nedixwestin roj biçe ava û geh li ser piştê, geh bi ser zikê ve xwe gêr dikirin. Hinan pirtûk dixwend, hinan di nav ewrê dûyê ku ji çixareyên wan derdiket li dûrahiyên behrê dinihêrin.

Cotek sihor, li ser şaxên dara çamê didan pey hev. Qîjeqîja wan, bala kesên li bin daran dikişand ser xwe. Çi xweşik bi hev şad dibûn. Mirovekî rihbizin, biaramî pirtûka di dest xwe de dixwend, ji dûyê çixareya ku bi ser serê wî de belav dibû rûyê wî xweş xuya nedikir.

Refek qaqlîbaz, hemû bi hev re li ser ava bipêl ku mîna meşkê diçû wî aliyê û wî aliyê vedinişin. Bilez in. Bi yek carê serê xwe binav dikin. Li pey pariyên xwe yên dawîya rojê ne, berî ku roj biçe ava, pariyekî din bavêjin aşka xwe.

Komek zarok li qiraxê, li cihê ku av bi ser zikê wan nediket di nav lîstikên bêrêbaz de qîreqîra wan bû. Dileyîstin an

şer dikirin ne diyar bû. Behr bi lîstika zarokan xweş dibû yan lîstika zarokan bi ava behrê xweş dibû nedihat têgihîştin.

Behr, nola dergûşa di destê dayikê de, diçû wî aliyê û wî aliyê. Bayê hênîk, ji nav pêlên behrê ber bi bejahiyê ve dihat. Mirovan di nav aramiyeke xweş de kêliyên xwe dibûrandin. Xweza bi her aliyê xwe ve dikeniya. Nola keçikeye xama, balkêş, xwîngerm û awirxweş bû.

Li ser rêya raserî behrê, xaniyekî yektebeqî, di nav darên çamê û fêkiyên cur be cur de, nola ku ji xaniyên gund xeyîdiye, bi tena serê xwe li qiraxê gund, di vî ewara havînî de, weke her roja ji rêzê, pîrejî û kalekî ligel sê çêlekên zayî û çend mirîşkên ku her roja Xwedê her yek ji wan hêkekê dikin, dihawandin. Ne bayê hênîk ê ku ji nav behrê dihat digihîşt wan û ne jî bayê kêf û şahiya mirovên li nav avê û yên li qiraxên avê digihîşt wan.

Kalemêr, pêşiyê devê kozika mirîşkan dara. Piştî ku rovî ketibû kozika mirîşkên wî deriyê xwe li ba xeratê gund nû kiribû. Niha jî dora çêlekan bû. Lê hîna pîrejîna wî, çêlek nedotibûn. Piştî dotina wan, diviyabû em û ava wan bide û piştê jî deriyê koxê weke her carê dare. Berê xwe da nav baxçeyê li kêleka xênî; hîna pîrejîna wî di nav baxçeyê de bû. Piştewandî, ji nav pinên firingî û îsotan giya jê dikir. Ji bo ku giya nede ser pinên zerzewatan diviyabû serê çend rojan carekê bihata jêkirin. Giya, ji bo çêlekan jî êmekî xweş bû. Dixwest biçe alikariya hevsera xwe lê ew jî pir westiyabû. Dilê wî bijiya çixareyekê. Destê xwe hêdika avêt berîka xwe, hesteyê xwe jê derxist. Du

lemên li ser hev ji çixareya xwe kişandin. Ku pîrejina xwe di nav kar û barê malê de didît, kurê wî dihat bîra wî; xemgîn dibû. Ew jî, hevsera wî jî kal bûbûn. Êdî ew ne yê kar bûn. Wan tu carî rewşeke wisan ji jiyanê nepabû. Erê keç dizewicîn û ber bi hêlîna xwe ya nû ve difiriyan. Lê ma kurê wan ê ku bi hêviyên mezin xwedî kiribûn, anîbûn vê rojê?

Ji heft saliya wî ve, dest bi amedekarî û raxistina malê ji bo wî kiribûn. Dema ew bûbû xort, xaniyekî nû jê re çêkiribûn. Bi diravên ku bi dest xistibûn, zewiyên xwe zêde kiribûn. Wan nedixwest tiştek ji kurê wan kêmbê. Berî ku kurik ji leşkeriyê vegere, keçeke xama li kîjan gundî hebûya bi rêya nas û dostên xwe lê geriyabûn. Piştî ku kurê wan ji leşkeriya welêt bihata, wan dixwest rojekê berî roja din daweta xwe bikin. Berî ku çavê xwe bigirin, wan dixwest neviyên xwe hembêz bikin, bi wan şa bibin. Kebaniyeke ciwan were malê. Zerikek şorbeya germ were ber wan, bêmînet û bi rihetî rojên xwe yên mayî bi dilekî xweş derbas bikin. Û ne tiştekî din....

Rojê, gavên xwe sivik kiribûn. Roj diçû, tariyê şûna roniya rojê werdigirt. Tirimbêleke spî, hat li ber baxçeyê ku hîna jî pîrejina malê di nav de bû rawestiya. Ajoker û xanima ku xuya bû hevsera wî ye, ji tirimbêlê peya bûn. Hatîn li cem pîrejina nav baxçe:

“Qewet be ji te re xaltî!”

Xaltiyê, hêdîka serê xwe rakir, piştî xwe ya xûzbûyî bi qasî ku jê dihat rast kir. Û got:

“Hûn bi xêr hatin lawo.”

Jin û mêrê ku li êvara hanê li xaltiya pîrejî û mêrê wê yê kal bûbûn mêvan, ji bajarên dûr hatibûn. Bêriya firingiyên gundên baxçeyan kiribûn. Çawa çavên wan li pîrê û baxçeyê wê ketibûn tavilê rawestiyabûn. Piştî qederekê ku li ser jiyana gund axivîbûn, jinika mêvan ji pîrejina xwediya baxçe pirsîbû:

“Xaltî, tu êdî pîr bûyî. Ji îro û pê ve divê tu xwe newestînî. Ma qet zarokên te, neviyên te nîn in?”

Pîrejina ji çînîna giya û ji wê bêhtir ji jiyanê westiyayî, hêdîka li ser qiraxa mîşara firingiyan rûnişt. Ji cihê xwe ve, giyayê ku destê wê digihayê diçînî. Di ber re, dest bi vegotina kul û keserên di dilê xwe de kir, nola ku li hêviya vê kêliyê be.

“Ax lawo! Çawa nîn in. Belê wele zarokên min hene. Sê keç û kurekî min hene. Her sê keçên min bimêr in. Malên wan ji me dûr in. Salê carekê yan du caran tîn cem me.”

“Lê kurê te li ku ye? Ma ew qet alîkariya we nake?”

“Ax lawo! Qet mepirse. Kurê me çûbû leşkeriyê. Leşkeriya xwe li navçeyêke Diyarbekirê kir. Navê wê navçeya xopan Dicle ye çî ye, ha leşkeriya xwe li wê derê qedand.”

“Ê, piştî, xaltî Xwedê neke...”

“Na, na şikir ji Xwedê re bi silameti vegeriya malê. Lê ... lê...”

“Qey kurê te birîndar bû xaltî, deverine wî seqet bûn?”

“Ma lawo ez çî ji we re bibêjim û çî nebêjim. Tu dera wî jî seqet nebû. Lê ne roja me roj e û ne jî şeva me şev e. Piştî ku ji leşkeriyê vegeriya, kêliyeke me bi xweşî derbas nebû. Dike û nake xew bi çavên wî nakeve. Ku kêliyêke çavên wî biçine ser hev jî, ji nişka ve ji xew şiyar dibe û diqîre. Dev û lêvên wî di nav kefê de dimînin. Laşê wî ji xwêdanê dibe av, tu dibêji qey tevî cilan ketiye behrê. Ji hundir direve, xwe dide bara dar û latan. Xwe dixê koş û kozikan. Bi her du destan çavê xwe digire û diqîre û hey diqîre. Laşê wî dilerize, piştî zimanê wî tê girtin. Heta ku em wî zêft dikin û ji nû ve tê ser hişê xwe, canê me di pozê me re derdikeve. Ne gezek nanî bi dilê xwe dixwe û ne bi kesî re peyveke xweş dike. Jixwe pir caran nayê malê jî. Carna heyvekê çavê me lê nakeve. Bi ku ve diçe,

çi dike, li ku radikeve, çi dixwe, çi vedixwe; em nizanin. Xwezî ew ji wî halî derketa, baş bibûya, bila tu kar ji me re nekira.”

Jinika mêvan derfeta axaftinê bi dest xistibû lê wê nizanibû ji ku dest pê bike û çi bibêje ji vê pîreka mîna xwe dibikul re. Di bin çavan re, awirek li hevserê xwe da. Nola ku dixwest, bandora rewş û vegotinên pîrejinê li ser hevserê xwe bipîve. Her çiqas dixwest dilê wê pîrejina belengaz xweş bike jî, kul û keser ji dilê wê jî difûriyan.

“Ez te baş fêm dikim. Qet nebe tu kurê xwe dibînî, tu dengê wî dibihîzî. Lê ma yê me? Hîna nû simbêlên wî didane der. Berî bi çar mehan, me dezgîrana wî kiribû. Em ji bejn û bala wî têr nebûn. Em bi ciwaniya wî şa nebûn. Ew bi destgiriya xwe, destgirtiya wî pê û her du jî bi ciwaniya xwe şa nebûn. Agir bi dilê me, tofan bi mala me ket. Xwezî kurê me jî mîna yê te bi saxî li me vegehiya, bila seqet bûya, bila har û dîn bûya. Tenê her roj min ew bejna zirav bi van çavên xwe bidîta... Na na, bila min bizanibûya li ser rûyê wê dinyayê sax e, bila serê salê carekê, serê deh salan carekê min rûyê wî bidîta, dîsa bes bû ji min re.”

“Ax lawo kezeba min şewitî ye, ya te ji ya min bêhtir. Ax lawo, ax lawo! Ez bi qurbana lawan im lawo...”

Dayika pîrejin û dayika navsere, bi çar destan hev û dîn hembêz kirin. Zêmar, hêstir, kul û keserên di dil de tevî hev bûbûn. Diherikîn di nav tariya ku bi yek carê hawirdor wergirtibû de.

Avrêl 2009-Amed

Hejîr

Feratê DENGIZÎ

Mar ji hejirê hez dike
Ez jî ji te
Hejîr jî ji kavilan
Ji xerabeyan ji wêraneyan
Û her derê jî kaviil dike
Dilê min kaviil

Hejîr
Qeweta benîrihman
Hêla piştî mirovan
Erê
Tenê tu di ser vê pîrê re bihuriyî
Yekaneya hebûnê
Hêrs û xweşî û hebûna şabûn û hebûnê
Dilgermiya mirovî
Qilawiz e mar û star e hejîr
Stara qaşo benîadem
Aqilê gerdûnî

Hê jî
Beropaş e jiyan
Lê Keya tazî
Tune ye aqilê berazî
Aqilê berazî / birazî ye afîrdar î di serê zarokî
Di serê mirovî

Lê îro kevirê havînê ye aqil
“Kevirê havînê bavêj kadînê”
Dadgeha zilmê ye jiyan
Zilma bêdadî

Lê hebûn e
Şabûn e
Star e
Star e
Hejîr
Star

Ya STAR!

17 Nîsan 2009
Amed

Du kurteçîrok

Memê ŞIVAN

DAMLA

Rêyeke qut, rêyeke dûr, hêviyeke qut, hêviyeke kûr, hêcaneke mezin û hêcaneke pir germ di dilê zarok de hebû.

Zarok hêdî hêdî hatibû ber deriyê mektebê. Mamoste derî vedikir û bi destên wî digirt û dibir ser maseyekê.

Mamoste dest bi axaftina xwe dikir. Lê axaftina wî fêm nedikir. Lê zarok pir guhê xwe dida mamoste.

Carekê mamoste qiseyeke li gora wî pir xweş digot.

Digot:

“Damla”

Ev peyv li gora wî pir xweş dihat.

Zarok diket nav xeyalên kûr. Li der û dora wî gulên bi hemû rengan, nepoxên bi hemû rengan hebûn.

Zarok li ber çemekê di nav giyayên şîn de xwe dirêj dikir. Ji ezman çikolatayên ji hemû rengan dibariyan. Devê xwe vedikir û ew çikolata; yek bi yek diketin nav valahiya her du lêvên wî.

Zarok li ber dengên pez, berx, ker, se, dîk, mirîşk xwe dirêj dikir û li filmên karton dinihêrî. Di dilê xwe de digot:

“Ev ‘damla’ çi tişteki xweş e”

“Çi tişteki xweş e”

“Çi tişteki xweş e”

Hêdîka dengê dihat guhê wî;

“Gêjo ‘damla’ dilop e”

“ ‘damla’ dilop e, dilop e, dilop e...”

Çavên xwe vedikir, ji asraqê sinifê ‘damlayek’ diket ser deftera wî.

Wê gavê mamoste şil dibe, hevalên wî şil dibin, xeyalên wî şil û pil dibin.

25.12.2008

KÊLIK

Ez pir westiyabûm. Min çavên xwe vedikir û li der û dora xwe mêze kir. Ez li ser çiyayekî me. Li aliyê bakur zilamek li ser piyan sekinîbû. Li aliyê başûr dîsa zilamek li ser piyan sekinîbû. Li aliyê rojhilat zilamekî dî li ser piyan sekinîbû. Di nîfinga her sê zilaman de yekî xwelîser, li ser hestiyê piştê xwe raketibû. Zilamê aliyê başûr digot:

“Em ê sînor deynin vê derê. Bila nîv ji me re nîv ji we re be”.

Ew zilamê li aliyê bakur digot:

“Ez jî qebûl dikim. Bila kêlika sînor ev der be. Carekê ev xwelîser rabe, bila bîmîne di nav befir û bayê de. Bila bi cilên xwe ve, bi zimanê xwe ve bifetise.

Kesê li aliyê rojhilat jî digot:

“Ez jî qebûl dikim. Bila kêlika sînor ev der be.”

Xeweke giran bi min girtibû. Min dîsa çavên xwe hêdî hêdî vedikir. Li der û dora min tu kes nemabû. Lê tenê ew xwelîserê li ser hestiyê piştê xwe nivistî hebû.

Ez rabûm çûm nik kêlika sînor. Min derpiyê xwe anî xwarê û min fişî mîst bi kêlika sînor de. Kêlika sînor şil û pil bû. Pêla mîza min, ew xwelîser jî şil û pil kiribû.

Wî xwelîserî rabû berê xwe da der û dora xwe. Li Çiyayê Cudî, Kela Memê, jî aliyê Zagrosê ve dengê dilanan dihat. Kulîkên biharê şîn bûbûn.

Xwelîser, berê xwe ber bi min ve dikir û kenê xwe bi min dikir. Ez jî dikeniyam. Lê kenê min li singê çiyayan diket û li min dizivirî. Ez bê ruh diketim nav hêviyên hezar salan.

31.02.2009

Dendikên zebeşên tehl

Îrfan AMÎDA

Tê bê qey tariyê giraniya xwe ne bera ser şevê lê bera ser milên wê dida, werê xûz û xwîzî di ber de mabû, bi xavika ku werê êretî avêtibû ser serê xwe devê xwe girt û li ber dêrî rûnişt

Zebeşê tehl bidênê law şebeşê tehl. Ger nava wê diêşe... Wê nava wê paqij bike.

Guliyê hûçikê xwe li tiliyên xwe yên qermiçî digerand, pîrejina ku ne li ser bala tu kesî bû. Di ber xwe de diponijî. Awirên xwe vedidizî ji xwe jî. Jixwe di vê şeva gebsoyî û mişt metirsî de her kesî xwe ji bala yên din vedidizî.

Tirseke ku bi hevîrê fediye hatibû stirîn, bi awirên Sêlim, xwe bi xwêdanê re ji çavên Gulê dida der. Tê bê qey tariyê giraniya xwe ne bera ser şevê lê bera ser milên wê dida, werê xûz û xwîzî di ber de mabû. Bi xavika ku werê êretî avêtibû ser serê xwe devê xwe girt û li ber dêrî rûnişt. Guhikê xavika ku di devê xwe de dicût, sor bûbû.

Xezalê, keçika wê ya biçûk wekî pisîka ku xewa wê bê, bi kirasê Gulê girt û xwe spart wê. Lê Gulê ew ji xwe bi wê de dehf da. Sêlim, bavê wê, bi awirine dilxeliyayî û çavsorî lê nihêrî. Bi tirs û bi lez xwe avêt dawa pîrika xwe, Xezalê. Were berxika pîrika xwe were, got dema ew hişk di hembêza xwe de guvaşt. Her tişt bext e law, bext. Di nav mijankên xwe yên firk re li Sêlim nihêrî, dema di ber xwe de peyivî. Sêlim mîna gayê xemo... Sêlim bi qêrîneke girêklêketî awir li diya xwe veda û balifa li ber pala xwe ya ku hinekî şemitîbû, ber bi dîwêr ve hilkişand. Rûyê

wî mîna kevaleke kalane difiridî.

Zîqînî ji beştên xênî hat, bi şopa li ser xênî. Ava reş ji çavên Gulê rijîya û xwe bera nav tariya şevê da.

Eyşanê li ku ye berxika pîrika xwe? Got ji Xezala ku çermê wê yî pûçbûyî, di nav tiliyên xwe de diesirand. Lê Xezala ku hê ji îskeşkên xwe betal nekiribûn di xew re çûbû.

Brahîm nivê şevê qemyon anî ber dêrî û mal bar kir. Diya wî, kelogirî, li ber geriya. Tu yê bi komê zarokên hûr bi ku de herî kurê min? Li xerîb û xurbetê çi bikî? Brahîm bi biryariyeke qewîn û neçariyeke fedîkar li diya xwe vegeriya û got. Ku çavên mirov li destê xelkê be dê çavên wan jî li doxîna mirov be dayê....

Zîqîniya beştên ser xênî sekinî. Berê Gulê bi giriyeke bédeng rabû û ji odê derket. Piştî wê Selîm rabû ser xwe. Beriya ku Selîm derkeve diya wî bi dengêkî şikestî û bi liberger jê re got. Law ka em jî bar bikin û herin cem Brahîm. Ku çavên mirov li destê xelkê be dê çavên wan jî li doxîna mirov be...

Lê Selîm qet bala xwe neda diya xwe û ji odekê derket.

Şopa dendikên reş ên şebeşê tehl qirika Eyşanê ya zelal pêçabû.

Mişextiya çiçekên dil

Mehmûd BADILÎ

Van hevokên hanê tevan xwe li hiş û dilê Şiyar dinivîsandin, matmayî di gola xîmava wan de avjenî dikir, diket xeyalê û digot; “Kî ye ev mirovê biyan ê ku ev qas êş û kul û derd di dilê vê keça hestenik de çandiye?”

Berî ku razê, ber serê xwe xweş kir, lingek avêt ser lingê dî, pirtûkek xist destê xwe, bêdeng bi çavîn melûl dest bi xwendinê kir. Pirtûk di nav dest de di xew re diçû, li ser xirexira rûpelan veciniqî, çavên xwe vekir ku her tişt li derdora wî di xew re çûye, tenê çira elektirikê geşbûna ronahiya xwe li bêdengiya xaniyê wî yê sêwî dadiweşand. Di hundirê odeyê de hinekî hat û çû, gelek raman di serê wî de dilivîyan, hîzr û gumanên wî li hev diketin. Ew bi xwe mat mabû, êdî nema dizane bê çi dixwaze, çima xewa wî nayê, serê xwe di nav destên xwe de diguvaşt, tişteki nediyar di geliyên kûrbûna wî de li zirneya netebatiyê dide, nahêle ku razê.

Dîsa hat li ber pirtûkxaneyê xwe ya biçûk sekinî, navnîşan û navê daner û nivîseran li ber çavan rêz dibûn, wek yek nuh pirtûkên xwe bibîne, digel ku wî ew pirtûkên rêzkirî tev de xwendibûn, lê jibîrkirina navê daner yek ji nexweşiyên wî bûn.

Hat bîra wî ku berî çend rojan, romaneke ji pêşangeha ku li kongreya rewşenbîrî raxistibûn kirîbû, destê xwe dirêjî wê kir û ji nav koma pirtûkan kişand, li nav û wêneyê qabê meyzand (Mişextiya çiçekên dil – roman – Şahgula Seydoyê Mazî), di vê kêlikê bi xwe de, wêneya wê keça naz û bedew ya ku ew ji li pêşangehê bû hat ber çavên wî, gernijandina wê, pirtûkên di dest de, sekna wan li himber hev, meşa wê dema ji pêşangehê derket.

Şiyar ji xwe re got: “Divê ku têkiliyek di

navbera vê pirtûkê û wê keçê de hebe, ji ber wêneyê li ser qabê pir dişibe wê.”

Şiyar maseya xwe rast kir, çaydankê avê û qedeha Metê li ber xwe danî û dest bi xwendina wê pirtûkê kir; diyarî ji bo: “çira şeva ku bê”. Gelekî li ser derîzanka pêşî û dawî “Mişextiya çiçekên dil” û “Mîrina nediyar” rawestiya. Piştî xwendina pirtûkê temam kir dîsa li wan her du werzan vegeriya; hezkirin, bêrîkirin, dûrbûn, êş, kul, hejarî, bendewarî, sawîrên tirsê, siwarê mirinê, çira dinale, mirovê biyan, xanima wînda, hevdîtînen beravêtî, xewnên koçkirî, rojên bi xweliyê xemilandî ne, çiçekên mişext ji tîbûnê, deriyên dil ên li ser piştê vekirî, hezkirina sermedî û tirsê ji mirinê.

Van hevokên hanê tevan xwe li hiş û dilê Şiyar dinivîsandin, matmayî di gola xîmava wan de avjenî dikir, diket xeyalê û digot:

“Kî ye ev mirovê biyan ê ku ev qas êş û kul û derd di dilê vê keça hestenik de çandiye? Kî ye ev mirovê ku ev qas ev keçê lê digere, dilê xwe jê re vedike, bi kezebeke şewitî bang dikê û pê hest nabe! Ev çi mirov e, qey dilê wî kevir e, hesin e, kevir bûya ji ew ê li bêhna mişextiya wan çiçekan biziviriya.”

Şiyar li ser muzîka mobîl hay bû ku kat heştê sibehê ye, divê ku here dewamê, li dibistanê mamosteyekî ew pirtûk ji destan girt û got:

Off! Kîngê Şagulê bûye nivîskar yaoo!

Qey tu wê nas dikî?

Erê bavoo! Ma ne me li enstîtuyê bi hev re dixwend; ma tu wê nas nakî?

Na, ez bi xwe nizamim, bawer nakim ku em tu carî pêrgî hev bûne. Bes romana wê pir xweş e, ziman, bûyer, tevn û nave-rok...

De here loo! Ji ku dizane binivîse, me li enstîtuyê tinazên xwe bi helbestên wê fikir, bes keçek pir qure bû, heta tu bix-wazî bi xwe bawer bû haaa!

Belkî ne ew be hema tu wilo wê bi ne-zanîbûnê tometbar dikî, hela romanê bix-wîne. Dawiyê nêrîna xwe bibêje. Hûn çi dizanin yekî bi saxî bikujin, em kurmanç çi segvan in di kuştina hev de.

Aniha Şagulê ne ji bajarê Serêkaniyê ye? Yê mamoste wisa got.

Na, ne ji Serêkaniyê ye, ji Qamişlo ye, ji asîmanan e, hema ji ku derê be jî, ma ez ji ku dizanim li ku derê rûniştîye, tu dibêjî qey min navika wê bîriye.

Piştî van gotinan, Şiyar wek ku tiştêk wînda kiribe, nema tebatî dihatê, xwe li malê nema qîçûçî fikir. Kolanên bajêr bi tewşîya gavên xwe dipîva. Pirtûkxaneyek nehişt û pîrsa wê romanvanê ji wan nekir, lê mixabin kesekî dilê wî nedixist cih û rihet nedikir, hinekan digot ji Efrînê ye û hinekan digot ji Dêrikê ye, yan ji Hese-kê ye, yan ji Dirbêsiyê ye, ji Şamê ye û yekî got ew ji Kobanê ye lê niha li Alman-yayê rûdinê.

Vê bersivê, mêjiyê wî li nav hev xistibû, wî jî darê xwe danetanî, dehên dangan di hundirê wî de jê re digotin “Ev keç nêzikî te ye, ev keç bi te dizane”.

Ji xwe re digot:

“Divê ez wê nas bikim, ev keçik ne wisan e, sûrikandiye berkurka roj û şevên min”.

Roj li wî bûbûn sal, ew peyvên di na-veroka romanê de wek dilopên baranê ke-virê dilê wî rawêj dikirin, roj li pey rojê

dizivirîn, dolabê polmanê dizîzikî. Şiyar ji paytextê vedigeriya bajarê xwe, li bêhnve-danê, keça ku lê digere dît. Dema çav lê ket nema qûna wî kursî digirt, wêneyê li ser pirtûkê û rûdêmen wê di nîgaşa xwe de dianî ber hev, ji xwe re digot:

“Ev keç Şagulê bi xwe ye, divê ez herim silavê lê bikim, an na, heger ne ew be ez ê çi jê re bêjim.”

Şagulê jî çavê wê li Şiyar e ku here si-lavê lê bike, demeke dirêj e wî nas dike, berî ku li wê pêşangehê jî pêrgî hev bibin, ew mirovê biyan ê ku di romana wê de Şiyar bi xwe ye.

Hîna wilo digot, Şagulê karê xwe kir ku rabe, li derketinê bi silavek tenik û kenekî sivik di ber wî re bihurî, çû ket otobêzê û bi rê ket.

Li vir Şiyar bê can di cihê xwe de ra-westiya, awirên çavên wî wek birûska nav ewran li pey wê diçirîsîn, di hundirê xwe de dikizkizî, dîsa tawêşîya cih ew xapand.

“Gelo ev keçik ji ku derê ye, niha ji pay-textê vedigere û ber bi Cezîrê ve diçe, îcar ji kîjan bajarî ye Xwedêyooo!”

“Eva hanê Şagulê bi xwe bû, erê ew bû ma hiş nemaye, çav jî nemanê çawa.”

Destê xwe li çongên xwe xist û bi serê xwe girt û hejand:

“Çawa ez vê derfetê ji dest xwe berdim û xwe bi wê nedim naskirin, bes çima wê silav kir û bi min re gernijî, gelo ew min nas dike?”

Ew deh deqeyên li bêhnvedanê bûbûn wek deh katjimêran. Deh deqe di navbera her du otobêzan de ye, deh deqe di navbera haneseya peyva her duyan de ye, di navbera awirdanên wan de ye.

Wêneyê Şagulê jî ber çavê Şiyar nare. Wê di cama pencereya otobêzê de dibîne, ew çol û der û kêr darên li ser rê çavê wî ji wêneyê wê nabirin, polman bi lez têt ajotin, rê bi lez di wî de derbas dibe, lê wek ku otobêz naçe.

Bi lez ji otobêzê daket, li xwe zivirî dît ku otobêza Heval vala ye kes tê de nîn e, ber bi deriyê geracê ve bazda. Bi çavên xwe ew der û kolan tev de vemalişt û Şagulê nedît, bû wek pirtikek berf û li wê kolanê diheliya, rahişt çentê xwe û bi xemgînî berê xwe da malê.

Êvarê li ber kompîterê rûnişt û derbasî enternêtê bû, neh deh malper bi hev re vedikir, malpera zimanê qedexe, malpera evîna serbixwe, malpera pêxwasan, malpera **zinara** erebî, malpera hejmartina awarte, malpera solên riziyaî, malpera gorên bê kêl, malpera Efrînê û hwd. Tiştek bi navê wê di van malperan de nedît ji bilî gotarekê li ser romana wê ji layê nivîskarekî hatibû nivîsandin, rabû navê Şagulê di Googleyê de nivîsand û li çelkirinê da, gelek gotar û çîrok û helbestên wê li ser banê perdeyê li bin hev rêzbûn, yek bi yek vekir û wan li cem xwe parastin. Di heman şevê de, ew çîrok û helbest tev de xwendin, ji nişka ve “Mazî” paşnavê wê bala wî kişand, ji xwe re got:

- Ez dibêjim ev keç ji Dêrika Çiyayê Maziyê ye û li Şamê rûniştiye, yan ji Dirbêsiyê ye.

Cara yekem e ku Şiyar wilo dikeve tev û nema dizane çi bike, cara yekem e ku bi vî rengî dikeve bin bandora xwendina pirtûkekê. Cara yekem e hespê dil serî jê distîne û bi hiş û nîgaşên xwe li pey pêjna keçekê direve, cara yekem e lehiya hezkirinê li newal û gêdûk û çemê rewanê wî radibe. Dike nake xew nayê çavên wî, wek ku wî û xewê xwe ji hev berdabin, bi wêneyê wê re digernije, maç dike, pirtûkê dide ser dilê xwe, bi xwe re dixê nav nivînan, ji xwe re dibêje:

- Zû yan dereng ez ê wê bibînim, min jê hez kiriye, bi ser de mirî me, sibehê ez ê dîsa lê bigerim.

Di kelekela germa havînê de, Şiyar kolanên bajêr tevdida, li depa cardanê ya kongreya rewşenbîrî dinîhêrî, tu çalakî nîn in, dîsa polî poşman vedigeriya malê. Havînê koçê xwe bar dikir û zivistanê

konê xwe li şûnê datanî, lê mixabin dawiya gera Şiyar nedihat û hîn jî bi hêvî bû ku wê bibîne.

Bi helkeftina yada şewata Sînema Amûdê, şevbuhêrkeke rewşenbîran a mezin li bajarê Qamişlo li dar diket. Şewata sînemayê û agirê nava dilê Şiyar di wê rojê de li hev dibaniyan, bêhna hezkirinê û bêhna goştê zarokên sînemayê ji wê êvarê bilind bû, dilê wî lê dide, çavê wî li deriyê hewşê ye, keç û jin û xort yeko yeko derbas dibin û Şagulê ne di nav wan de ye, nîv kat bi ser pêşkêşkirina bernameya şevbuhêrkê diket. Bêdengiyê valahî seranser tije dikir, ji nişka ve pêjna Şagulê valahî dadîqurtand, derbasbî hundir bû, silav li amadekaran kir û kursiyek li kêleka Şiyar vala bû, bi nazikî xwe li ser wê kursiyê bera xwarê da.

Wek ku her duyan bi derdê dilê hev dizanibûn û her yek ji aliyê xwe ji hev re bêjin bes e, bes e ev qas roj û meh û sal li me borin û em dûrî hev in, divê îro em dilê xwe ji hev re vekin.

Şiyar bi xemgînî li Şagulê zivirî, hêsir jixweber ji çavên wî gindirîn, kesekî nizanibû ne hêsirên hezkirinê ne, yan hêsirên şînê ne li ser zarokên sînemayê, tenê Şagulê dizanibû bê Şiyar ji bo çi digirî, dil tenê bi derdê dilan dizane, dil tenê bi deyx û liyana dilan dizane.

Gelek helbest di şevbuhêrkê de hatin xwendin, lê mixabin tu helbest li ser şewata sînemayê peyda nebûn, tenê helbestên evînî her carê şewata dilan gur dikirin, wisa şevbuhêrk bi dawî bû, lê helbesta herî xweş ya ku li derketinê hat xwendin, gava Şagulê û Şiyar bi destê hev girtin û sirûda evînê li dêmê bajêr weşandin.

evîn şoreş e di dil de
dil şoreşgerekî birîndar

Dûr

Mihemed Ronahî

*Xwezila miskînê heramê mêrê te bimira kevna jina min li ser da em ê biçûna welatê xerib û xeribistanê
bila kesekî em nas nekirana min ê çend rojeka ji qehra dilê rezil ji te re bigota xwişkê, te ji min re bigota
bira şeva nîvê şevê li ser cî û yataxê runiştana gilî û gazincê dilê rezil pev bikira (**Şakiro**)*

her bihar ji nû ve
diguherîne kirasê xwe
mîna marekî zexel
ji nû ve şîn dike birînên xwe

lewma pîr nabe
her tim çardeh salî ye evîn

lewma hê jî
keweke gozel e
li ber deriyê te
dilê min ê çardeh salî

avên “şetên şerbetî”
vedixwe her sibeh
ji mistên te

II
yara min
neyara min
bermaliya qesra min a belûrî

niha
tu bi heft aran evîndar
ez bi heft kêran birîndar

de ka bêje
niha tu ji bo kîjan
“kotî heramê mêran”
badidî biskên xwe yên zêrîn

ji bo kîjan bêbavî kil dikî
çavên xwe yên dêrsimî

III
ez kalexortekî porgij im êdî
bi hespên kumêt dibihurim
ji qûntarên salên xapînok
barê heqîba min: wêneyekî kevn
kûr vedişêrim di taldeya naşîtiya xwe de

mîna zarokê ku pîneyên xwe
veşêre ji hevalên xwe

ey xwişka bêdengiya min
cotek navnîşanên wendayî ne niha
tîrêjên çavên te yên keskokî
tên li seherên sibehên min dixin

min şiyar dikin her sibeh
bi xewnên reşqetranî
ji hemêza yeke biyanî

IV
ax yara min
neyara min
bermaliya qesra min a belûrî

ka bêje
kîjan sêrbazê girêda devê me
kîjan kafîrbavî nîfir kir li me

min beybûnên
biharên porhinekîrî
kom kirin ji te re
ji zozanên hênîk

û ji çendik û çend
bêrîvanan pîrsî navê te
ji çendik û çend sosinan bêhna te

bûm destbirakê pezkoviyar
bûm rêhevalê kurmoriyan

bi refê kewan re firiyam
bi xezalan re geriyam
giriya
giriya
li te geriyam
lê ji te negeriyam

01/09/2008 Amed

Dosye:

Di helbesta kurdî ya nûjen de êşa bin-
destiyê



Amadekar:
Elîxan LORAN

Haveynê helbestê êş e
Dîlber HÊMA

Guftûgo: Helbesta kurdî, êş û bindestî

*Arjen ARÎ
*Berken BEREH
*Kawa NEMIR
*Îrfan AMÎDA
*Welat DILKEN

Helbest di refleks, berdevk, nûnerî, danhev, biberhevanîn û pêşkêşkirina xwe de qasideke neteweyî ye. Lê ne qasideke ku pêsivîk û aqilsivîk e. Qasideke pîgiran û aqilgiran e. Dema ku ev qasid ji ya kes û kûsan bêtir a neteweyekê be û ev netewe jî kurd be, di vir de qasida me dibe ku lal jî bibe, dibe ku bêhnfeşîk jî pê bikeve, dibe ku pişt jî têkeve ber û ji taqetê jî bikeve. Ji ber ku barekî giran dikeve ser milan, qasida me bibêje çi jî dê cihek kêmbimîne. Jixwe helbest destbirakê kêmbûn, kêmasî, kêmar, kêmbêr, kêmbînan e. Û li vê dinyaya zalim û çiminjê helbest bi xwe jî kêmbêr e. Heta ku nîrxên mirov û mirovatîyê kêmbin dê helbest wekî nêman mehdê mêtînger û desthilatdarên xwînxwir bixelîne û tovê wan î zalim jî dê biqelîne. Ev helbest e ji ber tu kesî danaxwe, mixabin.

Me ji bo çi xwest em dosyeyeke bi navê “di helbesta kurdî ya nûjen de êşa bindestîyê” amade bikin? Di bîngehê de dost jî, dijminê post jî û dêwên bejnbihost yên ku li serê avê rûniştine baş dizanin ku; kurd, erdeke wan û derdekî wan heye. Dibêjin ku “derdê qerêş av here ser êş” em jî dibêjin ku “em ji helbestê dipên ku avê bigihijîne ser aş û êşa erd û derdê me”. Li welatê ku zarok bi darê zorê heft salî werin zewicandin –*me bi darê zorê bi “ali ata bak” didine zewicandin, lê her sê kevîrên vê zewacê di berikên me de ne, em çawa keysê pê bixin em ê kevîran bidine mista wan-* û çawa ku diranê heft salî ku yek ji nîşaneyên bîrbûn û destnîmêşîkestîne ye jî li ser serê kurdan dibe diranê xesandîne –*me bi tirkî, erebî û farisî didine xesandin, çawa ku li welatên paşdemayî keçên zarok didin sinetkîrîna da ku tehmekê ji pevşabûn û şabûnê wernegirin, ji bo ku em tehmê ji kurdî wernegirin me didin sinetkîrîna*, li welatê ku me bi bêhna sêvan qîr bikin, li welatê ku ji guhên me ji xwe re miftedankan çêbikin, li welatê ku newalek bi navê Newala Qesaban hebe, li welatê ku miriyên me jî kitim bin, li welatê ku bibêjin “*hûn tune ne*” û me bikujin, li welatê ku *torosa spî* li ber çavên mirov bibe marê reş î kunuf, li welatê ku diya Qember Atêş bi *nasilsînê* karibe bi kurê xwe yê di girtîgehê de biaxive, li welatê ku kujerên Oxir Kaymaz û bavê wî Ehmed Kaymaz hê jî neyên bi cezakîrîna û werine parastin, li erdnîgariya ku lexem werin çandin û deşta Mêrdîn û Ruhayê werin tîlkîrîna, li erdnîgariya ku Nisêbîn û Qamişlo -ku ev her du bajar cewî ne- ji hev hatibin qutkîrîna, em ê jî hawara xwe bigihînin helbestê, çawa ku helbest ji ber tu kesî û tu tiştî danaxwe, em ê jê tîka bikin ku me jî hînî danaxwarîne bike.

Xwezî Adornoyê ku dibêje “*piştî Aûschwîtzê nivîsandina helbestê hovîti ye*” jî qerîna Îrfan Amîda ya ku dibêje “*Ez bawer dikim Adorno gorên bi cesedan xetîmî dîtîbû lê bîra rûmetên tazî/cesedên tazî yên bi dû tanqên Elmanyayê de dê bîn kişîşandin nedibû*” bibihîsta

Wekî me got erdeke me û derdekî me heye, em naxwazin zêde qala naveroka dosyeyê bikin, lê ez dikarim vê bibêjim ku di dosyeyê de em ê bêtir bibin bengînê *erd û derdê* xwe.

I- Bi giştî helbest, bi taybetî helbesta kurdî

Haveynê helbestê êş e

Dîlber HÊMA

Nûjenî di asasê xwe de li ser fenomeke takekesî û aqilê serbixweyî tê bicihkirin. Beriya her tiştî bidestxistina keşifên nû yên ku tu kesî nedîtine, avakirina hêma û remzên nû, peywira herî sereke ya kesê/a nûjen e

Di helbesta kurdî de serê pêşîn divê têgeha **Nûjen**îyê were veçirandin û bi hûrbîni li ser vê têgehê were sekinandin. Ji ber ku gelek helbestên weke serbest û nûjen tînin nivîsandin, berovajiyê vê rastiyê ne. Nûjenî di asasê xwe de li ser fenomeke takekesî û aqilê serbixweyî tê bicihkirin. Beriya her tiştî bidestxistina keşifên nû yên ku tu kesî nedîtine, avakirina hêma û remzên nû, peywira herî sereke ya kesê/a nûjen e. Ji lewre **Kes** bi xwezaya xwe di nava **Aloziyekê** (kaosekê) de dijî. Ev alozî dibe sedem ku mirov li tiştina mikur were. Di vê mikurhatinê de azadî û serbestî tune be, **Bendên** bilind li pêşiya mirov tînin lêkirin. Ji bo xerabkirina van bendan, pêdivî bi derketin û çareserkirina serbestbûnê çêdibe. Beriya wê jî di paş bendan de, li nava avên gewimandî xwetêrkirin û bidestxistina nûjeniyekê derdikeve. Piştî wê jî hemû bertek û daxwazên serbestî û azadiyê bi helbestan tînin vegotin. Helbestvanên ku bi têrbûnê vê vegotinê radigihînin hene; lê nebûna dewlet û dezgehên kurdîyê dibe sedem ku ev helbest li zimanên dewletên dîtir neyên wergerandin. Bi vî awayî jî qasidiya netewa kurdî di ser helbestê re bi cih nayê.

Ji salên 1990'î û vir ve geşedana ku pêlik bi pêlik radipelike ber bi diyarekî bilind ve, bi awayê diyalektîkî ve misoger dê li cihekî bide der. Jixwe pirtûkên ku li dû hev tînin çapkirin, nîşaneyê vê derbûnê ne. Mirov bala xwe bide hemûyên

pirtûkan dê bibîne ku di **Haveynê** gişan de **Êş** heye. Yanî êşên kurdan. Mixabin ev êş bi awayekî xurt nagihîje mirovên din. Çinku benekî qut di navbera pirtûk û xwendevanan de heye.

Dema ku mirov bala xwe dide helbesta kurdî, dê daxwaza takekesîbûnê û bûneweriyê di dilopên hubra pênûsa serîrakirî de bibîne. Helbestvan bi van dilopan xelekên mezin diafirîne û digihîjîne xwe(nde)van. Berî zayîna mirov (helbestvan), jixwe di jiyanê de hiyerarşiyêke destnîşankirî heye. Heta ku mirov fêrî malbat, civak û dewletê dibe, kesayetê wî/ê diafire. Îcar mekanîzmaya ser gişan, yanî ku dewletek tune be, carina civak bi xwe jî hin zagonan diafirîne. Yanî tendirustî, perwerdehî, aborî ji bo kesan tiştên herî sereke yê jiyanê ne. Îcar vana yek jî ger ji teref dewleteke din an jî serdestên wê dewletê ve were bikaranîn -weke kesayet bi zimanê xwe, bi çanda xwe neyê qebûl kirin- di vir de êş dest pê dike. Û helbest hem tê gaziya van tiştan û hem jî gazin û hawarê dike ji van tiştan.

Ji bo rizgarkirina zimanê helbestê (kurdî), divê şerê manûnemanê yê siyasetekê were dayîn. Ev jî bi avabûn, kemilin û sazûnêke xurt tê kirin. Ligel ku siyaseta vî hewldanê dike jî, ji hêla lingê zimên (helbestî) ve ev gelek caran kût dimîne. Bindestî gelek caran di hişmendiyê de ava dibe û çî pêşketin çêbibin jî, ji wê derê dernakeve û hişekî

dîl di hewîne. Hişên azad çî siyaseta, çî qeyd û bend hebin jî, zincîrên bindestiyê diqetînin û serê pêşîn derûniya xwe rizgar dikin. Bi van sedeman carinan helbestvan jî dibin dîlên siyaseteke teng û nikarin ewilî xwe rizgar bikin. Ji ber ku helbesta kurdî jî mêj ve ye bi êşê hatiye strîn di hin qadên serîrakirî de divê bi hêmayên xwe bibe dirûşmeyek. Ev dirûşmeya helbestî jî dirûşmeya asayî bi qîmetir e, çinku bi zimanekî estetîzekirî tê nivîsandin. Louis Aragon ev estetîzekirin bi van gotinan rave kiriye: **“Di roja îroyîn de ku mirov bi awayekî nedîtî tê biçûkxistin, peywira herî torînî û lezgîn ew e ku bûyeran bike stran. Bêguman gelek mirovên ku dê bi vê ferasetê tevbigerin û bi cegerpolayî tevli orkestraya peyva herî insanî ya ku dê bilbilan bédeng bike, hene.”**

II-Hebûna dewletan ne ji bo bextewariya mirovan e

Çar werzên xweş hene di xwezayê de, mixabin ji ber êşa bindestiyê her werz jî bo me xemgîniyekê çêdike. Minak; meha adarê ya welatê me meheke herî xweş e, lê mirov yek bi yek li rojên vê mehê binihêre dê bibîne ku di her rojekê de karesateke mezin heye. Ji bo ku helbesta kurdî bigihîje xwendevanan, dewleteke kurdî pêdiviya herî mezin e; ancax bêtir dewleta kurd hebe jî, gelek helbestên hêja tînin nivîsandin. Ji ber ku erdnîgariya kurdan a gelek perçeyî, perçebûyîneke hişmendiya jî bi xwe re çêkiriye, her perçeyekî xweşiya helbesta kurdî jî li perçeyan belav bûye û weke yekperçeyî nayê dîtin. Çawa ku ev erdnîgarî bi darê zorê hatiye perçekirin, divê em jî bi darê zorê yekbûnekê di helbestê de çêbikin. Dê bi vî awayî perçebûna hişmendiya jî holê were rakirin. Ji bo ku mirov bibe helbestvan ne pêwîst e dewleteke mirov hebe. Ji lewre gelek helbestvanên cihanî ligel ku xwedî dewlet bûn jî, bi tu awayî bi wê dewletê re ne lihev bûn û helbestên cihanî nivîsandine. Nerûda, Lorca û

Nazimê ku xwedî dewlet bûn, bi helbestnûsiya xwe li dijî dewletên xwe serîrakirina herî mezin pêk anîne. Nerûda di 1948'an de li ser hespê di ser çiyayên Andê re nedîçû sirgûniya zimên, ber bi serdema herî biadan a helbestvaniya xwe ve diçû. Nazim diqîriya, **“Helbestên min li sî û du zimanan hatine wergerandin; lê li welatê min bi zimanê min qedexe ne.”** Lorca jî di şerê navxweyî yê Spanyayê de ji teref hemwelatîyên (nîjadperest) xwe ve dihat kuştin. Û ligel bédewletbûnê helbestvanên weke Cegerxwîn, Qedrican, Osman Sebrî derketine û tiliyên xwe di çavên dijminên xwe re kirine.

Hebûna dewletê bixwe, hebûna serdestî û desthilatdariyekê ye. Li cihên ku dewlet lê hene mirov nikare azadiyeke bêhempa bibîne. Tu dewleteke ku mirovan bextewar bike tune ye, berovajîya vê fikrê jî bo berdewamkirina pergala dewletekê, mirov hene. Û berovajî vê dîtine, ji bo kurdan hebûna dewletekê di serê pêşîn de ji bo nivîsandina bi kurdî û jiyanêke kurdewar destpêkeke erênî ye; ancax ev dewlet dê di dahatûyê de veguhere çî, ne diyar e. Mirov ewilî jî bo bûneweriya xwe dinivîse. Hebûn û tunebûna dewletê bandoreke dîtir li mirov nake. Çinku em weke kurd ne bindest bûna jî, dê li derin din bindestên din hebûna. Û dê mirov dîsa êşa wan bindestan ji helbesta xwe re bikira haveyn.

Adornoyê cihû ku piştî jiyînên karesatî bi çavên serê xwe dîtin û bi hestên xwe jiya, dît ku mirovahî di Auschwitzê de bi destê mirovan hatiye kuştin. Li gora wî hestiyariya mirovahiyê herî xurt bi helbestê dihat destnîşankirin. Ger helbest piştî vê karesatê bihata nivîsandin û ew êş bihatina vegotin jî, hem dê kêmbima hem jî dê ew kuştinên hovîtî rewa bihatina dîtin. Piştî karesata Helebçeyê jî peyv nemabû ku were gotin, lê hîna jî helbestên helebçeyî tînin nivîsandin. Di rastiya de Helebçe di

fotografekî de hat bicihkirin, Guernica di wêneyekî Picaso de. Û îro li her perçeyên Kurdistanê heman êş heman desthilatdarî berdewam in.

III-Û ez

Min qet bi helbestnivîsandinê dilê xwe li serdestan rihet nekiriye. Çinku ev êşên me bîyî ku hebekî bêhna xwe vedin li her cihên welatê min û li her cihekî ku welatîyên min lê dijîn, berdewam e. Ez dikarim bibêjim bi helbestên xwe hebekî êşên xwe dikewînim; ne yên netewê gişî. Ji ber ku hîna li çiyayên me keç û xort bîyî ku mîameleya mirovî li wan were kirin, bi hovîti dikevin ser axê: **“rûbar ji miriyan re bûye serşok/ tasika mirovahiyê li hewayê maye”** Mizgînxêrkên welatê min agahiyên xwedardakirina jinên bindest radihînin me: **“bi zerikê dikevim/ ji bo ku/ mizgîna te ya mirinê”** Li Binxetê

sînemayên dîtir tîn şewitandin: **“di bêlimêjiya bajarekî de/ jinek xwîn dibe/ amûdê/ efrînê/ hesekê/ û qamişlokê”**.

Ji bo takekesîtiyeke xurt divê xwebaweriyeke xurt hebe. Ev xwebawerî xwe dispêre xwepêşxistineke pîrhêl û pîrdeng. Ji bo nivîsandina helbestê li derdora mirov bêhejmar alav hene. Ev alav dibe ku ji felsefeyê, dibe ku ji çeşnên hunerî sûdê ragihînin. Çawa ku honandina jiyana mirov carinan bi destê mirov, carinan li derveyî vîna mirov pêk tê, bi vî awayî jî honandina helbestê bi rêya **Xwetiyekê** pêk tê. Helbesta ku ‘xwe’ tê de tune be, bi hêmana civakî derkeve pêş dê bêçêj û rijî bimîne. Ji bo wiha ‘xwe’ û ‘civak’ ligel hev di milên hev de helbestê dixemilînin. Jixwe hestyariya helbestvan a di helbestê de bi rihetî digihîje civakê jî.

Ji bo helbesteke nûjen hewce ye ku dewleteke neteweyî hebe yan jî mirov serbest be?

Teşî/Azad ZAL

Ji Weşanxaneya AVAYê pirtûkeke helbestê ya nû derket. Pirtûka helbestan a bi navê, "Teşî" ji aliyê helbestvan Azad Zal ve hatiye nivîsandin di refên pirtûkfiroşan de cihê xwe girt. Pirtûka helbestan Teşî ji 35 helbestan pêk tê û pirtûka helbestvan Azad Zal a yekem e. Pirtûka Zal, ji beşên wekî, 'Teşîya Destpêkê', 'Teşîya Hêviyê', 'Teşîya Vezayînê', 'Teşîya dayika teşîrê' û 'Teşîya Evînê' pêk tê. Her wiha mirov di nava helbestên Zal de guftûgoya kes a bi xwe û gerdûnê re jî dibîne. Lewra jî ji giliyê sitêrka sibê, heta giliya dil darêjtîye ser rûpelan. Zal, ku roja bûyînê heta roja mirina li ser erdnîgariya welat jî bi tevî êş û eleman bi gotinên wekî, "Gava ku min çavê xwe vekir li dinyayê/ ez bê tîr û bêkevan/ bê zan û bê konevanî bûm" tîne ziman. (DÎHA)

(.....)

Teşîya xwe bide destê xwe dayê

ji nû ve birêse

hiriya xwe bi xwîna min bişo

teşîya xwe bi xwîna min sor bike

rîsê xwe di nava xwîna min de bade

Ji nava kezeba min yeko yeko bikşîne xwestekên min

armanca nava dilê min birêse

rîs ji doza min çêbike bila bêhna te jê bê

ez bi peyva sed temenan bêhn bikim

û xwe pê xwedî bikim


Doza min bi bêhna te geş dibe

heyîna min bi teşîya te xweş dibe

tu xwe ji xwe diafirînî

ez jî xwe ji te

min bêxwedî nehêle...



Weşanên AVA

Navnîşan: İnönü Cd. Magül İş Hanı 2/108

DİYARBAKIR

Tlf: 0412 237 43 16

E-mail: avayayinlari@hotmail.com

Helbesta kurdî, êş û bindestî

Arjen ARÎ - Berken BEREH - Kawa NEMIR - Îrfan AMÎDA - Welat DILKEN

Arjen Arî: Bersiva min na ye! Lê tiştêk heye, ku divê neyê jibîrkirin: Heyîna dewletê di destpêka xwezaskirinê de, digel arîşeyên bi destê ‘ser’ û ‘serkêşan’ rûdîdin; dewlet, weke sazî, weke pergal, di reng û giwînekî şewekî de be jî, fersender û rêvekêrê nûjeniyê ye bo dahatûya xwe... Ji lew, di dirêjahiya dîrokê de em ê li helbestkarekî ku li dijî avakirin an jî daxuyandina dewleta xwe ya neteweyî derketibe, rast neyên. Weke ku têt zanîn, bi qasî ku kurdên sorî ne xwedî dewlet in helbesta kurdî/babanî gelek qonax bihartine, û hê jî li dû venûjentiye ye. Ji layê din ve, bi qasî ku di dema Osmanî de liv û tevgerên edebî; weke Edebiyat-i Cedîde, Serwetî Fûnun pêk hatine, bi damezirandina komarê re ev liv û lebatên di qada wêjeyê de lezgîntir û berbiçavtir in.

Berken Bereh: Na. Helbestvan ku bira helbestvan be hewceyiya wî bi destlatdariyê nîn e. Lê divê azad be. Azadiya wî jî bi wî ve girêdayî ye. Divê ji betnê xwe de azad be. Ango rewşenbîr be. Ji xwe re tu sînor ava nekiribin.

Kawa Nemir: Ev mesele dişibe meseleya “kî ji kê”yê, an jî “kê ji kî”yê, meseleya hêk û mirîşkê. Li dereke ku hêk hebe, wê mirîşk jî hebe, mirîşk hebe, wê hêk jî hebe. Ma ne ji Gûtî û Kardoxan û vir ve ye kurd hebûne, hene û wê hebin (galgalên li ser tenûrên serdema nûjen, hişên akademîsyen ên gayên mexelhatî çî qasî bi meala, netewe çu nîn in, ew qonaxek e û ew jî berekê ve tîn çekirin, bibêjin jî, ku ev yek jî îhtimalek e ji bo ku kurd nebin xwedî dewlet mîna *zerf* û *mezrûfê* tê dubarekirin) wê bi navê *gelê* yan jî *neteweya* kurd komek hebe, ku wê jê re pergaleke birêvebirinê pêwîst be, da ku ji Qersê heta Kerkûk û Kirmanşahê her kurdî di binê

per û baskên Kurdistanê Mezin a hê çênebûyî de, an jî di binê per û baskên Kurdistanê Mezin a ku wê çêbibe de her kurdî star bike, da ku ew bikaribin rastî tundî û tûjiya giyanên bêjî neyên, mîna min, li bajarekî wekî Amedê.

Mixabin bêgav im ji nava du nepakiyan a ku piçekî baştir e hilbijêrim û vê yekê ji bo ewlekariya kirde û bireserên, dimen û kêliyên helbesta xwe dixwazim. Ew jî, erê, dewleta min a ku hebe, ew ê jî bibe desthilatdareke ku îmana wê ji min here, min li qaqa reş asê bike, pûş bixe eyarê min, paşê bi dar û şivdaran pê keve eyêr li min nerm bike, an jî postê min bide ber guleyan. Lêbelê, hema bi tenê ji bo ku Îsmet Ozel û hinek tirk, ereb û ecem li ser teriya xwe rûnên, bi bîr û boçûn û pîlan-kêşîya avakirina dewleteke kurdan qayil im.

Belê, serbestbûna dilê min ne bes e! Divê dilên hemû kurdan serbest bin, dewlemend bin, bi vî zimanê ku ez pê diafirînim perwerde bibin, da ku bikaribin, hindikî be jî, ji helbesta min a nûjen fam bikin.

Wê hingê ez ê bibêjim, heta ku ji me bê, dewletek bo kurdan, lê heta ku ji me bê jî, dewleteke kurdan a ku çu caran neşibe ya cîranên me yên dizek û êrîşkar. Ev jî bi ser meseleya şaristaniyê ve ye, ku helbest bi xwe wê dadimezirîne.

Îrfan Amîda: Ji bo helbesteke nûjen, ji dewleta neteweyî zêdetir divê zimanekî azad û zindî, zimanekî aktîf û dinamik hebe. Heger zimanê neteweyî ji ber ku ew netewe ne azad û ne xwedî dewlet e pasîfîze dibe, têkiliya mirov û zimên qels dibe, wê demê jî bo helbesteke nûjen dewleta neteweya mirov hewce dike. Heger di pêy-

wendiya zimanê kurdî û kurdan de mirov binirxîne têdighîje ku mêtîngehbûna welatê kurdan ne tenê di çarçoveya mêtîngerîya aborî lê di her qadê de ye. Çand, huner, ziman û hemû dewlemendiya xwezayî û mirovî jî têtê mêtinkirin û bi ser de jî qetilkirin. Têkiliya kurdan ji zimên, ji wêjeya wan, ji diroka wan hatiye birîn. Ev tişt ne tenê bergiya helbesteke nûjen bergiya wêjeyeke nûjen, hunereke nûjen jî digire.

Lê meseleya serbestbûna mirov tişteki dî ye. Dibe ku dewleta neteweya mirov hebe lê mirov ne serbest be ji gelek hêlan ve. Heger jî hêla fikir û ruh ve, ji hêla fizîkî ve mirov serbest be, heger tu pîrsgirêka mirov bi iqtîdara kolektîf û ya siyasî re tune be dibe ku tu pîrsgirêka vegotina mirov û qêrîna mirov jî tune be. Heger tu pîrsgirêka mirov a têgihîn û ragihînê tune be sedema nivîsandina helbestê jî dê tune be. Dibe ku wekî fanteziyekê mirov dest bavêje helbestê lê ji bilî vê yekê dê mirov li dîtineke dî, bihîstineke dî û zimanekî dî yê berzekirî negere ku êş û jana xwe bi helbestê bine zimên.

Welat Dilken: Bêguman, li gor hizr û sazûna ramanên neteweyan sê sedsalên borî û heta roja îroyîn “dewletbûn û serbestî” ku bo gelên cihanê çi wateya xwe heye bo kurdan jî ew wate çêbûye û hê jî wekî keskesorekê di ezmanê ramana kurdan de rengêkî neçilmisî ye. Ev her du têgehên hanê, ku çiqas li ser kurdan bandor kirine, ji wan jî pirtir li ser helbestvan û helbesta kurd bandor kirine. Çi helbesta klasîk, çi helbesta nûjen li ser van her du têgehan çêriyaye, diçêre. Gelo bo helbesteke nûjen hebûn an tunebûna dewletê, yan a serbestiyê bandorê dike? Divê em vê ji nav hev derxin. Îro, belkî nebûna netewedewleteke serbixwe ya kurdan bo afirandina helbesta nûjen ne pir diyarker be, ji ber ku helbesta kurd a nûjen di şertên bêdewletbûnê de hatiye nivîsîn û tê nivîsandin. Lê fikr û daxwaza serbestiyê (serbestiyeke ku civakê, xwezayê û takekes di hundirê xwe de dihe-

wîne û diparêze) ji derveyî fikra dewletbûnê jî pêkan e ku bê xwestin û parastin. Lewre ji bo helbesta nûjen (bo helbesta kurd) ji hebûna netewedewletê wêdetir hizra serbestiyê, nebûna serbestiyê bo helbesta kurd a nûjen bivê nevê ye. Serbestî, di nav kurdan de duh daxwaza netewedewletê bû iro têgeheke din e û siba wê veguhere têgehekê, daxwazeke din. Lê bo helbestvanên kurd a ku neguheriye û wê neguhere, ku pergaleke bi çî awayî, navî û rengî dibe bila bibe daxwaza serbestiyê ye. Lewre fikra serbest a xwestina serbestiyê ne ji hebûn an nebûna dewletê, ji tunebûna serbestiyê aj dide. Ku nivê fikra serbestiyê ji serdema netewedewletê ve teşe girtibe jî, hatiye fêmkirin ku bo kesayetiyekê yan komekê hebûna dewletê dibe-bûye sedema tunebûna serbestiyê jî. Lewre hîm û şertê bingeînê helbesta nûjen ne hebûna netewedewletê, lê tunebûn an daxwaza serbestî ye. Ligel vê, pêwîstiyek din a bo afirandina helbesta nûjen jî ew e ku, bi helbesta cihanê re danûstendin û hevnasîni hebe.

Di helbestê de fikra te ya li ser bêdewletbûn û bindestbûnê çi ye? Gelo helbestek dikare serî li ber bêdewletbûn û bindestiyê rake? Heke nikaribe rake dê çawa karibe bi awayekî “tol”a xwe hilîne?

Arjen Arî: Fikra min, bi ser hizr û têramîna Xanî ve ye; Xaniyê ku gotiye ‘Hebûya me jî Xwedanek, Alikeremek latîfedanek...

Bo zanîn, bi qasî ku Xanî ji liv û şêla Mîr Mîreza (dewlet) ya di der barê xwe de ne razî ye; bo aqûbeta desthelatê û sibe-roja am’ê (xelkê) Xanî berdewamiya mîri-tiya mîr daxwaz kiriye ji Rebê xwe.

Jixwe, ji Xanî pê ve tu şairê din wisa eşkere berevanî û parêzvaniya dewletê nekirine.

Li vir jî hev ne cuda bin jî weke du tênginan, dixwazim dewletê û welêt ji hev veqetînim; ji ber ku şairên kurd bi piranî li ser welatê xwe yê dagirkirî, gelê xwe yê

bindest, helbest veristine.

Lê belê; di demên nêz de, bi taybetî piştî 'Nivşê Hawarê' şûra bakur şûra şer e, şûr şerê ku li hemberî bindestiya xelkê û dagirkeriya xakê hatiye dayîn e.

Lê di vir de, bi qasî ez vê şûrê bi nav dikim, ez nikarim bersiva pîrsa we pişt-rast bikim û bibêjim belê, tola xwe hila-niye!

Di sî salên li pişt me mayî de helbestê ne li kolanan, ne li qadan, ne di xwepêşan-de...û ne jî li serê çiyê nekarî 'rape-rîna' xwe pêk werîne..

Weke mînak; yek şerkerî helbesta yek şairî nekiriye nivîstek û nekiriye kurika xwe ya li ser çîçika çepê!

Tol ew e, ku helbest weke eyloyekî ba jenandibe li asîmanê welatekî, mîna bazekî bi şîqîn noqî mîlaka peyvê bibe, di-randibe; kiribe ku dij û dijber heta bi pûrta serê xwe lerîzîbin!

Mixabin, bi qasî nûjen in û nûjenxwazî parastine, ji çend helbestên Ehmed Huseynî û Rênas Jîyan ên ku niha jî meriv dikare li şûna fişekê wan bajo devê ti-vengê; helbesteke bi qasî ya Cegerxwîn dengvedêr, têr î serhildêr zor kême.

Berken Bereh: Em baş dizanin ku da-girker bi qedexeya zimanî dest bi bişaftin û jîholêrakirina wî gelî dike. Lew, ziman stûna bingeîn a netewe û çanda netewî ye. Ji ber ku hest û hişê helbestvên ji her kesî bêhtir bi ziman û çanda gel ve girê-dayî ye, ew ji beriya her kesî hay ji bin-destiya xwe dibe. Pê re jî bi helbesta xwe serî li hember vê dagirkeriyê radike û dix-waze bang û hawara xwe bigihîne nete-weya xwe da vê dagirkeriyê rawestîne. Em di kevneşopiya helbesta me de rastî bi dehan helbestvanan tên ku bi heman ar-mancê helbest lê kirine. Ma Mem û Zîna Ehmedê Xanî ne manîfestoya vê angaşte ye. Cegerxwîn ne ala berxwedana vê hel-west û hişmendiye ye. Ger hestên netewî gur bûbin hinekî jî bi saya vê helbesta kurdî ya berxwedêrî û têkoşerîya wê ye.

Bi gor rexnevanê estetîkî Ernest Robert Curtius "kesê bixwaze di hêla siyasî de rolekê bilîze divê pala xwe bide stûnên wêjeyê. Ta serweriya vegotin û nivîsê pêk neyê, xebata bo serweriya jiyana civakê bi kêrî tiştekî nayê û karekî pûç e. Divê neyê jibîrkirin ku çarenûsa helbest û ya nete-weyê bi hev ve girêdayî ye.

Kawa Nemir: Rênas Jîyan amade ye ji darexaçê re!

Îrfan Amîda: Bêdewletbûn û bindestî-bûn janzêm e. Kaniya jan û êşê ye ango ya helbestê ye. Him jî ber bindestîbûnê him jî ji ber neteweya bindest ku ji hêla dînamîkên xwe ve hatiye xesandin, mirov êş û janê dikêşe. Dema ew netewe serî li destê ku di bin de ye radike/hildide, ew destê li ser, bi gelek alavan (çekan) tiraje-diyan pê dide jiyîn. Ev jî êş û birînan her nû dike. Her mirov bi awayekî û gelek awayan vê êş û janê ji nû ve dibîne, ji nû ve dibihîze, ji nû ve ditamîne, ji nû ve di-pelîne û ya soxî ji nû ve tîne zimên. Ez dibêim qey dîtina herî dûr û kûr dîtineke hunerî/ helbestî ye. Loma jî ji nû ve go-tina herî dûr û kûr bi qasî wê jî ya kelemî ye helbest. Ji bin ve di dest û serdest ra-dibe ew kelem, li gel ku bi piranî yên xwedî dest, ser-dest (gelek caran yên bin-dest jî) çavên xwe jê vedidizin jî.

Helbet bi vî awayî divê helbest serî hilde ku ji xwe helbest ne pariyekî çend pariyan serîhildan e. Jixwe helbesta kurdî ji binî ve serhildan e. Lewra serdes-tan, beriya her tiştî, kurdî qedexe kiriye, xwestiye têkiliya kurdan û kurdî bibirin. Loma jî bi kurdî nivîsîn/helbesta kurdî beriya her tiştî serhildan e, jiserxweavê-tina destê serdestan e.

Lê helbet tenê bi kurdî nivîsîn têra hel-bestê û helbestvanan nake. Him divê li hember serdestiyê serî hilde him jî li hem-ber bindestiyê. Ji aliyekî din ve jî, hel-besta kurdî ya nûjen, divê tola têkilîbirîna bi zimanê xwe re hilîne. Bi helbesta xurt, bi zimanekî berzkiirî û bi lihevbanandina peyvên ji hev xeyidî serî li ber serdestiya

zimanê serdestan hildide. Û girîngtirîn serhildan û tolhildana helbestê bikar-anîna peyvên ji zimanan hêwişandî, di xewlaneyan de jibîrbûyî ye.

Welat Dilken: Helbestek dikare li hemberî bêdewletbûnê û bindestiyê serî hilde. Helbesta kurd duh ew kiriye û îro ji kiriye û dike. Lê, serîhildana helbestekê ya li hemberî bêdewletbûn û bindestiyê di civakeke normal de pere dike, yan jî digihêje menzîla xwe. Di civakeke normal de helbestek li hemberî bêdewletbûn û bindestiyê dibe çekek û bûye jî. Mixabin, civaka kurd di fikr û ramana neteweyî de ne civakeke xwedî fikreke normal e, loma jî nikare vê çekê bikar bîne, nexwe hebûna helbesta kurd serîhildana ji (bêstatubûn) bêdewletbûnê re ye. Lê ji ber ku tiliya civakê naçe ser tetika çekê, helbest wekî guleya di lûleyê de hatiye jibîrkirin e. Bo ku “tol”ê hilîne divê guleya di lûleya çekê de bê bîra civakê. Wer xuya dike ku heta civak hemû guleyên xwe yên din neteqîne, ew gule “helbest” nayê bîra civakê. Lê divê bê zanîn ku li eniya şer ji guleya dawîn re tim du nîşan hene û ne diyar e ku ew guleya dawîn wê bi kîjan nîşanê de bê teqandin!

Kurdistan axa ku jê bûme û dijîm e û dîsa heman axa Kurdistanê ye ku wê ji min re bibe gor. Gelek rê û rêbazên xwe bi rêvebirinê hene, çi dewlet çi pergalek din. Lê ya girîng ew e ku neteweyek xwenas be, bi xwedî anor û rûmet be û di kesayetiye de ne ketî be. Bo neteweyeke ku di asteke wiha de xwedîraman e, daxwaza xwe belkî dewletbûn be yan jî tiştêkî din, lê ya herî girîng bo wê neteweyê serbestî ye. Ji ber ku “serbestî” anor û kesayetibûn bi xwe ye.

Di nivîsandina helbestê de neyarê min ne dagirker e. Neyarê min hişê neteweya min a ku em kirine bindest û ji delaliya serbestiyê bê par hiştin e û hê jî ku me bê par dihêlin e.

Em bi giştî li helbesta kurdî ya nûjen binihêrin, di helbestên nûjen yên hel-

bestkarên kurdî de serbestî, bertek, serîhildan, daxwazên serbestî û azadiyê çawa tên vegotin? Ev vegotin têra helbesta me dike? Helbestkarên me yên ku xwediyê helbestên nûjen in çiqas dikarin qasidiya netewe û gelê kurd bikin?

Arjen Arî: Pirseke girîng û giran e. Bi min, ji salên 96’an û vir ve, helbesta kurdî bi destêwerdana ji kêlekê ve û bi rexneyên bêsêrûber û yên ku hêla helbestkarên kurdên ku bi tirkî dinivîsin ve hatin kirin, kir ku helbesta kurdî berê xwe bide helbesta bajarî û xwe rakişîne rişmê hêmayê...

Ew ewr niha belav bûbin jî, ji wê demê de bandoreke têrûtije kir li helbesta kurdî...Weke mînak; helbestkarên ciwan berê xwe dan helbesta têrhêma, lê bêtewate...

Şikir ji Xweda re, ku niha ew ciwan weke ezmanekî baran barandî, niha sayî bûne, bi ser xwe ve bûne.

Mesele min carekê gotibû, li vir têxim bin nîrê nivîsê: Piştî wefata Cegerxwîn payedariya Helbestkarê Neteweyî ta niha weke xelatekê bi singê kesekî/ê ve nebûye.

Bi hêvî me ku ciwanmêrin/ciwanikin bidest bixin, em jî ji piya ji wan re li çepikan bidin!

Berken Bereh: Helbet her helbestvan li gor hizir, raman û zanîna xwe helbesta xwe ava dike. Em bi giştî nikarin yek kirasî li vê nîfşê bikin. Li gor salên notî helbesta me ber bi cuhokine resen ve diherike. Gelek kesan xwe ji bandora ziman û feraset û helbesta bi wî zimanî yê serdetsên xwe rizgar kiriye û gihîştine qonaxa “xwebûnê” ku ev qonax encama lêkolîn û nasîna berhemine mîrateya helbesta kurdî ye. Di serî de ev bertek û reaksiyon bêhtirîn bi awayekî pexşanî û vegotinî be jî niha gihîştîye asta estetîka helbestane. Helbet ev vegotin têra helbesta me nake û ji xwe helbest tu carî nabêje ev tiştine ji bo min bes in. Ew her

dem li pey tiştine nû ye. Di nav helbestvanên nû de çendine ji wan bi serbilindî dikarin di her qadê de neteweya kurd û helbesta wê temsîl bikin. Ev kes jî ew kes in ku *helbestê* û ji bo wê sazkirina cihekî resen di civakê de ji xwe re kirine armanca sereke. Em baş dizanin ku dûrketina ji warê helbestê, li ser navê çî pîroziyê dibe bila bibe fişekeke qelp e di destê xwediyê xwe de. Ji ber vê çendê gotinên res-terê, beloq, çendî bi nîrx bin jî, ji ber lihevnehatina wan a bi helbestê re tu coş û peroşiyekê wê nede tu kesî/ê. “*Selpakfiroş*” û “*Janya*” navê du pirtûkên helbestê yên nûjen in ku em dikarin tenê van navan deynin hemberî peyvên “şer”, “berxwedanê” bê ka kî ji wan bêhtir bandorê li ser giyan û helwesta însên dike. Ango divê helbestvanên kurdî pîvanên estetîkê û yên helbestê fêr bibin û wan di zûtirîn demê de di helbesta kurdî de bi cih bike.

Kawa Nemir: Bi raya min, pêwîst e derd û kula helbesta me ya nûjen, trajediya takekesî be, ku helbestkarekî/e kurd jî takekesekî/e kurd î normal bêtir li vê yekê diqewime. Gelek helbestkarên me dil hene, dibe ku mafdar bin lê, bi avakirina dastanên gelekî qerase û bi barebar serî li hemberî karesata me ya hevbeş hildin. Lê pîrî caran jî bîr dikin, ku helbestkarek bi vê qûşê nikare bigihije çu devereke gerdûnî.

Gilî û gazinkariya tewş a ku dibêje, “welato ha welato!” dê tişteki jî me re neyane ji avabûna guhertoyeke *edebiyata milî* û pê ve.

Bêguman helbest divê serhildêr be, bo xatirê welêt be, lê pêwîst e neyê jibîrkirin, ku “ramanên ku bi pê û baskên kevokan tên, cîhanê bi rê ve dibin!” Divê helbesta me ew çend kûr, ew çend bikaribe hemû aliyên jiyanê bixe bergiya xwe, bi qat û tewek be. Ne bi vî şeweyê stûr û qelew!

Îrfan Amîda: Di çarçoveya lêxwedîderketina zimên û çarçoveya tolhildana salên qedexekirî de helbet qasidiyeke xurt e.

Nûnertiyeke xurt e. Îro helbesta nûjen zimên jî nû ve diafirîne. Têkiliya di navbera peyvên kurdî de jî nû ve saz û formule dike. Hêzeke ku zimanê kurdî pê di qada netewî û navnetewî de ji piya bisekine diafirîne û aşkere ye ku dê vê hêze xurtir bike. Bi vî rengî jî û bi ya min helbestkarên kurd ên xwediyê helbestên nûjen in têra xwe qasidiya gelê kurd dikin.

Lê ji hêla din ve, gelo mirov dikare, behsa çend helbest/helbesteke ku raste-rast qasidiya neteweya kurd dike, vê birînê (bindestî û serihildanê) dikewîne, bike. Gelo mirov dikare behsa tu helbestên ku bûne sembola an jî dengê serihildanê, bike? Mîna keke ku ketibe ezbera kurdan dikare jî helbesta nûjen bide? Di çarçoveya qasidiya serhildanê û netewetiyê de helbesteke nûjen a ku têkeve dewsa “Kîne Em” a Cegerxwîn heye yan na? Ev jî pîrs û pîrsgirêkeke di ye ku têra xwe balkêş û girîng e.

Helbet helbestên ku bi bertekên welatparêziyê û li gorî sînora û derfetên wê hatine/tên nivîsîn hene lê zêde nêzikî klasîkên kurdî ne. Xwedî deng û oralî ne. Lê helbesta nûjen bi vegotîneke di ji oralîyê ber bi hiş ve bilind bûye. Ji hêla dîtina û awazê ve guherîye û zû bi zû nakeve ezbera kurdan mixabin. Ev ne tenê jî helbest û awayê vegotinê lê ji ber têkiliya qels a di navbera kurdan û helbesta kurdî ya nûjen tê.

Welat Dilken: Helbest ne dîroknivîsandin e, helbest ger di pêvajoyên dîrokî de bo civakê li ser qewimînên dîrokî wekî deq danîşandin be, bo takekes jî tîbiniyên takekesî yên dîrokeke nîvcivakî ku nehatiye nivîsîn e. Bi gelemperî helbest ne dîroknivîsandin, lê ragihandina dîrokê/î ye. Helbest bertek e, helwest e, hişyarkirin e, ragihandin e. Yek jî daxwaz e.

Di helbesta kurd de bertek, helwest, hişyarkirin û ragihandin bêhtir cih digirin. Ku em berê xwe bidin helbesta kurdî em pirtir “dîtîne û gotîne” dibînin. Lê bi

ya min erkeke helbestê ya din jî heye, divê daxwazî be. Helbesta kurd a klasîk ne, lê di ya nûjen de bi qasî ku nerazîbûn heye daxwaz kêr e. Ew daxwaz jî li derdora hêzên polîtîk, rê diajo ser polîtîka û daxwazên wan hêzan, ku ew jî pir caran sergirtî, nixumandî û veşartî ye. Divê helbest rasterast rê biajo ser kaniya tîbûnê, yanê rêya kaniyê şanî bide. Rexnegerî be. Cihan îro bûye wekî kirasekî çiriyayî, ku di her serdemekê de aliyekî wê tê pînekirin. Di nav vê rewşê de jiyana kurdan jî wekî kirasekî ku çil pîne lîxistî ye. Divê karê helbestê ne pînekirin be. Divê helbest kirasê qetiyayî veçirîne perçe perçe bike û biavêje ser sergo. Helbest ne pînekirina kiras e. Ne daxwaz, lê rasterast dirûtina kirasekî nû bi xwe ye.

Di civakên ne normal de tîkiliyên demokratîk û bicihanîn û rol-lîstina rewşenbîriyê jî ne normal rê diajo. Divê gelê kurd li cihanê mêze bike. Gelên cihanê di arîşe û pîrsgirêkên xwe de erk û rolê didin kê? Di pîrsgirêkên navxweyî û derveyî de kî qasidiya wan dike. Bi vê re, divê em vê jî zelaal bikin, helbestkar şervanê ziman û gelê xwe ye. Mijar û daxwazên ku di helbesta xwe de digire dest poetîk û birdozîya wî/ê eşkere dike. Helbestkarî karekî wijdanî ye, polîtîk e, lê ne polîtîkayeke ku polîtîkavan dike ye. Bo rol-lîstin û pêkaniya erkê, li cihê ku tolerans hebe wê wijdan jî hebe, yan jî berevajî... Bicihanîna erka helbestkariyê yan jî rewşenbîriyê, yan jî bo civakê erkparvekirin bi kamiliya çanda desthilatîyê û demokratîkbûna civakê ve tîkildar e.

Tîkiliya avabûn û kemilîn û sazûna siyaseta kurdan û di helbestê de rizgarbûna ji bindestiyê çawa ye?

Berken Bereh: Kurd di her qonaxê de jî bo mafên xwe tîkoşiyane. Em dizanin ku kesên ewilîn bi pîrsgirêkên civakî û netewî dihesin bêguman kesên xwenda, zana û xwedî roleke li pêşîya civakê ne. Helbestvan jî yek ji wan kesan e ku pir dixwîne, lîdikole û bi civak û çand û kultura xwe re dide û distîne. Ev tîkilî û liv-

baziya wî bivê nevê ber bi rastî û trajediya gel ve radikişîne. Ji ber van astengî û bertekên stembar bi rihetî nikare kar û xebata xwe bike. Ji ber van sedeman mecbûr e ku ta demekê be jî di nav siyaseta gel de cihê xwe terxan bike. Jixwe dema em li helbestvanên xwe dinîhêrin bi tevayî ewilî wek çalakvanekî di nav siyaset û tevgera azadîxwaziyê de cihê xwe girtine û hinek ji wan tu carî mesafeyekê naxin navbera wê jî. Bi rastî di kamilbûna helbestvanî/ê de ev helwest gelek caran pênuş û afirîneriya wî jî xurtir dike. Lew rasterast di nav tîkoşînê de ye û zûtirîn hay ji rastiyê tê.

Kawa Nemir: Min bi salan berê gotiye, “Roj baş qanûnê bahoze! Şahînsahiya zimên!” Ji vê pêştir li ser vê tiştêkî din nabêjim.

Îrfan Amîda: Bi ya min ev tîkilî yekalî ye. Helbesta nûjen û di helbestê de rizgarbûna ji bindestiyê bi bandora siyaseta kurdan afirîye. Ne tenê rizgarbûna ji bindestiyê ya di helbestê de rasterast helbest û hişê ku helbestê formule dike, dîtin bihîstin jî nû ve formulekirin, peyvên veşartî, yên di taldeyên hiş de zengirtî bi bandora siyaseta kurdan jî nû ve dawerivî ser lêvan. Kurdan siyaset, netewetî, kurdayetî, mirov, civak, serbestî, bindestî, hişmendiya kolektîf, kesayetiya azad, bi giştî jiyan bi bandora siyaseta kurd re jî nû ve xwendin. Lê mixabin wekî ku min got ev tîkiliyeke yekalî ye. Bi qasî ku bandora siyaseta kurd li ser helbest û helbestkarên kurd heye, piştî xwe-afirandinê, siyasetê deriyê xwe ji helbest/wejeya kurdî û zimanê kurdî re venekir. Ya jî wêjevan/helbestvanên kurd ew derî nedan vekirin. Heman tiştî bandor li ser tîkiliya gel û helbestê jî kir. Ji ber ku tîkiliya kurdan û helbesta kurdî ne xurt e mirov nikare behsa bandora helbesta/wêjeya kurdî ya li ser vê pêvajoyê bike.

Wekî ku hûn jî dizanin ji destpêka salên 1990'î û vir ve geşedanek di civak û edebiyata kurdên bakur de pêk

hat. Gelo di wê geşedana edebî de helbesta kurdî, çiqas êşên kurdan ên bindestiyê nimandin?

Berken Bereh: Helbesta kurdî li gor min ji hemû beşên wejeyê bêhtir daye dû êşên netewiyê. Îro jî mijara herî sereke bindestî û pîrsgirêkên bi vê ve girêdayî ne. Ev tiştekî siruştî û di cih de ye. Helbestvanên kurd pê hisiyan ku ta bindest bin, tu pîrsgirêkên wan dê neyên çareserkerin. Ev rastî û tespît her wiha wek mîrateyekê ji nifşa berê maye ji me re. Her çiqas çareserkerina wê ne karê helbestê be jî, helbest dikare wê ya di hiş û giyanê her kurdekî de bi cih bike ku karibe berê xwe bide asoyeke din. Bi destpêka şerê çekdarî re wek her beşa wêjeyê helbest jî têra xwe neket rojeva kurdan. Ji ber hindê ev rastî têra xwe nehat dîtin. Bi min helbestê têra xwe bindestî ji xwe re kiriye mijar, bila dîsa bê vegotin, lê bi awayekî din. Li hêla din hê feodalî û bandora wê ya li ser civakê didome. Her wiha bi giştî kurd li bajaran kom bûne, pîrsgirêkên bajarîbûn, debara malbatî, daxwaz û xwestekên takekesî û bertek û bendên li ber wan bi qasî bindestbûnê barekî giran e li ser civaka kurd. Helbest divê bikaribe bibe berdevkê van êşan jî. Di vir de helbesta kurdî hê qels û bêhêz e.

Kawa Nemir: Belê, heke ne tiştekî ciyê şermê be, ez ê bibêjim geşedaneke ji salên 1990'î û pê ve li Kurdistana Bakur pêk hat û giraniya barê vê qonaxê bêtir li ser sermilên kovarên bi navê *Rewşen*, *Jiyana Rewşen* û *Rewşen-Nameyê* bû, ne ku em kovarên mîna *Nûbihar*, *Nûdem* (li Swêdê 40 hejmar derçûye), *Pelîn*, *Gulistan*, *Kevan* û yên din biçûk bikin, lêbelê ji ber bêderfetiyeke aborî, yan jî başbaş piştgirînedana saziyeke kurdan a çand û hunerê (Navenda Çanda Mezopotamyayê) tevî xişîmînên xwe û gelek caran çapa wê ya bêqalîte, teqîna bera ya helbesta me ya ku dikira xwe nûjen bike, teqîna di warê çîrok, cureyên pexşanê yên dîtir û xasma wergerê de *Nîfşê Rewşenê* rê li îroya me vekir, bila tu kes wisa rûnenê ji aş û baş

nepeyive. Ew kindirê wê qonaxê yê nîmayî bi salan di destê min bi xwe de bû, carê ew kindir li canê hinekan ciyên derbên reşûşîn vekirin, ku yan bi nivîs û afirandinê de çûn, an jî dev jê berdan û winda bûn, ne carê, gelek caran jî kewkî hat li canê min bi xwe ket. Hal û mede der heqê vê qonaxê de wiha, vî sûretê helbesta ku ji 90'î û pê de nîgar bûye û ji batin û zahîrê dema şerê xwînxwar bi giranî rastiya me kurdên bakur kêşaye, beriya hemû hemanine civakî yên din, wê bindestiya me kêşabe.

Bila bi vî awayî, wekî dîbace, li rûpelên dîrokê tomar bibel!

Îrfan Amîda: Dema mirov beriya salên 1990'î û piştî 90'î bide ber hev dê têbigihîje ku ne tenê geşedaneke rasterast, ronasekê dest pê kiriye. Dibe ku mirov ji hin hêlan ve bibêje ku beriya salên 80'yî tovên vê ronasesê hatin bizirandin û piştî salên 90'î bişkivî. Lewra kurd û kurdî heger ne miribe jî di sêkeratê de bû û ji xweliya xwe dîsa vejîya. Loma mirov bi hêsanî dikare bibêje ev ronasek e.

Bi qasî ku kurd bindest bûn kurdî jî bindest bû. Helbet mirov nikare wan ji hev veqetîne lê rewşa kurdan/Kurdistana nedişîbiya/naşibe tu mêtîngehan. Rasterast êrîşên li ser zimên hebûn/hene. Ji loma jî hebûna kurdî bi qasî hebûna kurdan pîrsgirêk bû. Kesên ku bi kurdî dest bi nivîsê kirin bi refleks û pejinkariya nûnertiya kurdî jî tevgeriyan. Xurtkirin û jîpiyahîştina kurdî ya di nav zimanên dinyayê de armanceke sereke bû ji bo kurdînûsan. Divê kurdî fediya xwe ji ser xwe bavêta. Ji ber vêya jî diviya sînorên vegotin û mijarên kurdî teng nebûya. Bi ya min kurdînûs parîkî jî bi vê pejinkariyê tevgeriyan. Ne tenê di nav tirkên de di nav kurdên tirkînûs de jî pîrsa "Gelo kurdî têra wêjeyê dike?" dihat pîrsîn. Ev bi xwe êşeke mezin bû ji bo kurdînûsan. Divê bi giştî wêjeya kurdî û bi taybetî jî helbesta kurdî xurtbûna kurdî bini- manda û nimandiye/dinimîne.

Ji bilî vê, dema mirov bersiva pirsê ni-
mandina êşên bindestiyê, êşên kurdan,
gelo dikare bi heman quretiyê bibêje; belê
helbesta kurdî êşên bindestiyê niman-
diye? Na, mirov nikare bibêje. Û hê heta
demeke dirêj jî nikare binimîne. Lewra
mirov nikare êşên bindestiya kurdan bi-
pîve.

Em kurd ne dîroka kurdan ne çîroka
kurdan baş dizanin. Heta ku kurd dîroka
kurdan û Kurdistanê, çîrokên kurdan û
Kurdistanê baş fêr nebin nikarin bi rêya
hunerê, wêjeyê/helbestê vebêjin. Belkî jî
mezintirîn êş ev e. Û heger helbestvanên
kurd bi gelê kurd, dîroka kurdan nizani-
bin dê nikaribin baş vebêjin û di vê çar-
coveyê de rola xwe bilîzin.

Welat Dilken: Ku em îro dêna xwe
bidin wêjevanên kurd em ê bibînin ku jî
sê paran du par piştî salên nodî derketine
ser dika wêjeya kurdî. Bêguman, belkî bê
gotin ew rade bi geşedan û pêşketina
zimên ve têkildar e. Rast e bi pêşketin û
geşedana zimên ve girêdayî ye ew rewş, lê
geşedan û pêşketina zimên ligel têkoşer û
saziyên zimên, bi nimandina êş û bindes-
tiya kurdan ku ne tenê helbestkarên
kurd, wêjeya kurdî karibûye, kariye êş û
bindestiya kurdan bîne zimên. Ji ber vê jî
wêjevanên kurd çî yên nû çî yên beriya
salên nodî di nav şertên pir zor û zehmet
de diafirînin û wekî derwêş û bengî bi
ziman, wêje û (êşa) civaka xwe ve girêdayî
ne. Belkî di nav wêjeya cîhanê de nav û
cîhê wêjeya kurdî hê jî ne li gor nîrxên
wêjeya kurd be, ku ew jî jî pêvajoya kurdî
di nav de dijîn ve têkildar e. Îro cîhê ku
wêjeya kurdî di 15, 20 salên dawîn de gi-
hiştîyê, rasterast bicihanîna erka mijarê
ve girêdayî ye. Divê bê zanîn, ger avek di
cuhokekê de biherike, lê negihîje nav ze-
viyê divê ew zevî bê kontrolkirin ka ew av
di nav zeviyê de belav dibe yan av di qelî-
ştok an jî di kunekê de bi hêlên din ve
diçe. Divê xwediyê zeviyê, zeviyê baş kont-
rol bike. Helbestvan hozan e, ew bi nivîskî
dilorîne, distirê deng û awaza xwe li ser
kaxiz dide olandin.

Ka em pîrsekê jî gel jî bikin, bi taybetî
jî ew pîrs bo nûner û pêşengên gel hê der-
basdar e. Ey gelê kurd, nûner û pêşengên
wî, hûn çiqas dixwazin ku hozanek êş û
janên we di nav hibrê de tevbidin? Çiqas
dixwazin ku helbestkar bibin berdevk û
qasidên we. Û ku helbestkar di navbera
we û gelên cîhanê de bo ragihandina êşên
we bibin pîr. Ey gelê kurd, sazî û nûnerên
wî, gelo çî hişmendî û bendewariya te li
ser bicihanîna erk û peywira helbestvan
heye? Ez ne bawer im ku bi gelemperî yan
jî di çarçoveya sazî û dezgehên kurd de
daxwaz û lêgerînek hebe bo ku helbestvan
û helbest erkê bigire û berdevkiya êşa gel
bike. Ku ne wisa be, gelo sedema vê çîroka
gihayê hewşê çî ye. Ku daholvan bi xwe li
daholê bide û bi xwe bilîze hêvî nekin, ew
govend naçe serî.

Bo wê jî hezar car mixabin ku wêjeya
kurdî kulek e. Lingek diçe yê din jê re qet
nebe kaşkaş jî nabe, jî ber ku giyaşê
hewşê tehl e.

**Hûn di kîjan berhem û helbesta hel-
bestkarekî/e nûjen û yan jî di ya xwe
de dikarin bibêjin ku “canik/camêr an
jî min êşa bindestî û bêdewletbûnê baş
vegotiye, dilê xwe li serdestên xwe
rihet kiriye. Min netewe û wêjeya kurdî
fedîkar dernexistiye.”**

Arjen Arî: Ev pîrs, divê jî xwendeva-
nan bêt kirin Ew jî ku hebin!

Berken Bereh: “Ramûsan Min Ve-
şartin li Geliyekî” û “Pîrs Hene, Zanim” a
Arjen Arî, “Qesîda Qedexê û Dê û Law” a
Rênas Jiyanî, “Selpakfiroş” a Kawa Nemir,
“Deqên Qesas” a Lal Laleş “Nameyên Na-
bersivîn” a Îrfan Amîda, “Keziyên Ji-
nebi” ya Gulîzer û “Gulên Qasid” a Fatma
Savci”.... hwd hêja ne û bi serbilindî em
dikarin wan bidin ber helbesta cîhanê. Li
vir pîvan ew e ku nivîs gihaye asta “ber-
hem”ê yan na. Her helbesta “baş” dikare
pirsa te erê bike-çî takekesî, çî civakî ha-
tibe nivîsandin jî.

Kawa Nemir: Çênabe tekane derdbê-
jiya helbestê bindestî û bêdewletbûn be,

tevî ku min li jorê got, sûretê helbesta me ya di dema nû de pêk hatî ta radeyeke bilind wiha çêbûye!

Reng e bi rojan û şevan li ser vê pîrsê biponijim, bixivim û dibe ku bikaribim tiştine dirêj jî binivîsim, lê lêpîrsîneke wiha rê nade vê daxwaza min. Çiqas jî şika min lê diçe, dibêjim, ew ê nebe bersiva durist a vê pîrsa we, ez ê vê nimûneyê bidim:

Pir baş tê bîra min, salên 90'î, me li civatên xwe yên kurdî nûs perçene *Janyayê* û hemû helbestên Arjen Arî û ji fotokopiyên helbestên Ehmed Huseynî, Rojen Barnas û Evdila Peşew dixwendin, ku şerîet şermê naxwaze, em geh li deşt û çolên qesas dipelişin, geh jî her yek ji me dibû Ferîdûnê Kawa, me jî lat û zinaran, lûtke û geliyên Kurdistanê xwe lek bi lek berdida ser qesir û qonaxên dagirkerên welatê me.

Îrfan Amîda: Di pêwendiya fedîderne-xistina wêjeya kurdî de ez dikarim, ji Ehmed Huseynî bigir heta Arjen Arî, Rênas Jiyan, Kawa Nemir, Berken Bereh, Lal Laleş û di ber gelek helbestkarên kurdên ku min navên wan nehejmart û berhemên wan de sond bixwim ku wêjeya kurdî û di vê çarçoveyê de neteweya kurdî fedîkar dernexistine.

A soxî helbest metnek e. Heger mirov wê metnê û metna di binê wê de baş binirxîne/veçirîne dikare têbigihîje. Ne hewce ye mirov yek bi yek mînakan bide ji van helbestkaran an jî ji xwe. Tenê ji helbestkarekî bê pirtûk –ku yek ji gelek helbestkarên bê pirtûk in û têra xwe nûnertiya kurdî û êşên kurdan dîkin e– dixwazim mînakekê bidim. Beqa Reş a Bamed Serdar têra xwe birînên min tîne bîra min û yên nû di hişê min de vedike loma beşa dawîn dixwazim wekî mînak bidim.

.....

Qebqeba giriyê min li newqa vê
Govendê

Binkiraskê şevê

Pêşberî ewrê keysa sawê

Perşikestî li mertalên taxa xewê

Orîn ji min dihile

Hey gawir! Qutbirî ji te dibare.

Heger mirov vê metnê û metna di binê wê de veçirîne ez dibêim qey wê têra xwe dilê xwe li serdestên xwe rihet kiribe. Lê mixabin ji ber ku bindestiya kurdan/serdestiya mêtîngeran her xwe ji nû ve diafirîne û formule dike û ji ber ku êşên kurdan her zêde dibin ne helbest ne tişteke din di ber re nagihê.

Welat Dilken: Vê sond û qeyrana Rîndexana serhildêr dil û kezeba min li serdestên kurdistanê hênîk kiriye û di ser de ji kesayetiya kurd a serbilind careke din aniye bîra jibîrveçûyî û ger di ser de ji hin poz şewitandibe kezeba min wekî kanîsarkê hênîk kiriye.

Ez im rînda Rîndexan

Keça mîr û axa û çîyan

Ey tirkê tacik

Karê we çî ye li van çîyan

Rînda bûye namdar

Ez dimîrim, birîndar û bê zar

Teslîm nabim destê neyar

û naçim bê ar...*

Em di çarçoveya helbest û dewletê de li mijarê binihêrin, heke ku dewleta we hebûya û hûn serbest bûna we yê dîsa helbest binivîsanda? Heke ku we binivîsanda, ji ber ku muxatabên we yên wekî dewlet, desthilatdar û serdest wê tune bûna, we yê kî yan jî çî ji xwe re muxatap bigirta?

Arjen Arî: Dewlet hebe nebe, helbesta ku dewlête dixwaze dê hebe.

Heke, hat û dewlet çêbû, helbesta di destpêkê de 'leşkerê' dewletê, dê rojekê berê tivingê ber bi dewletê ve bike!

Min ji niha ve berê hespê helbestê da-gerandiye ber bi 'kêlin' din ve!

Yan na, helbesta 'Kokteyl' min nedini-vîsî!

Berken Bereh: Belê min ê dîsa helbest binivîsanda, lew dewleta me hebûya û em xwedî statuyekê bûna jî ger ev desthilatdarî dûrî mafên takekesî, dadwerî, wekhevî û bi parvekirina hemû hilberînên netewî bûya dê min li hember van neheqî, pest û pêkutîyan li ber xwe bida. Lew, li gor min her kesê/a dema çavên xwe jî jiyane re vedike xwedî heman gencîne û pêdivîyan in, lê di pêşerojê de hin kes, êl, hoz an jî xwedî sermiyan bend û lelayan jî bo wan çêdikin û li hember jiyaneke bi aram û dilxweşker astengiyan derdixin û bi yasayên zordestiyê dorhêla wan radi-pêçin. Li hêla din helbestvanî hinek jî perçeyek jî giyana însên e. Yan jî di betnê wî de tovê helbestvaniyê heye. Vêca ger şert û merc hebin kes bi xwe dihesê û dide ser vê gencîneya xwe. Ez wisa dihizirim ku em xwedî dewlet bûna jî dê min ê helbest binivîsanda.

Kawa Nemir: A rast, tiştê ku hûn behsê dikin hebûya, bi raya min min ê dest bi naskirina tundî û tûjiya bav û dayikên, kek û etên li nava mala me bi xwe bikira. Dikarim pêş bibînim, ku ev ê zehmetir bûya, lê ka bila ew qonaxa *postkolonyal* bihata...

Pakî û nepakî li her demê û li her cîgehî pakî û nepakî ye. Ew çil pere jî hev şaş nakin. Min ê dîsa bi vî awayê xwe yê duh û îro, lê bi berfirehtir û kûrtir biafiranda. A ev jî heye, ez ê esas wê hingê nezaniya desthilatdarên me bi xwe li rûyên wan bibêjim.

Îrfan Amîda: Heger mirov li dîroka mirovahiyê binihêre dikare bi hêsanî bibêje ku cihê mirov lê hebin îqtîdar jî heye. Tu civak bê îqtîdar heta niha nejiyaye. Dibe ku utopyaya esas ev be. Ne tenê civak mirovek jî îqtîdarê diafirîne. Têkiliya hiş û îqtîdarê heye di heman demê de nakokî jî di navbera wan de heye. Divê mirov vê

yekê jî destnîşan bike. Kurd jî xwedî îqtîdar in. Qet nebe hişmendiya kolektîf îqtîdarek e û pîrsgirêk di navbera wê û takekesiyê, kesayetiya azad de heye. Zarok, jin, fikir, evîn, azadiya takekesî û gelek nîrxên mirovî di bin vê îqtîdarê de dinalin. Heger ev yek tune bûya dê çima azadiya jinê ew qasî pîrsgirêk û têkoşîna azadiya jinê ew qasî giran û mezin bûya. Mirov bala xwe bidê dê têbigihije ku ev jî pîrsgirêk û êş in ji bo helbestkarên kurd.

Minak: Di dewleteke wekî Tirkîyeyê de heger dewlet ne muxatabê helbestkarê/i be bi ya min helbestkarî wê tune be. Lewra zimanê helbestkar kelîma(ke-lama) şhadetê ye. Şahidiyê dike. Şanîdêr e. Heger helbestkarê tirk şahidiya zordestiya dewleta xwe neke ne helbestkar e.

Bi vî rengî mirov bifikire, dê dewlet û îqtîdar dîsa muxatab be. A rast dê bêdewletbûn êdî nebe muxatab û mijar. Dê ew şikestina aşkera ya jî veşartî ya bêdewletbûnê, ku şikestineke dijwar e, jî holê rabe. Helbet bêdewletbûn elementeke bingeîn a helbest û helbestkariya kurdî ye lê ji holêrabûna vê elementê helbestkariyê jî holê ranake.

Welat Dilken: Wekî ku me li jor jî got, helbest daxwazek e, ku ne bi zimanekî polîtîk tê gotin. Helbest daxwazek e ku bi zimanekî xemilî (estetîzebûyî) ye tê xwestin û vegotin e. Qibleya helbestê belkî bo demekê jî ber berpirsyariya xwe ya li hemberî civakê, ku ew civak mêrg û çîmenê helbestvan û helbestê ye, serbestiya welêt be, lê ya bingeîn daxwaza helbestê, bêdem û bênavber daxwaza serbestiya jiyana takekes û civakê ye. Cihê ku desthilatdarî hebe teqez gotineke helbestê jî heye. Cihê ku desthilatî heye nerazîbûn û bêdadî jî heye, bo wê jî her tim helbest hatiye nivîsandin û wê her tim jî bê nivîsandin.

Li gorî fikra we di rewşa bindestiyê de helbestên takekesî bo netewebûn, azadbûnê bi kêrî tiştêkî tên? Di helbesta xwe de hûn derûniya takekesî

derdixin pêş an jî derûniya civakê?
Hûn kîjanî derdixin pêş û kîjanî li paş
dihêlin, ji kerema xwe re rave bikin.

Arjen Arî: Ez çendî bibêjim bi nivîsan-
 dina helbestê, bi bikaranîna vî zimanî re
 ez wek kes, ji kesekî jî vî civatê xwe azad-
 tir dibînim an jî disehim; di rastiye de ez
 jî wek te, yê din, yê din bindestek im!

Ji ber hindê, ez çendî û çiqasî xwe ve-
 bêjim jî gotinê tê li tayê bindestiyê diale.

Ji lew, hemû helbestên min xemxur in.
 Ya herî 'ez' jî!

Berken Bereh: Ev her du mijar wek
 goşt û neynûkê bi hev ve girêdayî ne û jî
 hev nayên veqetandin. Di civakeke ne-
 zad de ne gengaz e ku însanek ku bi xis-
 letên mirovbûnê mezin bûyî deriyê dilê
 xwe serdanpê jî xweşikiya jiyanê re veke.
 Û ev tişt ne gengaz e jî. Lew, helbestvan bi
 xwe jî yek jî kesê/a wê civakê ye, merivên
 wî/ê, dostên wî/ê, hemwelatîyên wî/ê ku
 di rewşeke kambax de bin dê çawa bika-
 ribe piştî xwe bide vî rastiye û pê neêşe.
 Helbet helbestên takekesiya wî jî dê ey-
 neya civakê bin û nîşaneya derûniya ci-
 vakê bin. Di ber van vegotinên "êşê" re jî
 dikare bi vegotineke helbestane mizgîniya
 jiyanê xweştir ragihîne civakê. Bi ristên
 berevdanî di dil û giyanê xwîner de şopa
 xwe bihêle û hesreta pêşerojê dadwe-
 rane bi xwîner bide hîs kirin. Em dizanin
 ku helbestvanê/a rastiya helbestê û ke-
 sayetîya xwe fam kirî dikare bi her awayî
 bandorê li civakê bike. Bes di vegotin û
 helwesta xwe de jidil û ne dûrî civak û
 çand û kultura xwe be.

Kawa Nemir: Takekesek divê an wekî
 - bo nimûne - Ritsos bibe helbestkarekî/e
 kûr, an jî wekî Mahsûm Korkmaz bibe
 şêrê gel. Her du jî mîna hev in, bêtî yekî
 çênabe yê din hebe. Lê ciyawazî bi tenê
 ew e mirov bikaribe heqê her duyan jî ge-
 lekî baş bide.

Haya min gelekî gelekî baş jê heye bê
 kîjan nirx helbesta min a takekesî ya ku
 jî hedê xwe der xef û sergirtî ye geş dîkin.
 Bar û kêşe ya xwendevanên kurd e, piştî

ku bi saya serê wan nirxên bilind î jiyani
 min nivîsandibe.

Helbestkarekî/e ku bi awayê rastkîno
 bi helbestê radibe, bi hemdê xwe yan jî bê
 hemdê xwe, dibe awêneya derûniya ci-
 vaka xwe û serdema xwe.

Îrfan Amîda: Heger helbestên takekesî
 di rewşa bindestiyê de jî bo netewebûn û
 azadbûnê bi kêrî tişteki neyên di rewşa
 azad de jî bi kêrî tişteki nayên. Belkî jî bo
 ku mirov vî pirsê bi awayekî durist û xurt
 bibersivîne divê takekesîtiyê û netewetiyê
 û têkiliya di navbera wan de xurt û bi
 awayekî durist binirxîne. Pivana jihev-ve-
 qetandina wan çi ye gelo? Hejmar e yan
 tişteki dî ye. Mesela êşa hezar kurdî ya
 netewetiyê, bêdewletbûnê û neazadbûnê
 li gorî ya kurdekî bi hezar qatî zêde ye
 gelo? Ya jî çend mirov (û çawa) dibin ne-
 teweyek?

Beriya her tiştî xurtbûn û nasnameya
 neteweyekê jî afirîneriya kesan pêk tê. A
 soxî tu tişteki anonîm tune ye. Lêxwedî-
 derketin û pejirandin tiştan anonîm dike,
 dike tiştên netewî. Ez nîzanim lê dibe ku
 navendeke hiş a jî genetîka neteweyekê,
 ku li gorî refleksên neteweyê dixebite,
 hebe di hişê mirov de. Helbesta netewe-
 yekê, mîmariya wê, wênesaziya wê, mu-
 zîka wê ya jî peykersaziya wê tune ye. Ev
 tişt bi giştî neteweyekê diafirînin.

Ji hêla din ve jî takekesiya xwerû tune
 ye. Bi erênî yan jî neyînî takekes jî civakê
 diafire. Bêtî rastiya derveyî xwe nikare xwe
 temam bike. Derûniya mirov jî bêtî derû-
 niya civakê (derûniya kesên dî) tune ye.
 Bêrîbûn an jî xwebêrîkirin ne mimkun e.
 Di azadiyê de (ya takekesî) bêrîbûn û girê-
 dayîbûn ne du tiştên bi temamî dijberî hev
 û jî hev cuda ne. Bi ast û mahiyeta wan ve
 eleqedar e. Ji loma jî ez nikarim jî bo hel-
 besta xwe û di helbestkariya xwe de bêjim
 ez yekê jî wan li paş dihêlim an jî yekê jî
 wan derdixim pêş.

Lê ku ez destnîşan nekim nabe. Ez ni-
 karim helbestkarekî/e kurd û kurdî ku
 xwe jî êş û birînen bindestiya kurdan bêtî

kiriye û şahidiya wan êş û birînan nake tehamul bikim. Divê mirov ji îmana mirovbûyîne bi şik be wê demê.

Welat Dilken: Takekes perçeyek ji civakê ye. Derûniya takekes di hevîrê civakê de tê stiran, lewre helbesta ku derûnî û hestên takekesî tinin zimên an raman û rewşa takekes vedibêjin hêmayê xwe di nav çand, ziman, jiyan û danûstandinên civakê de teşe digire. Helbesta takekesî perçeyek ji jiyana civakê ye. Di vir de ya girîng ew e, daxwaz, danûstendin, hest, û derûniya takekes û civakê çawa tekilî hev bûye ye. Di navbera takekes û civakê de, arîşe û pirsgirêk bi çî berpirsiyariyê, daxwazê, zimanî û rêbazê tînin vegotin an çareserkirin. Veçirandina daxwaz, hest û xwestekên takekes di heman demê de naskirin û famkirina civakê ye jî. Lewre jî ku lehengên Dostoyevskî çawa di civaka ûris de erk pêk anîne, helbestên takekes jî di nav civaka kurd de bi erkek wiha re rû bi rû ne. Pêkanîn an neanîna vê erkê tiştekî din e.

Em tenê li 30 salên dawîn ên kurdên bakur binihêrin, zindan, şikence, şewitandina gundan, faîlî meşhûr, girtîgeh, tirs, xof, rûmetşikandin, qedexebûna çand û zimên, qaşo tunebûna kurdan; hûn di helbestê de çiqasî xwe berdevkê van êşan dibînin? Di sî salên dawîn ên kurdan de fikra we ya ku di helbestê de propagandaya netewe, partî, kes an jî gelê kurd çî ye? Propaganda û slogan pêwîst in an na? Bêyî propaganda û sloganan mirov dikare çawa estetîze yan jî sembolîze bike?

Arjen Arî: Belê...Agirek vêket û pêtan avêt her deverî; gund, navçe, bajar, çiya... Bi gotineke din, welatekî serobinobûnek dît, jiya! Helbestkar jî di nava vê geremolê de bû; li qeraxê yan jî di navê de...

Her rêxistin zexm lawaz wêjeya xwe jî bi xwe re digihîne. Ez di helbestê de ne li dijî siloganên hunerbaz im.

Pêwîstiya jiyanê bi xwe bi sloganan heye.

Di meseleya berdevkiyê de... Min jî berdevkekî bêhtir xwe weke 'bibîrxistekî', dît. Dîsa jî, gelek caran diponijim di ber xwe de û dibêjim 'gelo helbestê karî dengê xwe têxe ber tilîliya dayika kitanspî, karî bibe balgiha yê di nava çar dîwaran de, karî bibe spartekeke ku şerkerekî westiya bi keleşa xwe re milê xwe bispêre hestên wê yên zexm...

Nizanim...

Berken Bereh: Em helbestvanên kurd, berî ku xwe noqî deryaya helbestê bikin wek miriyê serê wî li kevîrê hedê bikeve hê di ciwaniya xwe de rastî bindestiya xwe tînin. Ev jî dike ku beriya helbestê em dakevin qada siyasetê. Ev jî bi xwe re hezîkirina ji propoganda û sloganan tîne. Min bi xwe di hefdeh saliya xwe de di mitîngekê de wek ajîlator axifiye û bi salan di nav siyaseta kurdî de (çi partî, çi sendîka çi komele...) cih girtiye. Helbet evê çalakvanîyê di helbestvaniya min de xwe daye der û hê jî bandora wê li ser xwe hîs dikim. Her çiqas di serî de vê karîgeriyê ji helbestê xwaribe jî bi demê re helbest derketiye pêş û hefsarê pênuşa min zeft kiriye. Bêguman propoganda û slogan dikare di helbestê de bê kirin, lê divê helbest nebe dûvikê wan. Berevajî helbest bi ciwankariya xwe hêz û quwetê bide wan. Helbest dawiyê de vegotin e, ev vegotin çiqas bi nepen û bi razyarî be jî her xwedî peyamekê ye. Ev peyam li ser ruh û giyanê xwînerî û tevgera ku encama wan e, nexş û mohr dike. Bi kurtî ez dikarim bibêjim ku di her helbesta min de ev xalên ku te li jor rêzîkirine bi awayekî bi cih bûne.

Kawa Nemir: Mirov dikare ji giriyê xwe yê li ser derd û kulên xwe yên tîkildarî welatê xwe sînfoniyeke nemir berceste bike, ku ciyê vê yekê rasterast helbest bi xwe ye. Lê helbesta ku em bikaribin jê re bibêjin, dikare li ber dilên hemû bindesttan û xwendevanên cihanî ezîz be, bikaribe biherike ruhên hemû hemwelatîyên gerdûnê.

Gelo helbesteke me ya bi vî rengî heye piştî 30 salan ku hûn bi wî awayî behsê jê dikin? Ji çend nimûneyên hêja û pê ve, mixabin helbesteke me ya bi wî rengî nîn e.

Heke hûn bibêjin propaganda, bila ew kêrbaz û keçbaz herin bibin endamên hin sazî û dezgehên kurdan. Bila yên kêrbaz herin bibin endamên partiyeke legal î politik. Bila yên keçbaz jî herin bibin endamên sazî an jî komeleyeke çandê, hunerê yan jî xort û ciwanan.

Û jixwe gorepana helbesta kurdî ji vana tijî ye, wisa ye, caran dikim vereşim.

Îrfan Amîda: Helbet her helbestkarekî/e kurd berdevkê van êşan e. Ne helbestkarên kurd tenê her kurdek(!?) berdevkê van êşan e. Ez nikarim kurdan bêtî vî bifikirim. Lê meseleya propogandayê û sloganan parîkî tevlihev e.

Propoganda ne helbest e lê helbest propoganda ye. Propogandaya bedewbûnê, propogandaya bedewtirînê ye. Evîneke bedewtir, mirovekî/e bedewtir, welatekî bedewtir civakeke bedewtir, jiyanê bedewtir. A soxî mirovahiyeke bedewtir. Û di vî çarçoveyê de propogandaya hebûnê ye helbest. Kêlik e helbest ku loma jî ajîstasyon û slogan e. Berdewamî ye helbest ku loma jî propoganda ye. Lewra helbest dîtî û zefkirîna kêlikê ya di berdewamiyê de û jinûveafirandina berdewamiya jî kêlikê ye helbest. Bi vî awayî mîtos e ku her mîtos propogandayek e û tîra xwe bi slogan in. Lê ku helbest bermeqlûb bibe nivîsandin nabe helbest.

Dîtîna sloganîk û ajîtatîf dîtîneke tazî ye lê helbest bi xeml e û dîtîna bi xeml him dîtîneke estetîk e him jî bi bandor e. Heger mirov bi keviya çavan bibîne dê nikaribe estetîze bike. Heger mirov bi perdeya guh tenê bibihîze dê nikaribe estetîze bike. Û a soxî mirov ruhê peyvê nizanibe dê nikaribe estetîze bike.

Welat Dilken: Min carekê jî rêzdar Berken Bereh pîrseke wekî vî pîrsê pîrsibû. Hêja wiha bersiv dabû min; “Kesên ku di ber gel de jiyana xwe danîne ortê,

yan êş û elem kişandine, ger ku helbestekê bo wan binivîsin divê ew helbest wan wekî bîrdarî li her derê bilind bike. Lê ku ez ê nikaribim di helbestê de wan bikim bîrdarî, bo wan çî dirûşmî çî propogandayî nivîsandina helbestê jî bîr û bîranîna wan re bîrêzî û biçûkxistin e.” Ew nêzikahî û pîvan bo helbesta min jî derbasdar in. Ger bo bîrêzan helbest hate nivîsandin divê ew helbest wan camêr û canikan li her qadê bike bîrdarî, ku wê tu carî neyê hilweşandin. Ji derveyî vî, jî bo “nîrxdanên” ku nîrxê xwe yê herî bilind jiyana xwe dane destê felekê, nivîsandina helbestê ne tenê bîrêzî û biçûkxistin, destdirêjî ye jî.

Adorno jî bo kampên Auschwitzê dibêje; “piştî Auschwitzê nivîsandina helbestê hovîtî ye”. Mirov rewşa Auschwitz û Kurdistanê bide ber hev, li gorî vî danberheviyê dê grafîka “helbest-bindestî-qirkinê” çawa be? Şîroveyên we der barê vî yekê de çî ne?

Arjen Arî: Ez bawer im Adorno xwestîye bibêje dê karesateke din bi vî rengî rûnede!

Lê wa ye, xapiya. Newala Qesaban bidîta Adorno, li ser devê Bîrên Asîtê bisekîniya û hestî bidîtina dê çî bigota gelo?

Her kes êşa xwe dijî. Û her kes bîrîna wî pê xuya ye!

Yahûdîyan carekê êşek kişandin, êşiyân... Lê kurd? Hê jî bi êşên xwe re dijîn! Û ev êş hê ne bûye êşa mirovahiye... Ne di qada siyasî ya gerdûnî de, ne jî di warê wêjeyê de....

Ji hêla xweragihandinê ve, kurd çarçûka felestîniyan nakin.

Mîna ku Mahmûd Derwîşekî wan nîn be!

Xwelîserî ev e!

Berken Bereh: Auschwitzta ku di ruh û giyana Adorno de bûye sedema travmayê û rîsta “piştî Auschwitzê nivîsandina helbestê hovîtî ye” lê daye nivîsandin

nîşaneyê zalimî û stembariya însanî ye ku niha jî bi cureyine cuda li dinyayê tê meşandin. Naziyên faşîst hingê bi awayekî aşkere fermana cihûyan dan û bi milyon ew kuştin. Li her deverê dinyayê însan li hember vê komkujiyê nerazîbûna xwe nîşan dan û îro-gelê elman jî tê de her kes vê qirkirinê bi nefret bi birtîne. Mixabin ew neteweya ev zilm dîtî, li hember kirinên desthilatdarên xwe bêdeng dimînin.

Ku em bîr ser neteweya xwe; ev hezar sal in ku neteweya me çî rasterast çî bi awayekî veşarî di bin nîrê dagirkeriyê de dinale. Her roj zarok, xort, jin, çiya, robar... dibin hedefa êrîşên çekdarî û psîkolojîk, çandî û kulturî. Helebçe, enfal, Zindana Amedê... ne kêmi Auschwitzê ne. Ne wek kurdekî, lê her kesê/a ku xwedî wîcdan e, divê bi hemû hêza xwe li hember vê qirkirinê derkeve. Vêca kesê/a kurd û xasma jî helbestvan-ku jî her kesî bêhtir xwedî wîcdan e- divê pênuşa xwe bike mertal jî mirinê re. Hawar û nalîna van bêgunehan ragihîne dinyayê. Lew, her mirin gemarîkirina însanî ye, lewî-tandina "*wîcdana*" wî/wê ye. Her kujer bi qurbanê/a xwe re, xwe jî, civaka xwe jî û mirovahiye jî dike. Tam jî li vir, helbest dikare vê kuştinê rawestîne, bêwate bike, jiyanê derxe pêş. Helbesta kurdî divê bibe berdevka vê kuştin û kirinê dijînsanî. Her helbestek hêja di heman demê de dermanek e bo vê birîna xedar a mirovahiye.

Her berhemeke hunerî bi çî mebestê dibe bila bibe di hundirê xwe de rewş û derûniya civaka xwe dihevine. Her wiha zimanê bi kar tîne jî, ew ziman e ku temsîlkariya derûniya civaka wî dike. Ango her helbestkar ta demekê yek jî nîşaneyê -bi hemû xisletên xwe- civaka pê re mezînbûyî ye. Di helbestên vî tradîsyonê de jî bikaranîna zimanî bigir ta hîzr û ramanê jî xwe daye der. Dîsa şewaz, teşe û rîtm helbestê jî bi gor wê dirûv girtiye. Pergala me ya ne xwedî taybetiyên resen û nîv-desthilatdariya feodalî ya xwemalî,

serhildaneke kelecânî bi xwe re aniye. Helbest bi van xalan hatiye honandin û bi nexşên hawirdoreke teng hatiye şayesandin û xwe negihandiye asoyeke dûr û fireh. Her çiqas tîrêjên zanîneke kûr a encama xwendineke zanistî, helbestê biçirîsîne jî tîra ronahîkirina reşariya bîndestiyê nake. Ev çiraya vîketî jî bo xwenasîn û dîtina kûrahî û mezinahiya birîna me tê..... Ev vegotin û derbirîna rasterê û berevdanî helbet di ruh û giyana xwîner û civakê de dibe sedema guherînan, lê, nezelalbûna asoya pêşerojê karîgeriya wê bi sînor dihele.

Di vî rewşa bi aloz de teqez berpirsiyariya siyaset, hêz û rêxistinên kurdan şayanî vegotinê ye. Ta îro jî van derdorên ku xwedî destlatdariyê ne tu nîrx û rûmet nedane helbesta kurdî. Wek gotina Dîlawer Zeraqî em hê ne "giyayê hewşê" ne jî. Di ser de jî ev derdor bi her awayî mudaxeleyî pênuşa me dike û nahêle bi serbestî tevbigere û bi azadî strana xwe vebêje. Berevajî her helbestvan dixwaze bibe bilbîlek û di daristana netew-mirovahiye de tiştên dibîne û xewn û fantaziye xwe bi coş û perosî vebêje. Ev destêwerdan û biçûkdîtin û biçûkxistina helbestvanan bi xwe re sincekê jî bi cih dike û her helbestvan di mîjîyê xwe de jî xwe re sînoran ava dike.

Wek encam;

Zimanê helbesta kurdî hê şîrê kevnetorî û ya nîv-bajarvaniyê dimije.

Êşa bîndestiyê bi awayekî rasterê tê vegotin û li gor pîvanên hunerê estetik nebûye.

Êşên takekesî, pîrsgirêkên çînî, koçberî, statuya jinê ... tîra xwe nebûne mijarên helbesta kurdî.

Pîrsgirêkên zimên hê didomin û helbest nikare xwe ragihîne hemû beşên civakê yên welêt.

Kovargeriyeke bi rîk û pêk û bêhtirîn pala xwe dayî helbestê saz nebûye.

Ponijîneke resen a li ser pîrsgirêkên cî-

hanî û bandora wê ya li ser bindestiya me û helbesta me nîn e.

Û ji ber kêmasiya van xalan qelsbûn an jî nebûna poetikayeke xweser a helbestvanan.

Têra xwe hayjênebûna kevnatorî û helbesta me ya perçeyên din ên welêt.

Tevî van kêmasî û yên min ji bîr kiri helbesta me bê per û bask be jî difire û hêviyeke xurt dide min û bo pêşeroja helbesta kurdî.

Kawa Nemir: Anne Sextona hevçaxa Sylvia Plathê hê diwartir qala vê yekê kiriye di helbesteke xwe de û wê jî bi xwekuştinê xwe ji rastiya xwe ya aloz rizgar kiriye.

Bi raya min, belê, ji ber rewşa ku kurd tê de ne, divê helbestkarine me xwe bikujin, lê ev xwekuştin bi tenê ji mafê wan helbestkaran e, ku îsma namûsê di pozê wan de heye.

(Mixabin bêgav im bersivên xwe dûrê bidim, ku bi awayekî din ji min nayê!)

Tiştêkî din; ez mîna piraniya kurdan li vê bindestiya me nanihêrim! Bi raya min, kurd rizgar nebûne, ne ku serdestên wan gelekî jêhatî û xurt in, berevajî vê yekê, psîkolojiya kurdan û bindestî li hev banîyane, bi vê potansiyel û zerengiya xwe ya ku bi kar naynin dil li wan hênik û hinek û henek e.

Îrfan Amîda: Ez bawer dikim Adorno nizanibû dê di hembêza diya xwe ya bê bêhn mayî de xwizka zarokên kurd li Helepçeyê di ber wan de bimîne. Ez bawer dikim Adorno digot qey dê xweliya firneyên Hitler di nav sînorên Elmanyayê de bimîne. Ez bawer dikim Adorno bîra bîrên asîtê nedibir. Ez bawer dikim Adorno

gorên bi cesedan xetimî dîtibû lê bîra rûmetên tazî/cesedên tazî yên bi dû tanqên Elmanyayê ve dê bîn kişikîşandin nedibû. Ez bawer dikim Adorno mezelên hevpar dîtibû lê bîra mezelên servekirî nedibû...

Welat Dilken: Ger ku pîvana me bi riya helbestê li ser rûpelên dirokê û di hişê bindest û serdest de “qirkirin û bindestî” wekî daçikandina **bîrdariyê** be, nêvîsandina helbestê hovîtî ye, lê ji derveyî vê pîvanê, li ser vê mijarê nêvîsandina helbestê, bi min qeşmerî ye.

Teyrê helbestê dana Xudê ye û tebîetê mehzûn li gel zarûtiya mirov tê dinyayê. Hindek kes dibêjin ku helbest mîratê babî ye. Babê min tebîeta helbestê hebû, di karî helbestvan be. Belê gelek li helbestvaniyê vêzar bû. Digot di kurdewarî de eger kesek li dû helbestan here dê li şola xwe paşta bimîne û dest bi xarzokiyê biket û her di vê rêkê de jî dê bimire. Digot: Wek Herîqî û Mela Marîfê Kokî ku ev dûyane li nêzik we nasîbûn. Herîqî dema ku mir nanê şevê çine bû bixwe û Mela Marîf li her xoriyekê tişt dixwest. Babê min car û bar kitkit beyt dinivîsîn. Carekê feqiyan nameyek bi helbest bo wî nivîsîbûn û qend û çav lê xistibûn. Ewî jî her li ser vê qafiye û weznê cihaba wan dabû:

Ezîzim şêir û beytî tu gutûte

Hemûy soal û zelilî û hat û hûte

Evey nardim dezanim terkî nakey

Ke xoy bed dijmine dayim li dûte

Mamekî min ku dayika wî û babê min yek e, bi navê Seyid Heme Seîdê Nûranî dostê nêzik ê Şêxê Birhanê bû û melayekî menşûr ku helbestê wî gelek in. Ca min jî

Ez û helbest(*)

Hejar MUKRIYANÎ

Carekê ez digel feqiyekî di rêkekê de diçom. Feqî her behsa helbestên baş û xirab dikir, min xezeleke xwe jê re xwend, gelek kêfa wî pê hat û min got; “Ya Mistefa Begê Kurdî ye”, got careke din jî bixwîne, min careke din jî xwend, her aferîn digot, min got; “helbesta min e” got careke din bixwîne, paşî tif kire erdê û got; “ev kengê şîr e?”

her li zarûtiyê re tebia şêira hebû.

Min taze kore sevadek hebû, babê min diwaneke tirkî bi min dida xwendin. diwana Emîr Elişîrê Newayî bû. Min qet yek kelîme jî ji meneya wê nedizani. Ker li dawetê çawan bû ez jî wisa bûm. Her di zarotiyê de min gelek helbest ezber kiribûn ji tirsê wê hindê ne ku di şerê şairane de kesek ji min bibe û ez bitorînim.

Şevêkê digel çend feqiyên çone gundekî bi navê Xorinc. Kêfa axa xweş nebû dixwest me bike der û dû behaneyan digeriya. Got: Eger hûn digel kurê min şerê şîra bikin ez ê we xweyî bikim û hûn gelek bi xêr hatine. Her çend ez ji hemû feqiyên biçûktir bûm, min singê xwe da pêş û min got: Ez hazir im bi zimanê farisî, erebî û kurdî digel wî şîr bendanê¹ bikim. Bila ew zimanekî bibijêre. Belê kurê axa zor tirsîya û her bi ber min ve nehat.

Ez dikarim bêjim ku li 100 dersxaneyên kurd 90 mijûlî danîna helbestan bûn. Ez jî her wekî wan ketim nav wê behrê. Varik² bûm û min bizarî qazê dikir. Helbestên ku min digotin ji tirsê pêkenîne min nîşanî kesî nedidan. Carekê babê min pê hesiyabû û sed dijûnî min dan. Min hezar sond xwarin ku min ev guneh nekiriye.

Carekê bi helbestê min cihaba nameya axayekî da. Kabira gelek metha min kir û aferîn gote min. Ez bi xwe jî gelek şa bûm te digot ez difirim. Min wisa fikir dikir ku

çi mirîşkan hêkeke wiha duzerik nekiriye.

Rojekê li Sablaxê li mizgeftêkê, li bal Mela Marifê Kokî rûniştibûm. Min gotê mamosta helbesteke taze ji min re bibêje ku ez ezber bikim. Axir min hemû helbestên mamosta ezber kiribûn. Paşê min gotê: Mamosta min helbestek gotiye, ez tîkayê te dikim baş bizane çawan e, eger baş nebe ji ber xatirê min nebêje baş e. Min helbesta xwe ya herî baş ji wî re xwend. Got: Kurê min ew helbest nîn e, here zû bidirîne hindî kesê neditiye û abûra te neçoyî. Min dirand. Paşê got: Ev hemû te nivîsibû yan te ji helbestên xelkê



Hejar MUKRIYANÎ

dizîbûn? Ne, mamosta hemû yên min bûn. Kurê min yêk du beytên wê baş bûn. Eger ev helbestên te bin tu jî rojekê wek min dê ji birsiya bimirî!

Ez teva ku naomêd bûm jî ku heger helbestvanê mezin wisa be ez ê bibim çîk? Bê behs û gotin min agir berda deftera helbestên xwe. Wî zemanî ez li Ûştepe feqî bûm. Rojekê kake Hacî Rehmanê Bayizaxa hat hocrê. Tercîibendek ji helbesteke kurdî xwend. Gelek kêfa min pê hat. Min gelek hewl da ku ez ji ber wê helbestê binivîsim, nehêla û got: Xalemîn ez dame sondê ku ev helbest nekevîte destê kesî. Dema ku ez ji wî bêomêd bûm min bi xwe tercîibendek got. Ev jî her li bal min ma û min ji kesî re nexwend. Çonku min wisa dizanî ku kêrî meclisan nayê. Axirê min ew jî têk bir.

Di bîra min de ye carekê ez digel feqiyekî di rêkekê de diçom. Feqî her behsa helbestên baş û xirab dikir. Min xezeleke xwe jê re xwend, gelek kêfa wî pê hat û got eva helbesteke gelek baş e. Ya kê ye min got: Ya Mistefa Begê Kurdî ye. Got careke din jî bixwîne. Min careke din jî xwend. Her aferîn digot. Min gotê helbesta min e. Got careke din bixwîne. Paşî xwendina min tif kire erdê û got eva kengê şîir e?

Belê paşan ku ez bûme endamê Komelê (JK), Komeleyê gelek hez dikir ku helbestvan hebin ez bi mecbûrî bûm helbestvanê Komeleyê. Ji wê demê ve min naznavê şairiyê ji xwe re hîlbijart bi navê Hejar. Navê hejar bo xelkê nenas bû, dema ku di rojnameya hizbê de çap dibû xelkê wisa dizanî ku helbestên Xalemîn in. Paşê zanîn ku helbestên min in. Bo jîmara duyemîn a kovarê min tenzek³ nivîsî û da Zebîhî ku çap ket fireda û got

kêrî çapê nayêt. Min da Kak Rehman ewî got gelek baş e da Zebîhî û çap kirin.

Têbînî:

⁽¹⁾Ji berhema Çêştî Micêvir; dirustkirina ji bo kurmancî: Seyid Feysel Moctevî

¹Şerê şîir

²Cûcika yeksalî ku taze dibe mirîşk û dest bi hêk kirinê dike

³Gotinê ku serve kenya miriv tinin û piştê derd nişa didin.

Xemzexan

Elîxan LORAN

Ji **Eyê** re. Hew!

Tu yê hil bibî, ez ê dil berdim strana gewriya te

Dibêjim best, kaba min î dilî nî tûşî te dibe

Tenêtiyê dipên ji tela min î xurde û zamorte

Bo bibêjim “Bêdengî” divê bipeyivim

Xemzexan, malek ji çend peyvan pêk tê?

Tu bi min û peyvan tê Xem-

zexan?

Tu li dijî terora folklorê di kurdî de lêkera pêşîn î
Keşfa eyaleteke te ya nû qertafa min î dawîn e

Tirsa min feodal e, gul jî nîn e ez bi xwe bidim
Birjûwazî û ciyawaziya te ergatîvîteya min e

Şewibîn ji tînetiya gewîbûnê ye
Û nanê firnê ji helbestê nayê xwarin Xemzexan

Gulan -09

Ziwan çi yo, çi niyo ? Bi raştî na mijare ser ro zaf çîy ameyê vatiş û do bêrê vatiş zî. Di beyntarê merdim û giyaneyê bînan de di ciyayîyê sere- key estî. Nê ciyayîyan ra yew fikiryayîş û yew zî ziwan o. Qabo ke fikir zî vila bibo, hewceyî bi ziwan esta. Fikiryayîşo ke kesê bînan dir/reyde bare nêbo û beyntarê kesê bînan de vila nêbo bêwate yo. Na zî asta girin giya ziwani ya. Zanayî vanê ke “ merdim bi vatiş bi merdim, bi vajiyayîş bi civat û bi ziwan zî bi şar ”

Şarî bi ziwane xo, ziwani zî bi şarê xo ameyî nasnayîş. Her di bîy nasnameyê yewbînan. Bi ziwan têkilî ameyî ronayîş. Zanayîş ame barkerdîş. Barekerdişî zanayîş aver berd. Aversîyîşê zanayîşî ziwan geş kerd. Şarê bînan dir têkilî ameyî ronayîş. Bi nê têkilîyan şarî yewbînî ra bonder bîy. Bonderbîyîşî bi ziwane xo name kerdî. Goreyê xo ra bedil- nayî. Fikr û bawerîyê xo tewer kerdî. Bi nê zanayîşan ber û ebûr, çand û huner û vermendeyî virazyayî. Dewî û şaristanî ameyî awankerdiş. Zana yiş, çand, huner û vermendeyî bi ziwan û vajiyayîş eresayî nifşanê peyîn- an û na têkilî sero averşîyîşî dom kerd.

Tekiliya beyntarê şaran û ziwani her ca de bi heman awayî aver nêşîy. Şaranê ke ziwane xo pawit şarîtiya xo zî pawite û bîy wayir şaristanî û ristimê xo beradayî axe, tarîx de cayê xo girewt. Bi çand, huner û vermendeyanê xo ameyî nasnayîş. Şayî û şînî, nêweşî û kêfweşî, huyayîş û bermayîş, qewemyayîş û serkewtiş û heme hesekê xo bi xeyalanê xo rengînayî û bi ziwane xo ristî. Nê ristayîşî biy cihokî ,deyrî, destanî, ziwan ra ziwan, lewe ra lewe gêray. Gird bîy teşne girewt bîy ceribnayîş û reyna dekewtî mêjûyê şaran. Bîy zanayîş, bîy kanê awe, êneyî çemî hereknay, çeman golî, behrî dekerdî , juyayîş geş kerd. Nifşê neweyî di nê gol û behran de, bi nê cerebnayîşan pîl bîy û averşîyîşê xo înan sero pêkard. Fina xelekê zincile her nifşî no pêkardiş fina ema-

Ziwan û şar

Xoser WELAT

Şarî bi ziwanê xo, ziwanî zî bi şarê xo ameyî nasnayış, her di bîy nasnameyê yewbînan, bi ziwan têkilî ameyî ronayış, zanayış ame barkerdış, barekerdişî zanayış aver berd

netêke erasna nîfşanî xo ra dime. Bi nameyê xo, bi çand, huner, vermende û mîrateyanê xo nexşê xo tarîx ro dayî.

Ca ca şarî beyntarê di vicînayışan de mendî. Di no vicînayış de Tayine ziwan, tayine zî axe vicîna. Yin ê ke axe vijîna ziwan û çandê xo ra qut bîy. Bîy şarêko bîn. Tayî zî nêşikayî axa xo bipawê, ziwanê xo pawit. Ê nêbî wayir dewelete labelê bi ziwan û çandê xo ameyî heta ewro. Şarê kurdan na ye rê nimûneyêko ver bi çim o. Tay şarê bêsiûdî zî ne şikayî axa xo ne zî şikayî ziwanê xo bipawayê û tarîx ra çîna bîy.

Şaranê ke ziwanê xo vinî kerd, şarîtiya xo zî vinî kerde. Bestoxo ke ê bi vîyarteyîya xo dir gire dayê vinî kerd. Xo ra xerîb bîy. Têkiliya înan bi hu ner, vermendey û mîreteyanê înan ra qut bîy. Êneyê înan, çemî, golî û beh rî înan ziwa bîy. Senî ke dara bêristime nêjûyena wişke bena, senî ke her vaşe tenê kokê xo ser hêşîn bena, senî ke maseyêko golê xo ra vejîya nêjûyeno, kes û şarî zî ke xo ra xerîb bîy ziwan û çandê xo vinî kerd û ko-kê xo ra qut bîy nêjûyenê. Xeleka zincile visyena. No visnayış têkilîyanê vîyarteyan û ameyan qut keno. Vermendey û mîrateyê bab û babpîran nêerasenê nîfşê peyînan.

Di tarîx de nimûneyê naye zaf î. Yeno zanayış ke di riyê erdî de şeş heza rî zîwanî est bîy. Labelê ewro nê zîwanan ra tenê dorê di sey û pancas zîwanî yeno vajiyayış. Yê bînî tay merdê û tay zî merdişî ver de yê. Na zî ye na no wate ke bi hezaran çand, huner û ristayışî çîna bîyê. Bi hezaran çem, gol û behrê jûyayışî ziwa bîyê. Bi hezarê hezaran sehek, xeyal û ce-

ribnayışî vinî bîyê. Bi hezrê hezaran zanayışî vinî bîyê.

Têkiliya ziwan û zanayışî tikiliyêka zafêrî xurt û pêrebestîya. Na têkilî heta astêke bi civato ke miyan de yeno jûyayış, bi çandê nê civatî, bi ceribnayışan û bi vîyarteyî ya nê civatî reyde gîredayî ya. Kabo ke xoserîya na têkilî bêro fehmkerdış, gere persê; zanayış çiwo û senî dest pê keno? Zelal bibo. Zanayış naskerdışo. Naskerdışê der û dorî yo. Naskerdışê esteyan o. Naskerdış bi namekerdiş dest pê keno. Namekerdiş zî bi çekûye beno. Çekûye binikeya zîwanî ya. Ke ziwan çîna bo, zanayış zî aver nêşîno. Merdim ke esteyan der û dorê xo de vînenê, verênî înan name keno. Estey bi namekerdiş di mêjûyê merdimî de mayinde benî. Zêdebiyayîşê

Çekûyan di mêjû de himê zanayışî pêk areno. Dime ra zî têkiliya beyntarê esteyan de hêdî hêdî xo dest dana. Zanayışo rastîn fehmkerdışê ney têkilîyano. Goreyê kerdış û rogeyrayişê zanayan kes başêrî bi ziwanê xo yo makî, têkilîyanê beyntarê esteyan fem keno û mûseno/bonder beno.

Şirketên Harlequînê yê ku navenda wan li Torontoyê ne, ji 1958'an pê ve (ku destpêka weşankariya wan e) serkeftîneke gelek mezin bi dest xistine. Mînak: di 1977'an de, li Amerîkaya Bakur xwedîyê ji % 10'ê piyaseya pirtûkan bûye, tenê li wê bejahiyê 100 milyon, li welatên wek Îsrail, Almanya û Holandayê jî 50 milyon pirtûk firotine. Her wiha romanên xwe herî kêr li şazdeh zîmanan werdigêrînin û li tevahiya dinê belav dikin. Hêna

bi salan berê, 140 jinên brîtanyayî, nivîskariya vê şîrketê (Harlequînê) dikir ku; tê gotin, xwendevanên wan jî jinên di temenên cuda cuda de ne. Her wiha her heyvê dozdeh pirtûkên nû derdixin piyaseyê û tevê wan di market û supermarketan de tîn pêşkêşkirin. Her wiha ev pirtûk jî hêla TV'yan ve jî bi reklaman tîn nasandin. Jixwe pirtûk jî buhayê piyaseyê erzantir tîn firotin. Bi vî awayî jî her romana Harlequînê dibe "bestseller" ango "ya ku baştirin tîn firotin". Jixwe şîrket pirtûkan dixê nava (bi nimreyên promosyonê) qutiyên deterjanê jî. Ango jî bo ku pirtûkên xwe, romanên xwe bigihînin her kesî/ê û her malê, çî pêwîst be dikin. Her wiha tê şîrovekirin ku bestsellerbûna romansên Harlequînê pileya xwendekariya jinan dide diyarkirin. Lewre nivîskarên vê şîr-

ketê jî, xwendevan jî jin in, an jî herî zêde jin in.

Weşankar jî nivîskarên xwe re vê nivîsa standart dişînin: "Romansên Harlequînê, romansên xurt in ku mijarên wan baş hatine hilbijartin û bi encamên bextewar bi dawî dibin. Bi nêrîna lehenga jin û jî devê kesa yekjimar a sêyemîn tîn vegotin. Dibe ku hêmayên razdar an macerayî di naveroke wan de hebin lê divê ew jî girêdayî mijara romanê bin. Bûyer di roja me de tîn jiyîn, lê bi şertê ku otantîk bin, dikarin li deverên dinyayê yê din derbas bibin. (1) Her pirtûk li dora 178 rûpelî ye û formul hema hema eynî ye, ango; jina ciwan, naşî feqîr an jî nîvzengîn, rastî mêrekî qeşeng, bihêz, xwedî tecrube, zengîn û deh, pazdeh sal jî jinikê mezintir tî. Nê-

Şiyayîş

Nesrîn NAVDAR

Warika min bieşkayne
ino bajar biverdayne.
Bişîne û ez hey bişîne,
aşman ra nîsan,
verniye min de koyêke berz,
vewre serê ê belek belek bayne.
Dimara ez rûniştêne
serê çayirê hûtini de.
Min paşte xun biselebnayne darêke bihîve.
Miyanê pelanê ya ra vilê gulhan
bibîne tacêke sipeye,
zege wextê tûtîtiye min,
serê serey min de bayne.
Warika min serey xun wedartêne
û ez bişîne
ver bi qoryanê ma wa.
Wexta hewayke serdinî
lemê velgan şay tî
û tevizikî di canê min de vîyarnay,
awo ge verê min de rûnişte, ti bayne.
Dimara, hema vartêke nermike
hewahîşê ma bikerdêne hî
û tûtîtiye ma zî,
tedir ageyrayne.

Xwendineke femînîst:

Romanên Harlequînê

Mizgîn RONAK

Di formula hişk a her romana Harlequînê de, mêr timî jinê şaşwaz dike û henekên xwe pê dike, lê di dawiyê de dibîne ku ew jin 'ne wek jinên din'e

zikatîyên wî timî jinikê şaşwaz dikin; lewre tevî ku bala wî li ser wê ye jî, bi awayekî qure, dijminanî û heta hovane ne. Lê di dawîya romanê de tevahiya şaşfêmkirin ji holê radibin û lehengê mêr, evîna xwe ya ji lehenga jin re îtiraf dike û tê dîtîn ku ew jî jê hez dike.

Bêguman ev formul bi qasî romanê bi xwe kevn e. Lewre Pamelaya Samuel Richardson ku tê de behsa xidameke ku paşê bi mêrê wê re dizewice dike, wek ku ji aliyê gelek rexnegiran ve hatiye peyî-tandin, 'dayika' romanên jinan ên popu-ler e. (2)

Di reklamên TV yên ku ji bo Romansên Harlequînê hatine pêşkêşkirin de, jineke navsere li ser cihê xwe vezeliya ye. Di destê wê de romaneke Harlequînê heye ku wê wek 'maceraya veşartî' bi nav dike û hewl dide ku wê bijî! Ev reklam rastiya van romansên baş pêşçav dikin. Jixwe tê dîtîn ku jin, ji ber derd û kulên dinyaya rastîn, 'direvin dinyaya xweş ya roman-sên Harlequînê.' Ango bindestiya jinê dike ku jin xwe bispêre van romansan, xwe bi wan 'rizgar bike.' Mixabin di van romanên de jî, lehengên jin, bextewariyê encax; bi xwefedakirinê, xweperişandinê û bi bin-pêkirina xurûra xwe, heta bi fedakirina ji-yana xwe bi dest dixin. Loma jî analîzeke baş a dînamîkên pêvajoya xwendinê dide diyarkirin ku xwendekar, ber bi tevlibûna îxanetkirina li xwe ve tê kişandin. Her wiha şîrovekar dibêjin ku; "romans, ji jinan re dibêjin ku hûn ne mecbûr in timî şiyar û fedakar tevbigerin, an jî xwe wek

Jane Eyre ji ber newekheviya di navbeyna wê û Rochester de xwe timî bikişîne nav xwe, bêhizûr bin, neçar bin ku wî (Roc-hester) bi awayê herî baş mijûl bikin. Dij-berê vêya romansên populer dibêjin ku gengaz e jin karibin bigihîjin jixweçûyîn û xwejbîrîkirina ku bîrdoziya evîne wed dike bextewar bibin. Şîrovekarên Romansên jinê, li cihê ku kifş bikin ka ev romans çawa jinê hepsî rewşa wê ya heyî dikin, behsa "mazoşîzma jinê" ya di wan ro-mansan de kirine an jî tenê behsa ban-dora bîrdoziya serdest a nêrane kirine. An jî wek Geramîn Gren ramiyane û ji bo mêrek ku romanên jinan ên populer wan mengî dikin (îdîalîze dikin) wiha gotine: "Eviya lehengê ku jinan ji bo xwe hîlbjar-tiye ye. Jinan teybetmendiyên di wî de kifş kirine, bi zincîrên esareta xwe mezin kirine, daraştine. (3)

Di formula hişk a her romana Harle-quînê de, mêr timî jinê şaşwaz dike û he-nekên xwe pê dike, lê di dawiyê de dibîne ku ew jin 'ne wek jinên din'e. Mîna-kek li ser şaşwazbûna jinê: "Berê xwe dayê û bi dengekî nizm got "tu kî yî?" Tiliyên wê yên bêhêz, ji bo ku vê pirsê ku ji bo wê pir gi-rîng e bi zîlam bide hesandin, bi milê wî girt. Hîs kir ku masûlkên zîlam ên hişk û xurt ên di bin qumaşê tenik de sist dibûn. Hingê tevahiya bedena wê hêdîka lerizî. Yê li hember wî dost bû yan dijmin bû? Nikaribû vê jî bîne bîra xwe. Dibû ku her du jî bûya". (4)

Jixwe hêmayên nêrane ne tenê di ro-manên Harlequînê an jî Gotîk (em ê paşê

wan jî bigirin dest) de, lê di tevahiya romanê de bi awayekî navendî cih digirin û jixwe jî navên romanê jî naveroka wan xuya ye, mînak: “Yarê ku neyar e, yarê zordest, evîndarê derewçîn” û hwd. Her çiqas di Harlequînan de lehengê mêr wek ên di romanê Gotîk de ‘kujer, an nexweş’ nebe jî, pir çors e û zordest e, mînak: “Lê niha şil bûbû cemidibû û dereng mabû, bi ser de pir ditirsiya jî. Wekî ku ev tev ne bes bin, ew zîlamê adî, cihê ku jê re alîkariyê bike, li ser serê wê hişkêling sekinibû. Herhal halê wê pir xirab bû, wek quqlayek ku li kêleka rê di erdê wer bûbe” (Goblîn) mînakek din: “Dawiyê gihîştin hesreta xwe, tam hingê ji ber bêfêsalîtiya xwe tiliyên xwe êşand. Qijîna ku jê çû li xemsariya zîlam qelibî, xema wî nebû lê kete şikê ku hinek be jî bala wî kişandibe. Paştîliyên xwe yên ku diêşîyan ber bi lêvên xwe ve bir û bi rûdaneke sîtemkar li zîlam mêze kir. Zîlamê ciwan, li erebeyaya xwe ya xisardîtî mêze dikir, lê berê xwe jî nedida erebeyaya wê.” Û mînakek din: “Di wê nevberê de bêtî ku sedema wê fêma bike, têgihîşt ku zîlam kenê xwe pê dike. Çavên wî li ser bedena wê digeriyan, ew dipîvandî lê bi kêf diçirîsîn.” Wek ku tê dîtîn, serdestiya zîlam ya li nava jiyanê di nava romanê de jî heye. Loma jî bi çavê tiştêyek (nesne) li jinê mêze dikin, heneken xwe pê dikin û tenezul nakin baldariya ku pêşkêşî erebeyên xwe dikin, pêşkêşî jinê bikin. Her wiha ew timî hêzdar û şiyar in, lê jin timî qels, tirsonek û bêbiryar in. Lê ya xirab ew e ku xwendevan jî tevî ‘vê şanoyê’ dibe, rewşa zîlam a bi vî awayî asayî dibîne. Heta li bendê dimîne ku ka dê lehengê zîlam kîngê evîna xwe ya jî jinê re pêşkêş bike û vê carê jî wê bi evîndariya xwe şaşwaz bike û teslîm bigire. Ango xwendevan jî vî halê zîlam memnûn e, lewre dibêje qey ev çorsîtiya zîlam, ji evîna wî ya mezin e.

Bi vî awayî jîna di romanê de careke din jî tê biçûkxistin, lewre wek di jiyanê rastîn de, dîsa zîlam kirde ye, çalak û balkêş e, lê jin pasîf e, tişte ye, hêjayî baldariyê nayê dîtîn! Û ev rewş jî wek di ji-

yana rastîn de jî ‘asayî’ tê dîtîn ji hêla xwendevanan ve. Jixwe jî vê yekê re tê gotin “dafikên vebêjinê” anga ew vebêjin tiştên çewt û zordest jî, ji xwendevan re wek ‘rastîyan’ dide diyarkirin û wî/wê dixê dafikê! (Divê em şiyar bin, an na em ê bikêvin gelek dafik û kemînên vebêjinê jî.) Niha çend mînakên di vê derbarê de; “Mêrê ciwan qure û bêwijdan bû, çi bixwesta bi dest dixist, lê di kûrahiya kesayetiya wî de hestên wî yên rastîn bi tevahî tevlihev bûn.” (Chate) ji pirtûka bi navê Lesson jî mînakek: “Zîlamê dinyayê yê herî baş jî, zalimek bêînsaf bû. Vê yekê ew kêfxweş nedikirin, zewq nedida wan, tenê divêtiyek mêrbûnê bû”

(John Luîs Berger di pirtûka xwe ya bi navê Ways Of Seeing de dibêje; “Ji bo ku jin timî “di bin çavan” de ye, kesayetiya wê dibe du perçe, lewre jin jî timî li xwe mêze dike. Êdî bi çavên ên dervayî xwe, xwe dibîne... Dema ku li odeyekê dimeşe, ji mirina bavê xwe re bigirî jî, nikare xwe nebîne, li rewşa xwe mêze neke. Hîna ji zarokatiya wê de tê hînîkirin ku xwe timî di bin çav de bigire û li xwe mêze bike.” Ev peyitîn di gelek roman(s)an de tê dîtîn. Lehenga jin timî xwe ‘di bin çav de’ dihêle, bi çavên zîlam li xwe mêze dike û perîşanî û têrnekirina xwe dibîne. Jixwe nêrînên zîlam jî timî li dora wê, li ser wê ne, nêrînên zîlam ên ‘tûj û kujer’ an jî yên ku wê dilerizînin û bandora xwe li ser çêdîkin ji hal û mecal dixînin... Her wiha dibinçavdebûna jinê bi awayek din jî tê dîtîn, wek; “Pamela” Samuel Richardson ku ji odeya biçûk ve lê tê mêzekirin lê haya wê jê nîn e. Ango jin sê car ‘tê dîtîn’ hem ji hêla zîlamê li hember û li derdora wê, hem ji hêla çavên zîlam ên ku di kesbûna wê de ‘bi cih bûne’, hem jî ji hêla zîlamekî ku xwe li ‘dereke’ vedişêre û bi dizî lê mêze dike. Wek ku Berger dibêje: “Mêr li jinan mêze dikin, jin dibînin ku li wan tê mêzekirin” û ji ber vêya jî nikarin bi xwezayî tevbigerin, tam di vê xalê de nivîskarên romansan careyek wiha dîtine, mînak dîsa ji Pamela: “Mr B. xwe vedişêre û dibîne ku dema Pamela tenê dimîne çawa bê fen û

fût û zarokane tevdigere.” Bi vî awayî em dikarin behsa rewşeke jinan a din jî bikin. Mînak: “Zachary serê xwe hejand û Got: “Jenry, Jenry, hêdika! tu min şaşwaz dikî. Tu nîvî jin, nîvî zarok î û teqtîkên ku bi hev nakevin dimeşîni. Ku te encama vana zanibûya, tu yê pir şaş bibûyayî.” (Haven). Mînakek din jî Coptîve, dîsa lehengê ‘me’ dibêje: “Wê şeva ku tu yekem car, bi berf û baranê şil bûyî hatî Merîngtonê, te ez şaşwaz kirim. Tu ne li ser hişê xwe bûyî, ez têgihîştîm ku ez beriya hingê rastî tiştêkî wisa şêrîn û dîlkêş nehatibûm.” Ango, jin ne wek mirovek sertanpê, kesek azad û gihîştî, lê wek ‘zarokek’ ‘tişteke dîlkêş’ tê dîtin û di romanên mijara nivîsê de jî wiha cihê xwe digire. Em bi jêgirtineke din a jî Berger vê xalê bi dawî bikin: “Yê ku di nava hebûna jinê de ye û lê dinihêre, mêr e; ya ku lê tê nihêrîn, jin e. Bi vî awayî jin, dibe tişteyek, bi taybetî tişteyeke dîtinê, dibe xuyangek.”

Wek ku tê dîtin, mijar berfireh e, lê em ê bi şanîdana çend xalan, derbasî romanên Gotîk bibin. Wek peyîtîna Berger, du ‘alî’ hene:

Yê ku mêze dike

- * Serdestî, hêzdarî
- * Dûrbîna entelektuelî
- * Xwendevan (xwendin û nêrîn)
- * Vegotina ne takekesî
- * Asayîkirina nakokiyên
- * Mafdarî û vîndariya leheng

Ya ku lê tê mîzekekirin

- * Nezaniya jinê
- * Nasnameya hestiyar
- * Pasîfiya jinê, tîrnekirina wê
- * Xwejîbîrkirina wê
- * Pejirandina neçariyên vegotina takekesî

Nîseyên vê beşê: 1. The Writer's 1978 Yearbook / 2. Pamela's Daughters / 3. The Female Euruch / 4. Hold Me Captive.

Romanên jinan ên Gotîk

Wek Harlequînê, jî hêla heman weşan-

xaneyê ve nayên çapkirin û firotin. Jixwe formula Gotîk wek a Harlequînê hişk nîn e. Peyva ‘Gotîk’ bi wateya ‘nezelalbûnê’ tê bikaranîn. Jixwe roman(s)ên Gotîk, bi aliyekî xwe dişibin romanên klasîk ên dedektîfîyê, jî aliyê din ve jî dikarin bişibin ên Harlequînê. Editoreke Gotîkan rasterast wiha dibêje: “Xitabî jinên ku bi hin zîlaman re dizewicin û paşê tê derdixin ku ew zîlam xerîb in, dike. Di vê rewşê de, dîlkêşî û tamsarî, tîrs û evîna ku di heman demê de tê jiyîn heye. Piraniya Gotîkên ‘saf’ hewl didin ku yar an jî zîlamek dikare bibe an jî nebe an jî kujer, zîlamek/ya-rekî qeşeng, dîlkêş, di ramanên xwe de bi cih bikin. Dixwazim çavkaniya vê jêgirtinê bidim xuyakirin, lewre bîlkêş e. Nivîskara femînîst a navdar Joanna Russ, bi pirtûka xwe ya bi navê “Somebody is trying to kill me. I think it's my husband.” The modern gothic, anglo, Gotîka modern: “Yek dike ku min bîkuje û ez dibêjim qey ew mêrê min e.” Navê pirtûka wê tenê jî rastiya wan ramanan dide ravekirin, lê em ê bi mînak û kurteşîroveyan nivîsê bidomînin. Pirtûkên Gotîk dikarin jî bergên (qapaxên) xwe bîne nasîn, mînak sûret an jî wêneyên li ser wan wiha ne: Keçeke ku fîstaneke dirêj û bi qolayê nepixandî lê ye, li ber şato yan jî qesrek bi kaswet sekinî ye. Atmosfer tarî û bi firtone ye û keça ku wek xeyalekê dixuyê tîrsiyaye (jî sêhra wê xuya ye ku tîrsiyaye).

Di Gotîk de lehenga jin belkî jî bo ku dibe bûka wê derê an jî bi sedemek din diçe wê malê, paşê dikeve gola tîrs û şikan an jî hewl dibîne ku waye aşîqî qatîlekî bûye. Dikeve şika ku mêrê wê jina xwe ya berê kuştîye (wekî ku di pirtûka Ajane Austen a bi navê Nortmanga Abbey de Catherine Marlandi jî General Tilney dikeve şîkê. Jan jî vê yekê bi dibetîyeke mezin jî wê bîkuje. Her wiha lehenga jin jî wan şîkên xwe aciz dibe, dixwaze bi xwe bide bawerkirin ku mêrê wê yekî baş e û jî bo ku jinek neçar e mafê wê yê şîkê tune ye û hwd. Ango derûniya wê timî tevlihev e. Timî di nav gerîneka erênayê de ye. Jixwe di dawîya romanê de tê dîtin ku

mêrik mehsûm e û sûcdar yekî din e. Ev encam jî bêwateyî, tênekirin û çewtiyên jinê dipeyitîne!! Wekî ku tê dîtin di romanên Harlequînê jî, yên Gotîk jî, heman navrok heye: Dinyayek ku mêr tê de jinan biçûk û bêqîmet dibînin û şaşwazî û tîrsa jinan a jî wan. Lê ferqek jî heye, di romanên Harlequînê de hestên lehenga jin jî tîrsê vedigere evînê. Lê hestên lehengên jin ên romanên Gotîk jî evînê vedigerin tîrsê, wekî lehenga pirtûka Rona Randell (Navê pirtûkê Dragon Med e): “Ya girîng ew bû ku evîna min bûbû tîrs û xof, lê min dizanibû zewaca min êdî bi dawî dibû.” Li aliyê din hin nivîskarên jin ên wekî Ann Radcliff bi romanên xwe xwestine ku jinan li hemberî tîrsê hişyar bikin. Mînak lehenga jin a romana Radcliff a bi navê The Mystries of Udolpho wiha dibêje: “Emily bi bişîrenekê got: Ez dizanim”. Tevî qesrên kevn bi cin û perî ne. Ez jî cihekî tijî mûcîze tîm. Lê mixabin, piştî ku ez jî wir hatim, min hema bêje tevahiya raveyên wan mûcîzeyan bihîst.” Di vê mînakê de em dibînin ku jin bi awayekî hêzdar behsa paşeroja xwe dike. Tîrsa wê şikesîtiye û hinekî bi xwe bawer e jî. Lê em di romana bi navê Afternoon (kurtasiya navê wê) de rewşeke din dibînin: “Di dawiyê de ahîzeyê tarî cihê xwe li xuyanga wê ya bêdeng û mehsûm mîzand. Bihîstibûn ku mirovên li wê derê jî her tiştî û her kesî dikevin şikê. Sond dixwarin ku tiştên nebûyî bûne. Şeydatiya wan jî daxwaza wan a kûr a jî bo evînê dihat... Qêrînek bêdeng jî nava wê bilind bû. Destên xwe bi argûşkên xwe ve dewisand û got “çî bi min tê?”. Ev mînak, ev derûniya lehengên jin, jî me re behsa zewacên tarî jî dîkin. Zewacên ku xeyalên jinan ên qîzanî û ciwanîyê dixwin û jiyanê li wan dîkin dojah. Wekî vê mînaka jî Manfreya “ji bo Harriet Dalvareyê malîkaneya Manfreya timî bûbû bandeva bextewarî û şahiya jiyanê. Heta ku bûkanî nehat Manfreayê tu tişt der barê dîroka malbatê ya veşartî û tijî xiyamet, dexesî û kuştin de nizanibû.” Ango jinên van romanên timî saf in, jî rastiya jiyanê bêhay in. Heta ku nekevin nava

tor û dojahên tewre tewre, şiyar nabin. An na dê lehenga jin a Dragonmedê, çima wiha bigota: “wek ku jî her quncikê odeyê bêbawerî bi ser min ve dihat, bêbaweriya li hember tevahiya kesên jî vê malê... Min xwe wek kêzikeke mesûm a ku ketiye tora tevnepirîkê hîs dîkir. Tevnepirîkê tevahiya tiştên li dor min kom dîkir û dixwest ku min bi benên tevna xwe bifetisîne.” Belê çawa ku jin di jiyanê de bindest e, nîvmirî ye, jankêş û perîşan e, di romanên mijara gotinê de jî wisa ye (di tevahiya roman û fîlman de jî) timî wek çivîkeke baskşikestî û qefeskirî ye, bêhizûr e, bêhêz û bêvîn e. Timî birîndar e di tariyê de ye; tariya ku mêr bi serdestiya xwe çêkiriye û wê bi xwe jî reştir kiriye. Niha jî em guhê xwe bidin dengê lehenga pirtûka kurtasiya wê jî Spîndrîft e: “Min bi endîşe lê mîzand, lewre çîroka min û ya Zeniya diket nava hev... Ez jî wek wê xistibûm dafikê.” Çima wiha dibêje? Ji ber ku li jineke ku jî derdê mêr û malê dîn bûye mêze dike û di neçariya wê de xwe dibîne. Di neçîrbûna wê de. Lewre jin timî bûne ‘nêçîr’ jî neçîrên neçîrvanên fenek, zexel û zordest re! Belkî loma navê jinan ‘kew e, kevok e, qumrî ye, xezal e...

Niha em li mînakeke din binêrin ku ew jî xwefedakirina jinê ya jî bo mêr û malê ye. Di pirtûka bi navê Monk’s Cowt de jinik, jî bo ku mêrê xwe yê ku dîl ketiye destê xaçperestan rizgar bike jêkirina her du destên xwe dipejirîne û her du destên xwe dide jêkirin! Em tewreyên vê xwefedakirinê di jiyana rastîn de jî di wêje, roman de jî bi her awayî dibînin. Em niha jî heman pirtûkê mînakeke din bidin ku lehenga romanê bixwe tîne ziman: “Cathrine, Catherînaya ku xwe li wê dirêj kiriye, Cathernaya wêrek. Heta dawiyê jî her hêlê ve wêrek. Ji fedakirina di her tiştên xwe yên di ber evînê de tirsîyabû?... Çawa bi kûrahî, bi bengî; hem bi giyan û hem bi bedena xwe aşîqê wî bûbû. Her du destên xwe wenda kiribû. Ew her du dest bi dîlxwazî û viyan hatibûn fedakirin. Çawa karibû tiştêkî wiha bike? Ev xelateke jî jiyanê hêjatir, xelateke bêhempa bû...”

Bi vî awayî ez ber bi dawîya vê nivîsa ku bi gelek jêgirtin e ve diçim. Dibêjim qey dê vê nivîsa ku min piştî sûdwerigirtina ji pirtûka hemzayenda xwe Tanîa Modleskî nivîsand, di warê xwendina jinanî, xwendina femînîst an jî xwendina azad de bibe destpêkek. Lewre awayên xwendinê gelek in. Lê ji bo ku em kurd di vî warî de wek zarokan in (di gel ronahiya Xanî û Goranan jî, mixabin!) an me hay jê nîn e yan jî em hinek bi korkanî dixwînin û dikevin 'dafik û kemînên vegotinê'.

Wek gotina dawîn: Dema ku ez wek xwendevanekê ketim nava gola roman(s)ên Harlequîn û Gotîk, min got "xwezî romanên me jî hebûna di nava vê golê de û min cih bida jêgirtinê ji wan jî." Lê mixabin... Dîsa jî stêrkên romanên me jî yeko yeko pê dikevin ez ê hewl bidim ku carna xwendinê xwe bi vî awayî be jî, bi we re parve bikim. Heta ku jin ne azad be dê wêje, roman azad nebe!

Li Tirkiyeyê mînaka weşangeriya ku dişibe vêya, Gelîşim Yayinlari ye ku demêke dirêj benê pirtûkan di bin navê Beyaz Dîzî de diweşand û wan pirtûkan taybetmendiyên Harlequînê di naveroka xwe de dihawandin. Mînak Gelîşim Yayinlari jî wergerên (tercumanên) van romanên ku xîtabî jinan dikirin re nivîsek şand û xwest ku wergêr, 'zimanekî nerm' bi kar bin. Ji bo ku rastî sansurê neyên 'sehneyên evînê' hindik bikin an biguherînin, li cihên ku 'she' û 'he' pir derbas dibin, lehengan wek 'mêrê ciwan', 'jina ciwan' bidin nasîn. Wek ku dê bi lêkolînekê karibe were dît in ew Beyaz Dîzî jî li her derê; li bayiyên rojnameyan, li bufeyan, li pirtûkxaneyan û hwd. hatine firotin.

(1)The writer's 1978 Yearbook / (2) Robert Palfrey Utter, The Female Eunuch

Di wêjeyê de, carinan kar û berhemên herî baş di demên ku mirov napê de pêk tên û diafirin. Her wiha, weşandina yekem romana bi kurdî ya bi navê Şivanê Kurmanca ligel veçapkirina orijînalê wê jî

yek ji van karan e. Û xebat û lêkolîn û amadekariya Mustafa Aydoğan jî hêjayî şabaşê ye.*

Dema vê çapa hanê jî, yek ji wan deman bû ku min nedipa. Û ne tenê hîs û ramana qedirgirtineke bêhempa di min de çêkir; di heman demê de bi xwe re gelek nîqaşên ku -der heqê destpêkî û yekembûna romana bi kurdî de bû ku bi giştî li ser gotin û dahkên Mehmed Uzun diqewimîn- berê ji aliyê nivîskarên li diasporayê ve dihatin kirin jî anî bîra min ku; bîyî ku sînorekî diyarkirî ya vê nîqaşê hebe, demekê domand û wekî ku ji ciyekî nepen pîfek li agirê vîxistî hatibe kirin, nîqaş lepira rawestîya.

Belkî jî sekinîna nîqaşê baştir çêbû. Ji ber ku hin tişt derneketibûn mexderê û av zelal nebûbû. Ez jî tê de gelekên ji me, me baş fam nedikir ka sedemên nîqaşê heta ku derê wêjeyî ne, heta ku derê kesane ne, heta ku derê rika salan e û...

Îcar bi sedem û boneya vê çapê, ez ê di vê nivîsê de hewlê bidim ku li derveyî van nîqaşan û di awir û biwareke dîtir de hin tiştan bibêjim û darî çavan bikim.

Erebê Şemo, zimanê ewil ê Şivanê Kurmanca û dema nivîsandina wê

Ji bo dema nivîsandina Şivanê Kurmanca, ji aliyê amadekar ve lêkolîneke kronolojîk û dîrokî gelek baş hatiye kirin û bi berawirdkirina dem û wextan, amadekar bi pêşekê bi me dide famkirin ku tevî ku "*parçên jî Şivanê Kurmanca di sala 1930yî de di kovara 'Grakan dirêrûm'ê bi ermenîkî de hatiye weşandin û di sala 1931ê de beşên wê yên pêşîn bi Rûsî û di sala 1933yan de jî wersiyoneke wê ya wergera Elmanî hatiye weşandin*" ** jî, "*Şivanê Kurmanca wek pirtûkeke temam cara yekem bi Kurdî û di sala 1935an de hatiye weşandin*." **

Ez jî dilê dilan, bi hişê xwe yî analîtîk û ji kûrahiya bîra xwe li ser dît in û peyta lêkolîner im û bi parçedîtineke xwe dixwazim tevkarî li dîtina wî bikim:

Şivanê Kurmanca û di biwara moderniyê de nêrînek li gerdîş û destpêkiyê

Dilawer Zeraq

Ger em ji awirê wêjeyî û zimanî de lê binêrin em ê bi giştî bi peyta lêkolîner re bin. Ma ne wisan e? Erebe Şemo ne bi kurdî, lê bi giştî bi rûsî (an jî bi ermenîkî, yan bi tirkîya osmanî) perwerde dîtiye û ne mimkun e ku di romaneke bi ermenîkî (an jî bi rûsî) hatî nivîsandin de –ku pê perwerde bûbe– ji hemdê xwe zêdetir hevokên gotinkî (axaftinkî) bi kar bîne. Her wisan, kîjan nivîskar dibe bila bibe, gava bi zimanê ku pê perwerde bûye tekstekê binivîse, ne mimkun e ku bi temamî bi hevokên gotinkî binivîse û di ‘radeya ku mirov karibe bêje qet tune ye’ de gihanekê bi kar bîne.

Gava mirov bala xwe didiyê, di romanê de ji bo bihevghihandina du yan jî sê hevokan pir hindik (hema bêje qet) gihanek hatine bikaranîn û roman bi hevokên kurt û gotinkî hatiye nivîsandin. Ev jî bi me dide nîşan ku roman cara ewil bi kurdî hatiye nivîsandin.

Û wekî di jî, ger roman cara ewil bi ermenîkî (an jî bi rûsî) hatibûya nivîsandin û dûre li kurdî hatibûya wergerandin, diviya zimanê wê yê nivîsandinê yê gotinkî (axaftinkî) ev qasî aşkera û beloq nebûya. Yanê diviya bi rûsiya (an jî ermenîkiya) bilind a wê gavê bihata nivîsandin û wergera wê jî dê li gorî bilindiya zimanê resen û orîjînal bihata kirin (an jî ger kurdî têra wê wergerê nekira jî me yê tê de hewla ve yekê bidîta).

Gerdîş û destpêkîbûn

Gerdîş (kevneşopî), demajoyeke dîrokî ye, ku ji rabirdûyeke nediyar heta roja îroyîn hatiye û bi temamî ji dest-têwerdane jiyani û ji hêmanên banekî yê pratîzekirî, yê civakî, siyasî û bawermendî,

pêk tê. Ji ber vê yekê jî, gerdîş hişûbîrek e, bi taybetî ‘hişûbîreke pêkveyî’ ye û her wekî Giddens jî gotiye, “Ger pêkanîn an jî baweriyek gerdîşî be, berxwedêriyeke gelek xurt li hember derbên guherîn û veguherînê nîşan dide.” ****

Ji ber ku gerdîş tevahiyeke banekîyan e, bi tenê tiştên ku di civakê de hatine kirin nanimîne, tiştên ku divê ji niha û pê de bîn kirin jî dinimîne.

Gerdîş wisan bi hêsanî nikare ji holê were rakirin, ji ber wê divê ji dema niha de car dî bê avakirin. Û divê banekîyên gerdîşî ji tevahiye bîn veqetandin, ji ber ku dibe ku banekî di roj û demekê de bibin dirûv û pêkanîneke kesane ya jiyana rûtîn û timwekhev.

Û gerdîş di her qonax û dema pêkanîna xwe de, ne destpêkî ye. Ji ber ku çî dibe bila bibe û bi çî awayî dibe bila bibe, di dem û kêlî, şert û mercên pêkanîne de, car dî berê me dide destpêka nediyar û pêkhatina banekîyên di destpêkê de. Her wiha, di vî warî de, Giddens jî, pala xwe dide têgiha Eric Hobsbawm a ‘Gerdîşa îcatkirî’ û dibêje, “Her çiqas navenda avabûnê gerdîş e jî, jêderka wê ne girîng e. Û hemû gerdîş hatine vedîtin û îcatkirin.”

Tevî ku xwedî destpêkeke nediyar e jî, gerdîş tim û tim cudatîyê dixê navbera ‘yê di hundir de’ û ‘kesê dîtir’; lewre hebûna ‘kesê di hundir de’ dibe sedem ku tev li rîtûelê bibe. Gerdîş li ser kesên li hundir ferz dike ku ji ‘yên dî’ bîn veqetandin. Û Giddens jî civakên ku hebûna ‘kesên dî’ qebûl nakin, wekî ‘civakên gerdîşî’ bi nav dike. *****

Di biwara moderniyê de Şivanê

Kurmanca û destpêkîbûna wê

Berî ku em qala (ne)moderniya Şivanê Kurmanca bikin, divê em bi kurtasî be jî bersîva pirsên wekî, ‘modernî û modernbûn çi ye, li gorî çi tê famkirin, çi ye ya ku berhemeke edebî dike modern û ne modern?’ bidin, da ku em karibin xwe ji hin ferasetên şaş ên der heqê modernbûn û nemodernbûnê de dûr bixînin û bi hişekî zelal rewşê binirxînin.

Modernîzma di wêjeyê de, di demajoya şertên civakî yên nû û pêkhatina civaka sanayiyê de derketiye holê û ji ber ku jiyana gerdişî têra mirovan nekiriye, hê bêhtir derketiye pêş. Û tevî vê yekê jî, modernîzma wêjeyî, ji destpêkê de rexneya pergala jiyana nû ji di hundirê xwe de he-wandiye.

Her wiha baş tê zanîn ku, têgiha ‘netewe’ zarokê esasî ya ‘modernîteyê’ ye. Û neteweparêzî jî li ser fikra ‘avakirina yekîtiya netewî’ ava dibe û ji bo wê jî ‘zimanekî netewî’ tê bikaranîn û kod û sembolên vê yekê jî li gorî neteweyan diguherin. Ji ber vê yekê moderniya civak û neteweyan ji naşibe hev.

Ger em ji aliyekî di ve bala xwe bidinê, em ê bibînin ku di navbera modern û gerdişê de berde-wamiyek jî heye. Ji ber ku avabûna moderna behsê gotinê ne bi awayekî korfeleqî û bêdest-pêkî, lê belê bi dest-têwerdanan û bi hişmendî pêk tê. Yanê destpêka modernê diyar e. Û ev her du ji aliyê temambûnê ve bêtî hev nabin û tekane sedema berhemên ku wekî modern tên binavkirin, ‘nûbûna’ wan e. Lê belê ji ber ku têkiliya ‘nû’ û ‘kevn’ tim domdar e, berhemeke modern ji ber ku di dema xwe de bi rastî jî ‘nû-modern’ bûye, piştî demekê wekî ‘klasîk’ hatiye binavkirin û qebûlkirin. Û em li vir baş tê digihên ku modernî, têgihîştineke ku bi

vegerîna ber bi rabirdûyê ve tê famkirin e.

Îcar ku em bên ser Şivanê Kurmanca (ku bêhtir romaneke otobiyografîk e), em ê ji gelek alîyan ve bibînin ku destpêkek e, ji bo meşa civak û wêjeya kurdî ya ber-pêyî modernbûna xweserî xwe. Ji bo vê ez dikarim vê dîtina xwe bi van xalbandên li jêr bidim famkirin.

Şivanê Kurmanca;

Berhemeke modern e, ji ber ku xwedî destpêkekê ye.

Berhemeke modern e, ji ber ku, her wekî Gregoriy Jusdanis jî gotiye, “alava herî girîng a avakirina hişûbîreke neteweyî ziman e”***** bi zimanê ‘neteweyekê’ û bi armanca ‘avakirina hişûbîreke netewî’ hatiye nivisandin. (wekî mînak: ji bo nasandina kurdan a xwe bi xwe û avakirina hişûbîreke hevpar, qala element û hêmanên çand û jiyana kurdan dike û wiha dibêje; *“Jiyîna gundê kurmanca tiherekî dinê bû. Meriyê melegan çewa min serîda got, gişke êkîncî bûn. Lê kurmanc gişke koçer in, dêwêr xwey dikin, gundê wan du pa li çiyadanin. Rast e, herkê hinek kurmanc ekin diçînin, lê dîsa ekinê wan ji dêwêr hindiktire. Rastî jî nava mîletêd wandera kese notlanî kurmanca, -mêl, dêwêr xweyke tunne, îlam xweykirina pêz.”* (rûp:96)

Berhemeke modern e, ji ber ku di dema xwe de ‘nû’ ye, ji aliyê destpêkîbûna xwe ve tevneke giştî ya ji bo roja îroyîn çêdike.

Berhemeke modern e, ji ber ku gava em ji roja îroyîn de lê dinihêrin, ‘klasîkbûna wê’ diyar dibe û tê famkirin.

Berhemeke modern e, ji ber ku wekî mijar, hêman û element û kitekitên jiyana kurdan a wê demê, ji xwe re kiriye pîrsgirêk û her wekî Stendhal jî ji bo romanê dibêje, “Tekane sedema hebûna ro-



manê ew e ku tim hewlê dide ku nûneriya jiyanê bike.” romana Şivanê Kurmanca nûneriya jiyana kurdan dike û Erebê Şemo jî bi vegotina xwe ew jî bo roja îroyîn teyisandiyê. (wekî mînak: jî bo teyisandina têkiliya kurdan a bi îqtîdar û desthilata wê hingê re, wiha dibêje: “*Vira li çiyayê kurmancêd me dewletî jî meleganan hindiktir em xwera didane xebatê, xûna me dimêtin. Eme dîsa wê belengazîyê da bûn. Jîyîna me jî pir xirab bû.... (rûp, 103-104)*”

Her wiha, bi van peytan dikarim bêjim ku; jî ber ku Şivanê Kurmanca di dema xwe de modern bû, di roja îroyîn de klasîk e û jî ber ku îro jî bo kurdî klasîk e, di dema xwe de modern bû.

Destpêka ku li me dihat ferzkirin

Ez ê di vê beşê de berê xwe bidim aliyekî dîtir ku gelek salan (û jî hin aliyan ve hîna jî) li me hat (tê) ferzkirin û dîktekirin. Bi rastî jî, ger em bi ber wî bayî biketina, me yê gelek tişt gelek şaş û çewt fam bikira û dê tu nîrx û qîmeta Şivanê Kurmanca jî bo me tunebûya a niha.

Belê dibêjim, ‘a niha.’ Ji ber ku, jî bo ku em karibin jî moderniya xwe ya ‘a niha’ fam bikin (mebest jî modernî, jiyana û feraseta bajarvanî ye ku wek îdeolojiya nivîsbariyê bi nivîsandina romanê tê nîmandin û famkirin), diviya berhemê me hebûya ku em pê vegeriya rabirdûyê û me jî roja îroyîn fam bikira. Ew berhem ‘a niha’ Şivanê Kurmanca ya Erebê Şemo ye.

Îcar, di nav kurdên li Tirkîyeyê de, gelek sal û dem (û hê jî), jî aliyê hin kurdan û jî aliyê nivîskarên qerasesên wêneya tirkî ve, romanên Mehmed Uzun û romannivîsiya wî wekî destpêka romannivîsiya kurdan û ya kurdî, bi hewleke şayanî gotinê, li ser me hat ferzkirin. Ev yek, bi hin bernamêyên oryantalist ku di ser moderniya Ewropayê re dihat famkirin û bi nivîsandina hin nivîsên taybet ên li ser wî û romanên wî (ku bi rastî jî ji dahûrandin û veçirandina wêjeyî dûr bû),

dihat kirin.

Her wiha, nîqaşên ku li ser vê mijarê di nav nivîskarên kurd ên li Ewropayê de dest pê kiribûn jî, jî bilî sûcdarkirin, çêr û sixêfkirinan ne tiştêk bû û heta nivîs û lêkolîna Î. Seydo Aydoğan, li ser romannivîsiya kurdî tu dokumenteke lêkolînî bi destê me neketibû û tu nivîseke wêjeyî ku li ser romanên Mehmed Uzun jî hatibe nivîsandin nehatibû ber destê me.

Dihat gotin ku Mehmed Uzun di tv’yeke swêdî (an jî di tv’ya welatêkî dîtir) de dahk kiriye ku “ew yekem romannivîsê kurdî (ya modern) ye”. Min bi xwe ev nebîhîstiyê û nexwendiyê. Lê belê dikarim bêjim ku, bi giştî di nav kurdan de hewldaneke xuya û aşkera heye ku, ‘gelek kes dixwazin di warekî de bibin yê/a destpêkê û yekemîn.’ Ev hewldan di hemû waran de, siyasî, çandî, nivîsbarî, teknîk, tip û ên dî... hê jî heye û didome. Rojek tê, kesek dibe yekem nivîskarê matematîka kurdî, rojek tê kesek dibe yekem werger û çêkîroxe telefonên mobil ên bi kurdî, rojek tê kesek dibe yekem avakarê pergala komputerê ya bi kurdî û yekem û yekem û destpêkîbûn!...

Her wekî me li jorê jî got; civaka gerdişî bêdestpêkî ye û jimêjveyetî serdest e di çanda wê de, lê belê di civaka modern û di hêman û elementên çanda wê ya modern de, destpêk her tim xuya ye. Îcar, jî ber vê yekê, tiştêkî fambar e ku kurd di warekî çand û toreya kurdî de bixwazin bibin a/ê destpêkî û yekemîn. Ev yek jî ber awat û daxwaza modernbûnê ye ku bi tevî civaka xwe dibe xwedî destpêkeke.

Îcar, sedemên ferzkirina nivîskarên tirkî jî heye. Ev yek jî bi modernbûna tirkî ve girêdayî ye. Hema serê pêşîn ez dikarim bêjim ku; ger em li feraseta pergala modernîzekirina tirkî binêrin, em ê bibînin ku ew di nav sinorên welatê xwe de jî bilî çanda xwe û awayê modernbûna xwe, tu çand û neteweyan qebûl nake. Û ev yek vê gotina Giddens tîne bîra me ku dibêje, “civakên ku hebûna ‘kesên dî’

qebûl nakin, civakên gerdîşî ne". Heger wisan e, em dikarin bêjin ku moderniya çanda tirkî kêmdestpêkî û gerdîşî ye. Ji ber ku têngihîştina 'jinûvevejîna ji ariyên xwe' referansa esasî ya moderniya çanda tirkî ye.

De ka werin em li vir gotina Mehmed Uzun a, 'Min zimanekî mirî û windabûyî di romanên xwe de ji nû ve vejand û afirand' bi bîr binin. Gelo bi ya we jî paradîgmaya van her du gotinan di heman xîm û bingehe de bi cî nabe?

Helbet ev yek mijara nîqaşê û ya nivîsên dîrûdirêj e. Ez ê jî nivîsa xwe ji vir û pê de dirêj nekim û wekî gotina dawîn dikarim bêjim ku; di nav romana Şivanê Kurmanca de nîşane û hêmanên moderniyê gelek in, (wekî mînak qalkirina jiyan û xusetên gel û neteweyên ditir, nîşana qebûlkirin û hewldana modernbûnê ye: "Melegana pak derbaz dikir. Erdê wanî pirî rind bû. Aliyê kulturê da Alêksandrovsk ji gundê êrmaniya, tirka û huruma gellekî ferqîtir bû... (rûp:62)" û hêvîdar im ku rexnegir û nivîskarên wêjeya kurdî, ji aliyê teknik, mijar, şêwe, tevn û naverokê ve romanê veçîrînin û 'destpêka moderniya wêjeya kurdî' bigihîje heq û nirx û hêjahiya xwe.

Çavkaniyên vê nivîsê:

* Şivanê Kurmanca, Erebe Şemo, (Tîpguhastin û Veçapkirin, Amadekar: Mustafa Aydoğan), Weşanên LÎS, 2009, Diyarbekir.

** Heman berhem. (rûp: 10)

*** Heman berhem. (rûp: 16)

**** Siyaset, Sosyoloji û Teoriya Civakî, Anthony Giddens, Weşanên Metis, Stenbol, 2000

***** Heman berhem.

***** Moderniya Derengmayî û Çanda Estetik, Gregory Jusdanis, Weşanên Metis, 1998 Stenbol

A/ BAJARÊ HAK.

Hak. bajarê min
Çavên te yên bi silûk
çermê te yê kotî
û -bi berfê berdewam dike navê te.
Bilindahî, hezarûşeşsed mîtro
Kes deh hezar
nivî jê leşker.

Ne riya te heye, ne jî ava te-
Eger em qala ava Zapê, ku di navbera hel-
deran de diherike û tevli berfên ku nêzî ha-
vînê ji çîyan dihelin radibe, nekin
tu jî wek navê xwe bajarekî xerîb î.
Yên ku bi te re jiyîne
ne mirovan, ne jî xwedayan
weke ku tu şopek nehiştibin.
Dibe ku xwedayan tu car riya xwe bi te nexi-
stibin
lê mirovan
Ên ku bi sedsalan di nav zinarên asê de ji
xwe re şarge dîtin û li hemberî avûhewayê te
ya beyar û nayê ragirtin li te biryar girtin, ên
ku te star dîtin, di te de bi cih bûn
çima şopek nehiştin li paş xwe
ew gelên ku bêsekin revîyan, direvin
dişopînin û tîş sopandin?
Dibe ku Kafka, tu di kabusên xwe de dîtî, lê
bi nav nekir
(an jî tu qet neketî xewnên wî)
Eger zanibûna ku cihekî wek te heye li rûyê
erdê
mijara pirtûka wî ya herî tirsdar dê tu
bûyayî
Eger Tolstoy bi te zanibûya
Wê ji torîniya xwe hezar carî şerm bikira.
Û kî dizane, belkî jî nivîskariya xwe
- Wekî ku ez niha jê şerm dikim-
Avvakûm zanibûya ku nêzî wî bajarekî wek
te heye
Wê ji Kafkasan derbas bibûya û bihata cem
te, jî bo derdkêşiyê,
wê di şikeftên te de bijiya
Dostoyevskî nefiyî te bibûya
Wê " Nişeyên Ji Ser Rûyê Erdê" binivisiya
an jî " Tawan û tawan"
Bajarê min Hak.
bizanibe ku
hêviya te û bêhêvitiya te
roja te û berfa te
xewa te û bêxewiya te
mirovên te û sewalên te
gurên te û kûçikên te
wek nalînekê didome hin jî li cem min.
Her kî ku tu bi rastî jiyaye
nalînekê didomîne di jiyana xwe de, di
xewnên xwe de
wek mînak:
Piştî ku ji te veqetiyam
çûm bajarên rastî
bajarên mezin ên şaristaniyê
ku dirûvên wan qet bi te nediketin
li wan bajaran jî bi zimanên biyanî, lê bi zi-

Ew - Li Hekariyê demsalek

Ferîd EDGU

Wergera ji tirkî: Munewer Azîzoglû

EFŞÛNKERÊ ÇERMESOR: „- Ji bo şervanekî xewn tê wateya rastiyê. Biryara xwe ya mîsoger bi hêza xewna xwe dide û gorî wê bizav dike. An hildibijêre hildide, yan jî diqewirîne. Ji amûrên destê xwe yên ku ewê wî derxin serfiraziyê hildibijêre. Wan dişuxilîne.“

ETNOLOGÊ CIWAN: „- Don Juan Matus, di navbera xewn û rastiyê de cudatî nîn e. Xewn rastî bi xwe ye. Ya ku tu dixwazî bêjî ev e?“

EFŞÛNKERÊ ÇERMESOR: „- Bêguman xewn rastî bi xwe ye.“

ETNOLOGÊ CIWAN: „- Ango bi qasî tiştê ku niha em dikin rast e?“

EFŞÛNKERÊ ÇERMESOR: „- Nexwe ger tu îla hevberiyekê bixwazî ez ê bêjim`hin zêdetir rast e.` Xewn dîtîn, sêwirandin tê wateya xwedî hêzbûnê. Bi vê hêza destê xwe mirov dikare gelek tiştan biguherîne. Bi vê hêzê pir tiştên ku veşartî mane dikare derxîne holê. Hemû daxwazên xwe dikare di bin venêrana xwe de bihêle.“

CARLOS CASTENADA

Journey to ixtlan

manên ku dizanibûm
bi mirovan re axivîm.
(Tu ji min, ez ji te me. Lê çi xerîb bi sedan
salan e em zimanê hevdu qet hîn nebûne.)

Lê di hemû peyvên min de bêhna te, hilma
te, tunebûna te, xîzaniya te, mirin û zayîna
te hebû.
di riyên asfalt de siwareyên ku di saetekê de
sedûbîst km bi lez derbas dibûn, reng bi
reng, bi teşeyên cuda diherikîn.
Lê dema ku min li wan dinihêrî, min pez ê
ku
ji çiyê ber bi pawanan dişiqtî didît.
Û bêhna ku qirika min dişewitand
ne bêhna neftê, bêhna pez bû.
Bi jinên zirav, dirêj û porzer re radizam di
menzelên rihet ên otêlan de.
Lê di her bihevşabûnê de, nivînên ku min
roj û şevan di nav de qonax danîbû
û tenêbûna xewnên reş ku di nav wan nivî-
nan de hatibû jiyîn dihat ber çavê min.

Ji bilindahiyên te daketim peravên zeryayan
Di nav zeryayê de çiyayên te, zinarên asê,
xaniyên te yên ji axê, şikevtên kûr diteyisîn.
Ji zixûrên zeryayê bêhna catirî û pûjanê
dihat.
Dema ku min erebeyaya xwe li ser riyên fireh,

asfalt û beton ji bajaran ber bi bajaran ve
diajot,
siwarê mehîneke bê ser û ber pêşvedîçû
bûm,
dilê min wek di rojêke bi bahoz de çiyayekî
te, girekî te hîlbikişim diavêt.
Bînefişk bi min ketibû
Û di rojên germ de min xwêdana sar dida.
Li cem te min xwe li xerîbiyê dihesiband,
bajarê min Hak.
Lê xerîbiya rastîn ez li dûrî te jiyam.

Van rêzan dîsa li ber zeryayekê dinivisînim
ji te re
Berîya niha min xwe li ser zixûrên sorbûyî
dirêj kiribû,
li keştîbayekî ku ji dûr ve derbas dibû dini-
hêrt.
Dûre birçî bûm, çûm aşxaneyekê ber peravê,
min masiyek û qedehek ji araq xwest.
araq, araq nîn bû,
masiyê ku danîn ber min jî,
bawer bike di tehma penêrê te yê sîrik de bû

Ji mehan meha tîrmehê
dîsa sibehan zû radibim.
Dîsa karê min ê destpêkê paca xwe vekirin û
li asîman nêrîn e
Dîsa bêdengiyê dijîm.

- bêdengiya te, bêdengiya xwe-
Dinêrim, roj li ser berfa bêserûbinî diçirise.
Tu şopek nîn e, tu şopek nîn e, tu şopek –
gur îşev daneketine, kûçikan berî ser wan
nedane.
Dûre ji nişka ve (çi bibe, çi jiyana min bigu-
herîne, çi bûbe, tim ji nişka ve bûye.) siwa-
rek di nav berfê de diçike, derdikeve,
dimeşe.
Ber bi min ve tê, yan ji min dûr dikeve, ne
diyar e.
Dûre wisa nêz dibe, wisa nêz dibe ku
dinêrim ev lotkeyek e.

Eva wê demê paşeroja xwe û rojên ku min bi
te re derbas kirine tînim bîra xwe
û rûdinêmin ber masê
da ku tiştên di serê mirovekî de derbas bûne
ji mirovên din re vebêjim.

B/ PIŞTÎ QEZAYÊ

Ey xwendevan
ger tu di jiyana xwe de carek be jî
nebûbî qaptanê keştiyekê
-an jî hesteke te ya weha çenebûbe û te
xewneke weha nedîtibe-
keştiya te, rojekê yan jî şevê riya xwe şaş
nekiribe
û di nav avên biyanî de, li zinarên ku di
nexşeyan de ne xuya ne, neketibe û noq
nebûbe
û tu xwe bi tenê
- Taîfe li ku ne? Çi bi dumenvanê min bû?-
ne li peravekê, jî zeryayê bi kîlometreyan
dûr, him jî li ser çiyayekî (rakim: 2100) ne-
dîtibî
an jî xewneke weha bi tirs
çav-vekirî an jî girtî nedîtibî
dibe ku tiştên di nav vê pirtûkê de hatine ni-
vîsandin zor fêhm bikî.
Lewre jî bo fêmkirinê zimanekî hevpar pê-
wîst e.
Zimanê hevpar jî
jiyaneke hevpar / agahiya hevpar / danheva
hevkar / xewna hevpar
û li hin cihan jî ketina hevpar e.
heger ne hevpar be jî, nêzî wê / dirûvê wê /
wek wê
Lê tu dikarî bêjî ku, ez, li yê ji min re biyan e
digerim.
Wê demê bila riya te vekirî be.
Lê dîsa jî
dema ku te ev pirtûk xwend, ez dibêjim bila
di bin destê te de ferhengok û ajandayên

gerokên mezin hebin.

Nivîsên ku li vir hatine nivîsandin, parçeyên
dawerivî yên hêçandineke diloan in.
Dibe ku rojekê bi kêrî gerokekî riyaxweşa-
şkirî yan jî wendakirî bê.

Keştiya min kîngê, li ku derê noq bû nayê
bîra min.

Cihê ku min xwe lê dît, dirûvê devereke ku
min di pirtûkeke turîzmê de xwendibû, pê
diket û ew der bi van hevokan dihat nasand-
in:

“ Bajarê Hekariyê herêmeke me ya pir bi rû-
nîgarî ye. Li quncikê Rojhilata Başûr a Roj-
hilata Anatolyayê cih digire. Li rojhilata wî
Îran, li başûr tixûbê dugela Îraqê, li bakûr
bajarê Wanê û li rojava bajarê Sêrtê heye. Li
bajêr niha tu civateke di rengê şehristaniyê
de nîn e. Navenda bajêr bi xwe jî ku navê wê
navçeya Colemêrg e, navçeyeke pir piçûk e.
Dîroka vê herêmê jî naye zanîn. Ji ber ku
herêm bi sedan salan ji derdora xwe girtî ji-
yaye. Netew zû bi zû neketine vir û li vir bi
cih nebûne. Devera Hekariyê di welatê me
de quncikê herî bi rûnîgarî, bi çiyayên bilind
ve dorpêçayî, dereke bê rê û bêdeng e. Bilin-
dahiya çiyayên ku ew dorpêç kirine nêzî
4000 mîtroyî ne. Li vir dol jî wekî helder in.
Navgînên bi motor di mehên havînê de jî ni-
karin bikevn navçe û gundan. Li serê çiya-
yan, toktaxan, heta girsên qeşemîn hene. Li
çiyayên wî yên ku heta 4000 mîtroyî bilind
dibin de tim û daîm berf dibare. Baran pir
dibare. Av li vê herêma bi rûnîgarî dolên kûr
û tirsnaq vedike. Bi taybetî navenda bajêr,
navçeya Colemêrgê bi xwe ji ava Zapê, ku ji
kêleka wê derbas dibe, 1040 mîtro bilindtir
e.

Gelo bi rastî cihê ku ez “ketim navê” ev der
bû? Nizanim. Lê bi qasî ku ez di nivîsê de
dibînim, wek dirûv hin jî di hişê min de cihê
xwe digirin. Dem (ew dema fireh ku erdnîga-
riyê, dirokê, civakê û kesan jî digire nava
xwe) dikare hin tiştan hînî her kesê/a ku
xwe li ser çiyayan dîtine bike.

Hînî min, hînî zeryavanekî kevn jî kir. Min
dît, ew mirovên ku rojekê min xwe di nava
wan de dît, zimanê min ê ku ez diaxivim qet
fêhm nakin, şûna ku zimanê xwe hînî wan
bikim, (lewre ger min weha bikira, him ez ê
pir li bendê bisekîniyama, him jî ne wate û
ne jî hewce bi vê yekê hebû) min dest bi hîn-
bûn û ceribandina zimanê wan kir.

Ma hemû gerokên mezin ên berê jî li dû vê riyê neçûbûn?
 Lê him mercên ku ez tê de bûm, him riya ku ez li pêy bûm, him jî (dibe ku) ji ber cihê ku min dixwest bigihîjimê cuda bû, min dûre azîneyeke din şopand.
 Xwendevana/ê min a/ê dilovan, ger tu ji rojê jî rojan di rewşê weha (an jî ne weha) de bimînî, bêşik tu yê jî metodeke cuda biceribînî:
 Metoda xwe.
 Ji ber ku divê her kes rê û azîneyeke wî/ê ya cuda hebe.
 Di zeryayê de jî û li ser axê jî min tim bawerîya xwe bi vê yekê anî û weha jiyam.
 Niha nexşe û pisûleyên ku ez pêşkêşî te dikim ji hezaran dehezaran yek e.

LXII / NAMEYEKE KU DI HEYVERONÊ DE HATIYE NIVÎSANDIN

Name kom bûn.
 Nameyên min xwe li serê vî çiyayî dîtiye nedîtiye dû min bernedane, yên kesên çûne û hatine, riya wan bi vê derê ketiye, riya xwe şaş kirine anîne...
 Nameyên bi xeletî hatine.
 Yên ku ji kesên din re hatine nivîsandin lê ji min re hatine.
 Yên ku ji min re hatine nivîsîn, lê nizanim ji kê hatine.
 Nameyên ku di destpêkê de lomandiye, lê dûre hînî wan bûme û gava demeke dirêj neketibin destên min, tunebûna wan hest kirîye.
 Nameyên evîndaran. Nameyên dayikan. Nameyên hevalan.
 Nameyên ku nivîsên wan nayên xwendin.
 Nameyên ku bi zimanekî biyanî hatine nivîsandin
 Nameyên ku ji min re qala min dikin.
 Nameyên ku ji min re qala xwe dikin.
 Nameyên tenê.
 Nameyên pirane.
 Hemû name kom bûn
 ku heta niha min tu yek jî nebersivandiye.
 Û şevêkê (îşev) min jî xwe re got,
 de hadê rûnê, rûnê û binivîse û min kaxiz kişandin ber xwe.
 Min kaxizên ji karbonê xist navbera kaxizan (lewre min dixwest ji her kesî/ê re tenê bi nameyekê bersivê bidim).
 Tenê nameyek-
 tenê nameyeke ku li serê çiyê,

di heyverona wek berî tavgankê de, ku şewqa xwe dide ser berfê
 hatiye nivîsîn!
 Nameya min.
 Ev bû nameyeke ku di nivê şeva saleke kevn bi saleke nû ve girê dide de (di sersala tenê-tiyê de) hatiye nivîsandin.
 Va ye:
 Dildara min, dayika min, pitika min, hevalê min ê hozan, hevalê min ê nivîskar, hevalê min ê xêzkar, hevalê min ê feylezof û hemû hevalên min ên ku ji min re nameyan digihînin serê vî çiyayî,
 ji ber ku tişteki din ê ku bikim nîn bû
 an jî ji ber ku hêza nivîsandinê min di xwe de nedidît
 an jî ji ber ku li benda roja xwe û li benda teqandina kevîrê aramê bûm,
 nameya xwe ya nikaribû binivîsanda bi banîkirina we tevan
 niha
 pênuşa xwe li xwîna xwe dixim
 bi fikirîna ku roja min hatiye
 di bîska xelasbûna saleke kevn û destpêkirina saleke nû de dinivîsînim.
 Kevîrê aramê teqiya.
 Roja min hat.
 Êdî çend gotinên min ên ku wê ji we hemûyan re bînin gotin hene!
 Ger tenê bi nameyekê bang li we dikim, li min biborînin.
 Lewre hûn hemû dişibin hevdu.
 Kendal, dûrî, zerya, rûbar me ji hevdu diqetînin
 Lê dîsa jî em bi xewnên xwe, ketinên xwe dişibin hevdu (ev car ez jî tê de)
 Dildara min a xoşevîst,
 bêsekin nameyên te tên, qet atle nayê kirin, tên min li serê vî çiyayî dibînin. Nameyên te yên ku di destpêkê de min digot qey bi şaşitî hatine şandin, nameyên te yên ku dûre hînî wan bûm û dûre jî min ew pejirandin. (Ez ji van nameyan derketim rê û min tu xeyal kirî, rûyê te, rûyê te yê ku lê diramim û bêşik qet naşibe te li ser kaxizêkî xêz kir.)
 We şopa min dît- te û her kesî
 Lê min digot qey vê carê beyî ku li dû xwe şopekê bihêlim berze bûme
 Efsaneyêke qezaya zeryayê (min xwe jî bi vê dabû bawerkirin) û hop... Serê çiyayekî.
 Ji min pirsî çima reviyame neke. Lewre divê vê yekê herî baş tu zanibî.
 de hela qala wek gotinên ji xwe nereve, tu

nikarî ji xwe birevî yên bêwate qet neke.
Min xwe...
Ma tu dizanî dema ku min xwe li vir dît, der
barê min de tu tişt (rûyê min jî) nedihat bîra
min. Dixwazî bawer bike, dixwazî neke.
Min ew rûyê xwe yê ku nedihat bîra min
cara yekem
li vê derê,
li bajêr, di neynika zenûn a berber de
ku çûbûm riyê xwe ji kokê bidim rihostin,
dît.
Rûyê min ê ku min ji bîr kiribû
Û şaşwaz mam:
Nexwe ev ez im?
Na, feylezofê min ê xoşevîst,
(aşkere bibêjim, niha rûyê te jî nayê bîra
min), na, ne wekî ku tu dibêji (lê tu ne ew î
ku...Divê tu car mirov bi xuyanga derve ne-
xape, hwd.) ye. Ger tu ji min bipirsî rûyê
hundirê mirov şewq dide rûyê derve. Him
biryara ez çi me û çi nîn im, ji min re bihê-
lin.
Hûn hemû, tu hozanê min ê ku xwe li ser
cihê xwe dirêjkirî, helbestên demsalên dûr û
rojên dê bîn dinivîsîn; tu feylezofê min ê ku
di navbera hebûn û tunebûnê de sîdê radi-
hêlî û bê diyalektîk nikarî biaxivî; tu dayika
min a ku ji ber ez anîme dinê dibêji ez ne
poşman im;
tu, evîndara min a kor
ku dibêji ji xwe nereve, tu nikarî ji xwe bir-
evî, va ye te ev dît,
destûrê bidin ez dîn û har bibim.
Lewre li vir, di nav van mercan de jiyana tenê
bi harbûnê dikare xwe bidomîne.
Ji xwe nereve.
Ax, evîndara min a ku navbera çimên wê
yên bedew dixurin, ger ez ji xwe birevim bi-
zanibe ku bendera herî destpêk e ku ez ê
xwe bisitirîmê ew der e.
Lê çi heyf ku ez ji xwe narevim.
Berevajî vê
ez li pêy şopa xwe me.
Çendî ez li vir li xwe digirim, wekî mirovekî
ku ji bo derê xwe veke û bikeve hundir mif-
teya xwe ya ku di tariyê de wenda kiriye di-
gere û nabîne, dîn û har dibe, derê xwe
nikare bişkîne, bêçare, xerîb im. Li vir, di
nava van mirovên ku nas nakim de xerîb.
Ez bimirim. Dema ez li xwe digirim, wan/
kesên din/ mirovên din dibînim.
Û wekî ku dema ez wan dibînim hêdî hêdî ez
xwe jî dibînim.
Mirov nikare xwe di nava rêzikan de bibîne,

min ev yek ji zû ve fêhm kiriye
Di nav rêzikanê hiş de nikare bibîne, min ev
yek li vir hîn kir.
Dibe ku di nav rêzikanê evîne de bibîne. Lê
gelo rêzika evîne heye?
Dibe ku nîvekî xwe bibîne.
Lê nivê din?
Li çiyê? Di kevir de? Li ser rîyan? Li zeryayê?
Ez ji ku dizanim! Heye ku li her derê
Dibe ku li tu derê.
Dibe ku di mirovekî din de.
Di mirovên din de.
Cihekî din? Ew der ku der e?
Mirovekî din.
Ax! Yê ku bi wî dizane heye?
Ax! Yê ku wî nas dike heye?
Ji xwe nereve!
Ev her du peyvên ku di valahiyê de hatine
gotin, tenê (wekî tu dibînî evîndara min a
bedew) ji eyar dernexist, hişê min jî gelekî
tevlîhev kir.
Peyveke ku erdnîgarî û topografya wê (heye
ku divê dirok jî tevlî vana bê kirin) nîn be,
beyî ku ev bîn fikirandin hatibe gotin, pey-
veke di valahiyê de hatiye gotin e. Wateya wê
nîn e.
(Ma ez neheq im hevalê min ê feylezof?)
Ger peyveke ku rastiyeke li vir tê jiyîn ne ku
wergerîne, nêyne ziman, ne ev jî, neafirîne
(erê ev) êdî ji min re pir biyanî tê. Xwedê we
ji peyvên weha biparêze, dildara min a xo-
şevîst, hevalê min ê feylezof, hozanê min, ni-
vîskarê min.
Bersiva pirsên ku we ji min kirine (çima tu ji
xwe direvî? / Manendî û nemanendiyên di
navbera jiyana vê derê û wê derê de çi ne? /
Rojên te çawa derbas dibin? / Dema gur da-
dikevin gund tu çi dikî? / Tu hînî kaşûnki-
rinê bûyî? / Çi dinivîsî? / Te pirtûkên min ji
te re şandibûn xwendin? / Helbesta min a
dawîn a di kovara Darlikê de derketiye te
çawa dît? / Tu li wir wekî qezazedeyekî yî,
em dizanin. / Tu ji min hez dikî? / Rojên ku
me bi hevdu re derbas kirine tinî bîra xwe û
ji bo şevên ji hev veqetandi digirî? / Çima
nanivîsînî? / hwd., hwd...) ez ê rojekê, li de-
rekî din bidim. Ger bijîm, Ger xwe ragirim.
Ger pêwîst bibînim. Ji bo xwe. Bersiva van
hemû pirsên we yên bi wate û bê wate. A
rastî, yê ku pirsan dipirse û bersivên wan jî
dide em bi xwe nîn in?
(Em nîn in. Li vir qet pirsên weha xevokî ji
xwe napirsim.)
Hin zêde biçim: Pirsên rastî, ne ew pirs in

ku, bersivên wan nîn in û heta bersivên wan nayên payîn.
 Ango pirsên ku mirov ji xwe dipirse.
 Lê pirsên we ne ji van pirsan in.
 Nexwe em derbas bibin.
 Dildara min a xoşevîst, em bên ser pêşniyara te.
 Te di nameyeke xwe de xwestibû ez têr Wêneyên bikişînim û ji te re bişînim.
 Ev pêşniyara te ya derasayî bi rêzdarî û heyranî pêşwaz kir. Te pîroz dikim.
 Min nameya te ya dabaşa axaftinê xwend nexwend, ji hemû qaçaxçiyên re agahî şand.
 Min xwest, çi dibe bila bibe, bila Leicayên ji gelaleyên herî dawîn, Nikon Nikormat (tevlî motora xwe ya AW-1) Rollei SL 35ME, Yashica Contax (tevlî objektîfa xwe ya S.P.D.) ji min re bînin. Min hemû filmên reşûspî û rengîn ku ketine destên wan berhev kirin. (Bi hezaran film têrî wêneyên ku ez ê li vir bikişînim nakin.)
 Dûre wêneyê berfa dibare kişand.
 Û wêneyê berfa dihele kişand.
 Û wêneyên zarokên ku di berfê de pêxwas dimeşin kişandin. (rengîn/ şîpîşîn)
 Wêneyê birînên ku xwîn didin kişand. (rengê xwîn û kemê)
 Wêneyên pitikên mirî (beriya mirinê, dema mirinê û piştî mirinê) kişandin. (rengîn û reşûspî)
 Wêneyên keçikên tîr firotin kişandin. (berî firotinê, dema firotinê û piştî firotinê)
 Min wêneyê axa şil, cemidî ku di bin berfê de tê vekirin û pitika mirî ya tazî tê de tê veşartin kişand.
 Wêneyê latên giha li ser nagihîje, berf nagire kişand.
 Wêneyê heyveronê ku li ser berfê şewq dide kişand. Wêneyê tavidankê kişand. (ji van her duyan teqez li benda xelateke navnetewî me.)
 Wêneyê rondikê qeşemgirtî kişand.
 Wêneyê awirên tîk ên Zazî kişand.
 Wêneyê paxavnekirina Keya kişand.
 Wêneyê temenê Keya, Axa kişand.
 Wêneyê spiyan kişand.
 Wêneyê destan kişand.
 Min nikaribû wêneyê tenetiyê bikişînim.
 Min nikaribû wêneyên stranan, zemaran bikişînim.
 Min nikaribû wêneyê bêçaretîyê bikişînim.
 Min nikaribû wêneyê dînuharbûnê bikişînim.
 An jî yên ku min kişandin tenê ev bûn.

Hevalê min ê hozan, ka em binihêrin, dema te ev wêneyên dîtî tu yê çi bibêjî?
 Û tu hevalê min ê feylezof, piştî te ev dîtî gelo tu yê fêhm bikî ez çima nanivîsim?
 Ger wêneyên min ên ku ez ê bikişînim, têrî nasandina vê bihuşta cemidî ya rûyê erdê, ya çiptazî, bi zinarên ku giha li ser nagihîjin ve pêçayî, ku tê de mirovên bêçare dijîn, ev gundê serê çiyê ku dema sergîn diqedin mirov bi hilma xwe xwe germ dîkin, neke
 dibe ku wê demê ez ê ji nû ve pênuşê hem-bêz bikim,
 Lê wê demê ne ku ji bo vana teswîr bikim ji bo ku bêjim ez çiqas nêzî esman im, û ji bo ku bêjim li vê bilindahiyê hişê min diçe,
 ev yek dê bibe.
 Hevalê min ê felsefevan
 Min dixwest ew feylezofê te yê dîn û evîndarê çiya û bilindahiyên ku te pirtûka wî ji bo rêwitiyên min ên dirêj ên zeryayê bixwînim dabû min, li vê derê bibînim.
 Wê yan ji harbûna xwe xelas bibûya an jî wê ew danîna aliyekî (xwe jî bîr bikira) û Ecce Miserabilisê binivîsanda
 Gorî ku ew miriye,
 bi agahiyên ku didim te
 û bi wêneyên ku ez ê bişînim
 tu dikarî vê binivîsî.
 Mirov (ev kes feylezof be jî) ne tenê tiştên ku dijî, jiyîna kesên din jî dikare binivîse.
 Xwendevanê/a min ê/a xoşevîst, di hişê xwe de xebata tijekirina xalxalkên jorê neke!
 Xal valahî ne.
 Valahiyeke nenivîsandî.
 Valahiyeke ku pêdiviya nivîsandinê nayê hestkirin.
 Nameya min beriya wan xalan xelas bûbû.
 Mirov... dikare binivîse. Xal.
 Destnîşan. Xelas bû. Temam.
 Ev nameya min a destpêk û dawiyê ya ku min di heyveronê de nivîsandiye ye. Nameya ku min xwe ranegirt, nivîsand û bi peyamberê ewil re dê bişînim.
 Tu yê çi bikî, pêşiyên me gotine nivîsandin bêhêzî ye. Di lampeyê de don nemabe jî, pênuşa te şikandî be jî, dibe ku şeveke (bi taybetî jî şeveke wisa) xwe ranegirî û binivîsinî.
 Ne ku ji bo rastiyên bêjî. Ji bo ku bi xwe re bipeyivî. Ji bo ku dîn nebî. Di tariyê de jî tê nivîsandin. Bi destpêlkê jî tê nivîsandin. Di heyveronê de jî. Ger tu li serê çiyê bijî, sal-nameya di destê te de bêje saleke kevn xelas

bû û yeke nû dest pê kir (rast an jî xelet, ew gunehê kesên salname amadekirin e ye.) tu yê ku pêdiviya nivîsandinê dibînî- dikarî bi-bîni.

Bi taybetî jî ger qezazedeyek bî.

Bi taybetî nameyên ku li benda bersivên te ne kom bûbin.

Bi taybetî tiştên ku tu yê wekî bêjî berhev bûbin. Bi taybetî ger tu hîn dîn nebûbî

Bi taybetî tu jî nivîsandinê bikerîxî

Erê, bi taybetî-

Hadê, tu çima disekinî xwendevanê/a xoşevîst

hadê ger tu ne li ber saleke nû bî jî

tu jî rahêje pênûsê.

Dixwazî tiştên hatine serê te binivîse,

dixwazî tiştên di hişê te de ne,

dixwazî tiştên tîn xewnên te.

Lê binivîse.

Lewre her pênûs dikare binivîse- qet nebe bi qasî vê pênûsa min a şikestî.

Şener Ozmen: Dilawer Zeraq ji kîngê ve ye çîrokan dinivîse? Pêwendiya wî ya bi wêjeyê, her wiha bi zimanê dayika xwe re kîngê û çawan dest pê kiriye? Ez dixwazim tu bi berfirehî li serê xeber bidî, bêtî ku ez bi pirsên nepayî serê te biêşînim. Dema ku te dest bi nivîsandina, her wiha xwendina bi kurdî kir, astengiya herî mezin ji bo te (xasma ji bo pêvajoya nivîsandinê û xwendinê) çi bû?

Dilawer Zeraq: Wekî reng û awayê destpêka pêwendiya min a bi çîrokê re, dikarim vê bêjim; ez wekî hîskirinê, ji wê roja ku fêmbarî xwe bûme ve ye, çîrokê dijîm... Yanê ji wê roja (a rastî ji wê kêliya) ku ez hay ji jiyana xwe; hay ji bûyer û teşqe û keftûleft û qerqesûn û hevbinûnanên di jiyana de bûm, min tim û

tim xwe wekî kirdeyekî çîroka xwe hîs kir; û her çiqas heta demekê min pênûs negirtibe û tîkiliyeke rasterast bi çîrok û nivîsandinê re dananîbe jî, aşop û xeyalên min ên zarok(tiyê) ku tu car ez bi tenê nedihîştim (û tim û tim dibûn bihuşta tikûtenetiya min), hemû çîrokên ku min ê di paşeroja xwe de binivîsandana komî ser hev dikirin. Û ji ber vê yekê ye ku gava ez a niha dest bi nivîsandinekê dikim, ji aliyê peydekirina atmosfereke çîrokî ve zêde astengiyê nakişînim. Tê bîra min, min di zarokatiya xwe de car caran xwe ji hevalan dida alî, xwe dida qunc û min tiştên ku ez jiyabûm û tiştên ku di aşopa min de bi gewde dibûn dianîn ba hev, ji wan der heqê xwe û kesên di de çîrokin ava dikirin di serê xwe de. Yanê wekî te jî fam kir, destpêka tîkiliya min a bi çîrokê re her zaroktiya min e; zaroktiya ku destpêka tîkiliya bi zimanê dayikê re ye jî.

Lê bi vê keysê dikarim taybetiyeke dîtir a jiyana xwe jî bêjim; dayika min piştî zewaca xwe ji bavê min hînî tirkî bûbû, lê wê hem bi kurdî hem jî bi tirkî tîkilî bi me re datanî. Wekî di jî, jixwe jiyana Farqîna bajarê zaroktiya min jî xwerû bi kurdî bû. Wekî ku we jî fam kir, ez di zaroktiyê de hînî du zimanan bûm û bi du zimanan mezin bûm.

Û ez ji sala xwendina dibistana navîn ve ye pirtûkan dixwînim û tîkiliya min a bi wêjeyê re di wan deman de dest pê kir û ez wek mêtû, ji sala 1996'an ve ye bi kurdî çîrokan dinivîsim.

Lê berî ku ez dest bi nivîsandina kurdî bikim, di sala 1992'yan de, gava min xwest kurdiya xwe xurt û fireh bikim, ez



3 Pirtûkên
Enstîtuya kurdî ya Amedê
* Herdemciwanê
(Zargotin)

* Rêzimana Kurmancî
(Rêziman)

* Çil Çarîn
(Helbest)

Carinan mirov xwe jî dikuje - II

Hevpeyvîn: Şener Ozmen

Wan bi vekirina TRT6'ê xwest bêjin, berî niha bi heştê salî me hûn ji nişkê ve kirin tirk û a niha jî em we ji nişkê ve dikin kurd, hûn ne qewmê demê ne, hûn qewmê ji nişkê ve ne, ger em bixwazin dikarin we bikin prematureyên ji demê windakirî, ger em bixwazin dikarin we bikin surmatureyên di nav demê de riziwayî

wekî xwendekarekî bi qasî çar salan bênavber bi gramer û ferhenga kurdî xebitîm. Helbet wê hingê ji bo xwendinê pir hindik pirtûk hebûn. Wekî îro ne çîrok, ne roman ne jî pirtûkên dîtir hebûn. Pirtûkên heyî, yên klasîk bûn û famkirina wan jî bi serê xwe gelşeke mezin bû ji bo min. Jixwe ferhenga heyî jî têra gelek tiştan nedikir. Min bêhtir ferhenga jiyanê bi kar dianî û bala xwe dida awayê gotin û avakirina hevokan a pîr û kalan û kurdiaxêvan.

Şener Ozmen: Qedexebûna zimên û rewşa awarte bandoreke çawan li ser te hişt? Heke ku zimanê kurdî ne di vê rewşê de bûya, ango bi qerarnamayan, bi cezakirinan, bi lêdan û sixêfan pêşî lê nehata girtin, bi bawerîya te dê wêje yeke çawan derketa?

Dilawer Zeraq: Helbet qedexebûna zimên bi qasî her kurdekî bandoreke neyînî, na ev peyv têr nake, bandoreke kafirani, bandoreke kuşînde li ser min (û me) hişt. Vê qedexebûnê em ji mirovbûna xwe dûr xistin, em ji însaniyeta me derxistin. Vê qedexebûnê kir ku em hez ji çêrên xwe nekin, hez ji biyanan nekin, hez ji hev

nekin, hez ji hezkirinê nekin... Vê qedexekirinê kir ku em zimanê xwe, peyvên tê de, wekî tiştêkî ne zindî, wekî tiştêkî sar bibînin û bi cîrêkî ne xweş wî bi kar bînin. Vê qedexebûnê kir ku em hez ji zimanê xwe nekin, hez ji zimanên di nekin, hez ji dilê xwe nekin, hez ji dilê mirovên di nekin û...

Helbet ji aliyê me hemûyan ve eyan e ku kurdî ne qedexe bûya, dê ne di vê rewşê de bûya û rewşa wêjeya bi kurdî ji dê ne wekî îroyîn bûya.

Lê tu dizanî, wekî ku ez car caran di sohbetan de jî dibêjim, ez her li ser fikra xwe ya anarşîst im û ez ê bi vê keysê fikra xwe ji xwîneran re bêjim: Bi ya min kurdî ne tenê ji ber sedemên siyasî ve hat qedexekirin. Di wan salan de, xebateke boş



hebû ji bo avakirina tirkîyeke bajarî! (Ji ber ku aqûbeta kurdî ya a niha hatibû serê tirkî jî û tirkî jî wekî kurdî li gund mabû û diviya bihata bajarîkirin.) Di vê avakirinê de hin kurdan jî cî digirtin. Û car caran bêhemdî wan, hiş û bîr û feraset û ferheng û biwêj û qalib û gotinên pêşyan ên ku di mêjiyê wan de bi kurdî ava bûbû derdiket der û wê hingê tirs û xofek diket dilê kesên tirk ku bi awayekî organîk bi pergala siyasî û îdeolojîk ve girêdayî bûn. Ne tenê dilê wan, mêjiyê wan jî ditirsiya û dihejiya li hember firehî û xurtiya kurdî. Lê ji ber ku wan bi kurdî nizanibû, kurdî ji bo wan dibû tiştêkî dûredest. Ji ber vê jî li hember kurdî hesûdiyeke mezin û veşartî di zikê wan de çêdibû; û wekî encama vê hesûdiyê jî gir û kîneke dijminane pêk dihat. Û ji ber vê gir û hesûdiyê, ji bo ku karibin bi hêsanî bi peyvên farisî, erebî, frensî, îngilîzî, îtalyanî, yewnanî, kurdî û... tirkîyeke sistematîk a perwerdeyê ava bikin, serê pêşîn kurdî (zimanê ku di nav sînora Tirkîyeyê de dihat axaftin û ji aliyê dewletekê ve nedihat parastin) qedexa kirin.

Îcar, gelek zehmet e ku mirov texmîn bike û karibe bêje, ger nehata qedexekirin dê rewşa wêjeya kurdî wiha û wiha bûya. Lê teqez dê ji aliyê bikaranîna zimên ve ne wiha bûya û di asteke pir û pir bilindtir de bûya.

Şener Ozmen: Hew me dît ku em bûne kurd(!), me zimanek heye(!) û bi wî zimanî bername tên çêkirin. Her tişt di şevêkê de li dar ket. Em şeşûbeş bûn bi vebûna TRT6'ê, serê ewil ez têra xwe kenîyam û piştî, ango piştî kenê, ji nişkê ve ez giriyam û bû kûrkûra min. Nizanim ji ber çi. Bavê min jî serê xwe dihejand dema temaşe dikir. Ji ber ku mijareke aktuel e, dixwazim pirsê jinişkêvekurdbûyîne ji te bikim. Aya em ji nişkê ve bûn kurd? Dilawer Zeraq çi difikire?

Dilawer Zeraq: A rastî, wan bi vekirina TRT6'ê ya di şevêkê de xwest bêjin, berî niha bi heştê salî me hûn ji nişkê ve kirin tirk û a niha jî em we ji nişkê ve dikin

kurd. Wan got, hûn ne qewmê demê ne, hûn qewmê ji nişkê ve ne. Wan xwest bêjin; ger em bixwazin dikarin we bikin prematureyên ji demê windakirî, ger em bixwazin dikarin we bikin surmatureyên di nav demê de riziya. Di vir de komedîyeke wisan ecêb û gosîrmetî pêk hat ku, ew bi qûna xwe bi me kenîyan, ê me jî, taqeta me nemabû ku em ji kûrahiya dil de bigirîn. Tu dizanî, em hînî girîna ji kûrahiya dil de nebûne û girîna me jî di hundirê me de hatiye asêkirin. Jixwe tiştê ku kiriyê ku tu pêşî şeşûbeş bî û piştî kenîneke bêsedem jî bigirî, ev yek e; teqînek e. Te dît, qayde û zagoneke fîzîkê ye: tiştê ku asê bibe, diteqe (an jî dipeqe). A me jî her wisan. Kena me jî ne normal e: peqîn e, teqîn e. Lê di vir de tiştê heye ku trajedîyeke kambax di nava vê komedîya dîrokî de bi cî dike; ew jî tevger û hewldanên hin kurdan e ku; tu yê bêjî qey ji virnîtiya heştê salan ve ye ji bo vê rojê, ji vê jinişkavetiyê re hatibûn amadekirin, bi awayekî ecêba ecêban li me qewimî û wan kurdan zû xwe li vê jinişkêvekurdbûyîne anî. Û bila çavên me gelean ronî bin, va ye kurdên me yên ji nişkê ve yên wekî gogê zêrîn jî çêbûn...

Şener Ozmen: Carinan mirov xwe jî dîkuje, ne welê? Tu çi dibêjî?

Dilawer Zeraq: Mirin, encamek e ku nayê berastengkirin û di destpêka jiyana dîtir de tim xwe nû dike. Xwekuştin, encama ku tê afirandin e. Mirin tiralî ye. Payîna encamê ye. Xwekuştin li şûna payîne, pêkanîna e: pêkanîna encamê ye. Û tevî ku her mirin, wekî hûtekî har û birçî xwe ji jiyaneke dîtir re amade dike da ku wê daqurtîne û biencam bike jî, xwekuştin bi tevî encama xwe, afirandina destpêkên dîtir û nûtir e. Mirin, ji bo xwe, li destpêkên nûtir digere, xwekuştin, ji bo her tiştê ji derveyî xwe, destpêkên nûtir diafirîne, ava dike.

Îcar ku mirov bixwaze tim di destpêkên afirandî de cî bigire û xwe nede ber bayê tiralîyê, belê rast e, mirov carinan xwe jî dîkuje!

Û ger ku piştî xwekuştinê ‘çilk ji pê-nûsê biniqutin’ hê xweştir û watedartir e.

Şener Ozmen: A rast, mebesta min ji vê hevpeyvînê ne ew e ku ez bi pirsên xwe te bi xwendevanan bidim nasîn, ne jî dixwazim yekser qala çîroknûsiyê, her wiha çîroknûsiya kurdan û rewşa wê ya îroyîn bikim ka bê em di çi rewşê de ne û ber bi ku ve diçin, na, min çend pirs amade kirin û heye ku bersivên te, hin pirsên dî jî li serê zêde bikin.

Ji zû ve ye ku ez û tu li ser wêjeyê, rexneyê, awa û şeweyên nivîsandin û xwendinê, li ser têgihan û nexasim li ser wate û nik-wateyên nivîsaran (tekstan) dipeyivin, belê em bi tenê dipeyivin û her danîşîneke me bi saetan diajo, di wê baweriyê de me ku em tişteki girîng li dar dixin, ji Helîm Yûsiv bigire heta bi Firat Cewerî, Jan Dost û Proust, Mehmed Uzun û Lal Laleş û Yaqob Tilermenî, Joyce û Sartre, Kafka û Foucault, Kawa Nemir û Mîr Celadet, Cegerxwîn, Arjen Arî û Fatma Savci, belê li ser her tiştê ku bala te û ya min kişandiye, yan na bûye pirs-girêkek ji bo me her duyan û ne tenê ev jî, Elif Şafak, Hasan Alî Toptaş û heta bi Tuna Kîremîtçî, belê em tenê dipeyivin.

Di van danîşinan de em danûstendî-neke înter-dîsîplînî dikin, her wiha (û bi taybetî) em li ser dîtbariyê, dîroka hunera modern û ya postmodern, bandor û feraseta wê, pêwendiyên wê yên bi çanda populer û medyayê û siyasê re jî dipeyivin. Di dîroka hunerê de gelek ekol (wek Surrealîzmê, Futurîzmê, Dadaîzmê) bi wêjeya wê demê re têkildar bûne û gelek berhemên balkêş hatine afirandin ku em hîna jî wan berheman dixwînin. Pirs min dê ev be: Ji bo çi îro em pêrgî têkiliyeke welê nayên, her kes bi serê xwe, xwe zimanzan, feylesof, antropolog, rexnegir û hwd. îlan dike bêtî ku berhemeke xurt bikeve destê me rebenan?

Dilawer Zeraq: Belê, em dipeyivin. Li ser gelek tiştan, li ser têgihan û nivîsaran. Helbet ne bi mebesta gelacî û xeybe-

tiyan. Der heqê van axaftin û sohbetan de, serê pêşîn pirs ku ez ji xwe dikim ev e: “Gelo ez û Şener Ozmen çima li ser ev qas tiştên pirhêl dipeyivin?” û di nav vê ‘çima’ yê de gelek sedem derdikevin pêş min. Tevî ku mijarên axaftina me bêhtir wêjeyî ne jî, em diyalogeke asayî, normal û têkiliyeke mirovane bi hev re datînin. Em hewcetî pê dibînin ku ji hev vedizin û ji hev bixwin. Bêtî ku em xwe deynin tewq û tebeqeyên bilind û bixwazin li wir fêkiyên çêdartir bixwin, hewcetî pê dibînin ku bi xwe bidin zanîn û famkirin ‘ka em dikarin çi bikin?’ Yanê, bi ya min sedema sereke ya axaftina me ev e: Em di ser kirin û nekirin, karîn û nekarîna kes û nivîskarên dîtir, hewlê didin ku derfeteke afirandinê ji xwe re peyde û ava bikin. Yanê ji ber ku hest û dîtî û boçûnên me ne statîk û qalibgirtî ne, peyvên me ne fûrek in. Ji ber vê yekê jî her cara ku em ji hev vediqetin, tiştên kêr dimînin di axaftina me de û em bi xurtayî vê hesta kêr-mayînê his dikin. Û ji ber vê hîsa kêr-mayînê jî her tim pirs diafirin di serê



me de û em ji bo bersiveke rast û têrbaş serî li hev didin.

Û bi ya min mirovek ku 'pîrsên' wî/ê yên der heqê xwe, der heqê dorhêla xwe û der heqê jiyana xwe de tune be, ne mimkun e ku afirîneriyeke baş û saxlem pê re çêbibe.

Îcar, wekî te ye, em rastî tîkiliyeke bi vî rengî nehatine, lê ez bawer im dê neyê wê wateyê ku tîkiliyeke wisan jî tune ye. Helbet reng û ihtîmal e ku hebe...

Lê ku ez werim ser sedema pîrsa te, ez ê bêjim jixwe bersiv di reng û şeweya tîkiliya me de ye. Yanê em kurd hînî afirandina pîrsan û pîrskirinê nebûne. Tim û tim em bersivan didin. Ez rewş û bûyerê ku êdî di hemû panelan de li me diqewime, wekî mînak bêjim: Piştî ku axaftin diqede, jî guhdaran tî pîrsîn, 'gelo pîrseke we heye ku hûn ê bixwazin bikin?' Ji sedî 90 kes tenê bersivên xwe didin, şîroveyan xwe dikin û hew! Yanê, di maweya guhdarîkirinê de tu pîrs di ser tiştên ku hatine gotin re nehatine çêkirin, an jî tu pîrs di serê guhdaran de çênebûye.

Her wiha, huner û bi taybetî jî wêje, ne 'bersivdan' e, belê teqez wêje û huner, 'pîrsafirandin' û 'watedarkirina pîrsan' e. Helbet, ev pîrsên hanê bi her bersiva ku ji aliyê kesên jî bili afirîner ve tî dayîn, watedar dibin.

Îcar, kesek, çi dibe bila bibe, hunermend, zimanzan, feylesof, nivîskar, antropolog, rexnegir û hwd. helbet her kes li ba xwe xwedî bersivê ye; lê belê ger nikaribe jî nav bersivên xwe yên ku dide xwe, hin pîrsan biafirîne û nebe sedem ku guhdar bi guhdarîkirinê, xwendevan bi xwendinê..., pîrsên dîtir jî bo xwe biafirînin, wê hingê gelek hêsan e ku hin sifet û nav û navdariyan bi pey xwe bixe. Û gelek zehmet û dijar e ku berhemên 'bi qasî ku tî xwestin û famkirin xurt' jî nav vî sanahiyê derkeve.

Şener Ozmen: Bi destûra te, ev pîrsa min jî dê bi siyaseta re tîkildar be, jî ber

ku rexne û gelek caran jî çêr her tim jî wê hêlê ve dibarin û dibêjin ku, berhemên kurdî yên îroyîn, an mişt bi siyaseta in an jî dîrî siyaseta ne, heta hinek jî li dijî-siyaseta ne. Wek nivîskarekî ku li Amedê dijî û diafirîne, ku ev yek bi tena serê xwe helwestek e, tîkiliya te bi rasteqîniya ku di bin siya siyaseteke tundrê de şîn hatiye re, çi ye? Gelo jiyîna li Amedê jî nivîskarî/ê vedidize yan didiyê? Û jî kerema xwe re wateya bêhtengiyê jî jî me re ve bêje û tîkiliya wê ya bi nivîsandinê re.

Dilawer Zeraq: Hema di serî de û yekser ez ê bibêjim; di rewş û kawdaneke wiha de ku em kurd tî de digevizin, her berhema ku bi kurdî ye, bi serê xwe siyasetek û sedema siyaseta ye. Lê xwezî ne wiha bûya! Xwezî nivîsandina bi kurdî, wekî nivîsandina hemû zimanên di tiştêkî xwezayî û normal bûya. Mixabin, her wekî min di bersiva pîrseke li jor de jî got, qedexekirina ku li kurdî qewimiye kiriye ku kurdî bibe zimanekî siyasî... Ev aliyekî meseleyê ye.

Ji aliyê dî ve jî, rexneya ku li ser siyasînebûna berhemên kurdî tî kirin, bi temamî jî rasteqîniya hunerî dîr in. Ji ber ku bi vî rexneyê; vegotîneke bi peyvên siyaseta tî xwestin (li vir tu girîngiya kurdîbûna wê peyvê namîne); vegotîneke ku mijar û mesajê wekî ku di daxuyaniyan de heye, rasterast bide famkirin tî xwestin; vegotîneke ku sedî sedî kopî û zarvekirina rasteqîniya beloq e tî xwestin; û vegotina ku tî de hin nav û kirin û çîrokên bera bera qewimî tî xwestin. Yanê vegotîneke dîrî rasteqîniya di nav wêjeyê de tî xwestin.

Rast e, ger ez jî li gorî van daxwazan rexne bikim, ez ê jî wekî wan kesan bêjim 'berhemên bi kurdî jî siyaseta dîr in.' Lê bawer bikî, helbesteke bi kurdî, gelek caran jî gotin û daxuyaniyên bi tirkî yên bi peyvên siyaseta kirî, bêhtir siyasî ye. Lewre, bi ya min siyaseta, ne bikaranîna peyvên qerase û handayîn e û bandora wê ne di gotinan de ye. Bi ya min siyaseta û bandora wê di naveroka gotinan de ye û

ev naverok bi encamê diyar dibin.

Tu tîkiliya min a rasterast ku bi raste-qîniya di nav (an jî di bin) siyaseteke tûndrê de şîn û pêk hatiye re tune ye. Ji ber ku heqîqet rasterast bi awayê bikaranîna zimên ve tîkildar e. Ez ê li vir M. Foucault bînim bîra te û bîra xwe. Foucault, der heqê tîkiliya zimên û heqîqetê de pênaseya “heqîqeta bi zimên sazîrî” dike. Îcar ji ber ku ziman jî bo siyasetê yek jî alavên pêkanîna îqtîdarê ye, zimanê ku tê de tî bikaranîn jî, tenê jî bo avakirina ‘heqîqeta sazîrî’ ye.

Belê, jiyana li Amedê jî nivîskarî/ê vedidize. Lê ku nivîskar bera bera di sedemên hebûna Amedê gihîştibe, ev vedizîn jî bo wî/ê nabe windakirinek an jî kêmbûnek. Ev vedizîn, dibe sedema afirandinê.

Wateya bîhntengiyê li ba min ev e; daxwaza henasgirtinê. Îcar ev daxwaza henasgirtinê ne jî bo bîhnfirehiyê ye. Ji bo famkirina jî jiyanê ye. Û kesê bîhnteng her ku jî jiyanê fam dike, sedemên bîhntengiyê yên dîtir li xwe zêde dike. Yanê di navbera famkirina jî jiyanê û bîhntengiyê de paradokseke şîrîn heye. Û di wateya bîhntengiyê ne bîhnfirehî ye...

Û bîhntengiya di vê wateyê de (di wateya daxwaza henasgirtinê ya jî bo famkirina jî jiyanê), rasterast û jî reh û kakilê xwe de bi wêjeyê re tîkildar e. Ji ber ku, hemû sedemên nivîsandina berhemeke wêjeyî bi sedemên pêkhatina bîhntengiyê ve girêdayî ye û ew bîyî hev nabin.

Şener Ozmen: Kurtepirsek; gotineke Saît Faîk (Abasiyanîk) e, dibêje; “*Heke min nenivîsanda, min ê hiş biavêta*”, û tu?

Dilawer Zeraq: Heke min nenivîsanda, min ê mirin heq kiribûya.

Şener Ozmen: Min di nivîsekê de xwendibû, digot, “*jiyanên wergerî*”, gelo ma jiyanên me yên wêjeyî gihîştine wê radeyê ku em jî jiyanê ku hatiye wergerandin, bijîn? Ma em dişên bibin lehengê/a romaneke ku wergerî zimanê me bûye? Tu jî wergeran dikî, dibe ku

bersiva vê pîrsê jî bo te hêsantir be.

Dilawer Zeraq: Na xêr. Jiyana me negihîştîye wê radeyê ku em karibin ‘jiyanê wergerî’ bijîn. Û bi ya min ne hewce ye jî. Ji ber ku ‘jiyanê wergerî’ ezab e, ezabê gorê ye. Çima? Li ba min du sedem hene: Yek, jiyana wergerî, jî ber ku gava kesek jî jiyana xwe tu tişt fam neke yan jî ew watedar neke û tu çêjê jê nestîne, ezabê gorê ye. Dudu, jiyana wergerî, ger jiyana kesekî qediyabe, jiyana piştî qedînê ye. (qedîna jiyana kesekî di wateya êdî tiştêkî ku bijî nemabe de)

Piştî ku ‘jiyanê asayî pêk tê’, dûre, ‘jî jiyana asayî jîyanê watedarkirin’, dûre, ‘jiyanê watedarkirî di nav pergala kapîtalîzmê de tê çilvirandin, berxwarin û qedandin’, wê hingê mirov hewceyî ‘jiyanê dîtir’ dibe û jiyanê wergerî tê tercîhkirin.

Îcar jî ber vê yekê û jî ber ku em di warê jiyîna qonaxên sosyo-ekonomîk û sosyo-polîtîk de li dem û wextan artilîne, em naşên bibin lehengê/a romaneke ku li zimanê me hatiye wergerandin.

Şener Ozmen: Gava min pirtûka te ya *Çilkên Pênûsê* xwend, yekser rewşên vegotin û nivîsandinê ketin bala min, li gor vegotina te ya berê, te di *Çilkên Pênûsê* de giranî dabû ser kurtedem û kurtepeyvan û di hin cihan de te xwe sipartibû helbestê jî... Borgesê kor hat bîra min. Belê tu li Amedê dijî û pîraniya berhemên xwe li vî bajarî diafirînî. Lê çîrokên te, ne çîrokên Amedî ne û baş e ku ne welê ne. Hest û raman û bîr û boçûnên ku di diyalog û monologên çîrokên te de ne, gerdûnî ne, hestên mîran û yên jinan, tîkiliyên evînî, tîkûtenêti û encamên wê, ew kes û kesên di wan çîrokan de, her tim bi arêşeyên derûnî xuya dibin, yan jî tûşî tiştine “modern” tî. Me wêjeyek jî li diasporayê heye, welê tê gotin, bo minak, nivîskar jî ber pîrsgirêkên xwe (û me) yên bêwela-tiyê, em bibêjin ku berî bi sî salan terka axa xwe kiriye û berê xwe daye Tokyoyê û li Tokyoyê dest bi nivîsandinê kiriye. Di-

nivîsîne, lê li ser heman mijarê: Ax û ax! Ez pir meraqê dikim bê nivîskarekî Japon bihata Amedê û bi salan li Amedê bijiya, dê çi û bi çi binivîsanda? “Mijara hêsan” dibêjim, tu çi difikiri?

Dilawer Zeraq: Serê pêşîn min divê bi-bêjim ku têheva hemû demên çîrokên Çilkên Pênûsê bi qasî ‘kêliyekê’ ne; ew ‘kêlî’ ya ku di tēghiştina J. Luis Borges de ne sekan û statîk e û dikare bi qasî dîrokê firehtir bibe, (ma ne Borges bû yê ku çîrok bi dîrokê re gihand hev...) Her wiha her kurteçîroka ku di Çilkên Pênûsê’ de cî daye xwe, ‘hêçan û ezmûneke dirûvê ye.’

Di vê hal û rewşê de, teqez dikarim bêjim ku helbestibûna çîrokan ji ber ku ez ne helbestkar im pêk hatiye. Ger ez helbestkar bûma, ne hewce bû mirov çel û behsa helbestibûnê bikira. Ji lew re jî, ez dibêjim her çîrokek di pirtûkê de di heman demê de helbestên min e jî. Û her çiqas dê piçekî klîşe be jî, ez ê karibim bêjim, (kurte)çîrok ne çeşn û cureyek e ku di navbera helbest û romanê de ye. Belê, çîrok ew çeşn e ku dide her du di-sîplînan jî û ji her duyan jî dixwe.

Ez ê di warê tûşibûna li tiştên modern de, gotina Erne Kritch Neuse ku gotiye, ‘Kurteçîrok di nivîsbariya modern de hêçan û ezmûna şêwe û dirûvê ye’ binim bîra me. A rastî, li vir divê mirov li ser tēgiha ‘modernî’yê jî dîrûdirêj biaxive. Lê ez dikarim bi kurtasî vê bêjim ku; girîng e ku mirov ‘çawan vedibêje.’ Lê ji bo vê ‘çawanvegotinê’ jî dirûvek, şêweyek û zimanek hewce ye. Yanê moderniya nivîs û vegotinê ji vir dest pê dike. Moderniya di wêjeyê de, ne ji jiyîna li diasporayan û li Tokyoyê dest pê dike. Çîrokek, vegotinek, çi vedibêje bila vebêje, te divê bila çêla jiyana li gund, te divê bila çêla tēkiliyên gundiyan a bi hev re û bi bajariyan re, te divê bila çêla jiyana û tēkilî û arîşeyên mirovên bajarî ku di apartmanên bilind, di galeriyên mezin, di çarşî û bedestanên fireh de dijîn, di bar û cafeyan de rûdin, dixwin û vedixwin, te divê bila çêla mirovên ku dikevin nav arîşeyên derûnî

û psîkolojîk û tê de difetisin, te divê bila çêla encamên şer û pevçûnan û te divê bila her hal û rewşê mirovane bike; teqez divê ji bo her vegotinê li şêweyekî, dirûvekî û zimanekî taybet bigere û biafirîne.

Gava nivîskarek bi dehan salan li Dîasporayê bijî, (ku wek mekan ji bo kurdan Ewrûpa ye û şarezatirîn û bajarîtirîn qada cihanê ye) û hê jî di vegotina xwe de bêje ‘ax û ax!’, ez ê karibim bêjim, nivîs û wêjeya wî/ê kesî/ê bi temamî nivîs û wêjeyeke nostaljîk e. Ji lew re jî, nostaljî ne ‘bêrikirina rabirdûyê’ ye, her wekî Slavoj Žižek gotî, nostaljî di heman demê de, ‘bêrikirina tiştên ku nehatine jiyandin’ e jî. Rast e, heq e ku mirov bêje nivîskarên li Dîasporayê li ser nostaljiya pênaseya duyem hewl dane (hewlê didin) û dixwazin di vegotinê de rasteqîniyeke nûtir û dîtir ava bikin. Lê belê gava mirov dêhn û bala xwe dide berhemên li Dîasporayê hatî nivîsandin, mirov zêdetir rastî vegotineke rasterast û bi temamî otobiyografîk tê.

Ez dibêjim, ger nivîskarekî/ê Japon bihata Amedê, çi jî binivîsanda, bi ihtîmaleke mezin mijarên wî/ê dê li ser nakokiyên mirovên ku bi hêmanên gerdîş û moderniyê dijîn bûya û dê li ser tēkiliyên wan bisekîniya. Ji ber ku, Japonistan ew welat e ku moderniya xwe li ser bingeha gerdîşa xwe ava kiriye û her wekî R. Barthes gotî, ‘împaratoriya şanîderiyê’ ye. Îcar, Amed ew bajar e ku hema bêje hemû hêman û elementên ku nîşaneyên moderniyê ne, di nava xwe de dihevine (yên nû hatî dîtin û vedîtin û kifşkirin jî pir bi hêsanî dixwe nava xwe), lê belê ji aliyê famkirina jî gerdîşê ve xizan e û ji ber ku xwediyê kêmagahî ye, gerdîşa xwe jî bi awayekî çilvirî dijî û her çiqas wek jiyana rojane jiyanê modern tê de xuya bike jî, nakokî û dubendiyên ku di nav mirovan de diqewimin, awa û metodên çareserkirina pîrsgirêkan jî tê de, bi giştî li ser mêjiyê feodalîyê ye. Îcar, nivîskarê Japon van nakokiyan û rewş û arîşeyên derûnî jî xwe re neke sedemên nivîsan-

dinê, dê çi xwelî li serê xwe bike!

Şener Ozmen: Di çîroka *Çilkên Pênûsê* de te giranî daye (yan te bal kişandiye) ser “çalakiya nivîsandinê” û “pênûsê”, her wekî te jî cî bi cî destnîşan kiriye û gotiye; “*Giraniya nivîsê...*”, “*Min dixwest tevî pênûsa di destê xwe de bibim mewanê hûvê*”, “*Bi girtina destê min î ku hînî pênûsê bûye...*”, “*Bi pênûsê...*”, “*Tu çima pênûsê dibizdîni?*”, “*Destên min ên xweşik. Ji pênûsê dûrketî...*”, “*Razan... pevşabûn... şerm... û nivîsîn!*”, “*û çilk ji pênûsa min diniquitîn*”, û di heman çîrokê de em pêrgî metaforine wek “*Hingureke derewîn*” û “*Dilgeşiyêke durû*” jî tên, digel hindê jî, ango tevî derew û durûtiyan ez dixwazim têbigihim bê ji bo Dilawer Zeraq giraniya nivîsandinê çi ye? Gelo “*Koçera wî ya rûheyv*” dikare wî ji vê rasteqîniya cîrnexweş bi dûr bixe?

Dilawer Zeraq: Ji bo min giraniya nivîsê, bi qasî sivikiya ‘xwekuştinê’ ye ku bi dû wê re ‘çilk ji pênûsê diniquitîn.’

Na xêr, wekî te jî pir xweş bi nav kiriye, ‘*Koçera min a rûheyv*’ nikare min ji ‘rasteqîniya cîrnexweş’ dûr bixe. Lê ez dibêjim kî bûya jî û çi bûya jî dê nikaribûya ez dûr bixistima. Ji ber ku ancax ‘xwekuştin’ a ku bi nivîsandinê pêk tê û ligel nivîsandinê ‘xwejinûveafirandin’ e li mirov ferz dike, dikare min ji ‘rasteqîniya cîrnexweş’ dûr bixe. Yanê hem mirov ‘tune dike’ û hem jî ‘ji nû ve diafirîne.’ Yanê nivîs! Yanê sedema xwekuştinê!

Şener Ozmen: Sê çîrokên di pirtûkê de li ser evîne ne; di beşa “*Ez û Ez*”ê de yek; *Çiziya Rûbara Evîne*, dudu; *Darebiya Evîne*, sê; *Taldeya Evîne*; evîna di çîrokê de ne evîneke yekalî ye, bi tevê wê jî di beşa “*Ez û Ez*”ê de cî girtine, ango ne di beşa “*Ez û Tu*”yê de, çima ne *Ez û Tu*?

Dilawer Zeraq: Belê rast e, wekî hemû çîrokên ku di beşa ‘*Ez û Ez*’ê de bi cî bûne, ew jî ne evînen yekalî ne. Lê belê, bi ya min evînek çiqas jî dualî be jî, ‘yekalî’ tê jiyandin. Ji lew re jî, her wekî M. Proust gotî, ‘evîn: hîsên mirov bi xwe ne ku di he-

yîniya kesê li hember de watedar dibin û car dî li mirov vedigerin’, evînen min ên ‘dualî’ jî ew evîn in ku ez bi ‘*Ez û Ez*’ê re wan jiyame. Bi wan kêfxweş bûme, bi wan lingê min erd negirtiye, bi wan firiyame, bi wan xeyalên min sînor li xwe fireh kirine...

Şener Ozmen: Di danîşînên me de derbas dibû, me ji bo rewşa wêjeya kurdî peyva “*septom*”, ango “*elamet*”, “*nîşan*” bi kar anibû, em di heman fikrê de bûn ku em hîn bi semptomên tevdişkeriyan, her roman elametek bû, her helbest nîşanek bû, felaket bi dû felaketê dihatin. Wek Helîm Yûsivê ku di romana xwe ya hejîner, di *Sobarto* de digot; “*Belqîs rabû û ber bi agirê wî ve meşiya, cixara xwe jê vexist, li ser text xwe ramidand û bêdeng cixare kişand, li Silêmanê şewitî dinêrî, mîna ku li parçeyekî muzîkeke xweş guhdarî bike li qirçe-qirça cil û gewde û hestiyên wî guhdarî dikir.*” Heye ku nîfşek ji me bû Silêman û agir bi gewdeyê xwe xist, ango şewat û gotin gihiştin hev û wêjê jê derçû. Tu çi difikiri? *Çilkên Pênûsê* şewata çi ye?

Dilawer Zeraq: Ez dibêjim ‘septom’ û ‘elamet’ ji bo nasan û teşhîsê du hemanên girîng û esasî ne. Belê, ji ber ku hê tu nasîn û teşhîseke baş û durist ji bo sedemên nexweşiyên me nehatine dîtin û danîn. Bi taybetî siyaseta ji aliyê xwe ve vê hewlê dide. Lê belê ji ber ku ev septom û elamet di hemû qadên jiyana me de hene, bivênevê hin hewldan bi xwe re septomên ditir û patolojiyên nûtir çêdikin. Îcar, ji ber ku nivîs hemû pîrsgirêkên xwe di hundirê xwe de dihevine û dide der, ev yek di wêjeyê de hê beloqtir e.

Çilkên Pênûsê, di wateya, ‘Nostalji: bêrîkirina tiştên nehatine jiyandin e’ de, şewat (an jî şewitandina) evînen nostaljik e.

Şener Ozmen: Bibexşîne, bû meraq ji min re, loma ez ê vê pîrsê bikim: Dilawer Zeraq çi wextê dinivîse? Danê sibê, danê êvarê, danê şevê? Beyanî, di berbangê de?

Bi zikê birçî, yan têt? Her wiha pêdiviya wî bi kawdaneke çawan heye? Xwe ji bo hevoka pêşîn amade dike gelo? Ew hevok –ku em bibêjin hevoka destpêkê ye– di maweya nivîsandinê de tê guhertin an na?

Dilawer Zeraq: Ez bi giştî, roman an jî çîroka ku min tevna wê çêkiriye û min biryar daye ku ez ê wê binivîsim, pêşî di nav demeke nediyarkirî de pê re dijîm, dûre çi wextê ku hest pê bikim ku ez ê di nava wê dema nediyarkirî de winda bibim, rûdinê û wekî dînan dinivîsim.

Ji bo nivîsandinê tu dan û wextekî min ê diyarkirî tune ye. Lê ez bédengiya kûr a şevan çêtir dibînim ji demên dî.

Û divê di dema nivîsandinê de zikê min ne têt û tije be.

Ji bo nivîsandinê, pêdiviya min bi kawdaneke aram û bédeng heye da ku karibim dengê hundirê xwe derînim.

Belê, hevoka pêşîn û peydekirina wê, karekî pir û pir dijwar e. Divê têkiliyeke wê bi hevoka dawîn re hebe û gava çîrok an jî roman qediya hevoka pêşîn bê bîra xwîner. Ji ber wê yekê kêman caran (bi qasî ku bêjim qet) hevoka pêşîn di maweya nivîsandinê de diguhere.

Şener Ozmen: Dilawer Zeraq ne bi tenê di warê çîroknûsiyê de, di heman demê de di warê amadekirina ferhengan de jî xebitiye û bi qasî ku ez dizanim û dibînim, ev karê girîng hîn berdewam e. *Ferhenga Biwêjan* a Tirkî-Kurdî di cotmeha 2005'an de ji Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê derçûbû û min bixwe di pêvajoya nivîsandina *Rojnivîska Spinoza* de gelek û gelek sûd ji wê ferhengê wergirt. Piştî min bihîst ku te yeka di amade kiriye, îcar Ferhenga Biwêjan a Kurdî-Tirkî. Gelo tu dişêyî hin agahî bidî me berî weşana wê.

Dilawer Zeraq: Belê, min a niha bi qasî 17 hezar biwêjen kurdî di ferhengeke dîtir de (*Ferhenga Biwêjan* Kurdî-Tirkî) anîne ba hev û ew ji bo weşanê amade ki-

riye. Di vê ferhengê de min biwêj ji hev senifandine û li gorî taybetiya wan ew ji hev veqetandine. (Wekî minak: Biwêjen resen, biwêjen ji ber mecazê, biwêjen ku ji komên peyvên pêk tên, biwêjen lêkerên hevedanî, biwêjen rengdêrî, biwêjen diayî, biwêjen nifirî). Ger wekî hemû karên me kurdan bi derbekê re felek çep li ferhengê nezivire, wekî ku me li hev kiriye, derengtirîn dê di payîza 2009'an de ji aliyê Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve bê weşandin.

Şener Ozmen: Pirsgerêkeke me/min jî di pêvajoya bergsaziyê de bû. Ji serê ewil de min dixwest ku ez wêneyekî nivîskarî di berga pêş de bi kar bînim, lê ne wek portreyekê, bêhtir fena parçeyekê ji dîtbariyê, hem reş û spî û hem jî dubarekirî. Ne adetê min e ku ez bergan şanî nivîskar bidim û guh bidim pêşniyazên wî/wê. Bikaranîna wêneyê nivîskêr a li ser berga pêş, wek rîskeke dihat dîtîn, a rast, ev yek jî min re jî bi dengê qels dihat gotin, belam -dawiya dawîn- min a xwe kir. Di gelek pirtûkên kurdî de em sûretên nivîskaran, helbestvanan nabînin, em nizanin kî ne, çawan in, kor in, bi çavekî ne, yan bédifin in? Ên heyî jî, ji estetîkê pir dûr in, an pirtûkek di nav destê nivîskarî/ê de ye, yan jî pişta wî/ê li pirtûkgehê ye. Lê wêneyê ku min ji albûma te hîlbijartibû, pir bi dilê min bû, min *Çilkên Pênûsê* di awirên wî kesî de didîtîn û giraniya nivîsinê xwe ji sermilên wî dida der. Ji bo Dilawer Zeraq dîtbariyêke bi vî terhî çî îfade dike?

Dilawer Zeraq: Di serî de vê rîska behsê xeberê ez jî xistim nav gerîneka xwe, ez pir zêde li ser fikirîm û di nav bêbiryariyêke tîrserêşî de gevizîm. Lê dawiya dawîn, her wekî te jî got, ji ber ku wêneyê ser bergê ne ji bo danasîna sûretê min bû û hemû rewşên derûnî ya çîrokên di pirtûkê de di awirên min de li hev kom bûbûn û wan awiran dikaribû giraniya nivîsê hildana, min hemû qilqal û metirsîyên xwe dan alî. Helbet di vê çarçoveyê de car caran ku hewce bike bikaranîna

wêneyên nivîskaran dibe ku çêtir were ditin û tercîhkirin. Ev yek di wêjeya cîhanê de jî heye û ger em ji tehmê derne-xînin û parîkî pozîtîv lê binihêrin, ne tiştekî tewş e.

Şener Ozmen: Wek pîrsa dawîn, di Çî-ziya Rûbara Evînê de derbas dibe; dibêje (ew kes) “- *Tu nanivîsî, - an jî bi awayekî dî bêjim- tu çî dinivîsî?*” di van rojan de?

Dilawer Zeraq: Di van rojan de, ji bo ku di nav demê de winda nebim, dem li min nebe ‘dema windakirî’ ya M.Proust û ji bo ku karibim dest bi romana xwe ya di serê min de temambûyî bikim, hewlê didim û car caran ez û demê em dikevin heftûheştê. Bi hêviya ku dem li min neyê xezebê!

